Arşîva Bîra Kurdan: "Çend dubendên Ehmedê Xanî" ('86) û gotara Kendal Nezan "Pirsgirêka kurdî" ('97)

ÇAPA ÎNTERNETÊ

LE MONDE diplomatique kurdî

Hezîran 2012 - Hejmar 31 www.diplo-kurdi.com • info@diplo-kurdi.com 20 Rûpel

David Garcia
Klubên pir dewlemend ên spanî yên wek, FC Barcelona, Real Madrid, Athletico Madrid, Valencia CF û Athletic Bilbao li ser futbola Ewropayê serwer in, lê zêde jî ketine bin deynan...
▶ R. 5

Raoul Marc Jennar
Hukûmetên bîstûpênc welatên Yekîtîya Ewropî yekê adarê di der barê mijara budceyê de peymana ku "qaîdeya zêrîn" ferz dike mohr kirin û divê di nav mehên pêş me de were erê kirin.....
▶ R. 7

Stéphanie Latte Abdallah
Di encama greveke dirêj a birçîbûnê de ku bêhtirî du mehan dewam kir, girtîyên siyasî yên filistînî di nîvê meha gulanê de gihiştin lihevkirinekê ku dê dawî li tecrîdkirinê bîne, lê...
▶ R. 12

Jean-Baptiste Gallopin
Li Bakur û li Başûrê Sûdanê petrol yek ji çavkanîyên sereke yên dovîz û hatina ji bacê ye. Yek jê petrolê kontrol dike, ya din jî binesazîyên îxracatê, neçar in li hev bikin...
▶ R. 14

Philippe Bovet
Gelo divê avahîyên kevin bên xira kirin ji bo ku li şûna wan yên "dostjîngeh" werin lêkirin? Dema ku mirov enerjîya li avahîsazîyê diçe bihesibîne, kêm caran hevkêşe li hev derdikeve…
▶ R. 19

Di destpêka sedsala 21ê de

Pêdivîya konferanseke netewî ji bo doza Kurdistanê

Bayram Ayaz *

Mijara civandina konferansa netewî di nav rewşenbîr û siyasetvanên kurd de bi balkêşî tê gengeşe kirin. Konferansa netewî pêdivîyeke dîrokî, siyasî û civakî ye, di vê pêvejoyê de derketiye pêşîya bizava azadîxwaz a miletê kurd. Elita kurdî divê karên bîrewerî û siyasî ji bo vê mijarê pêk bîne, vê pêdivîyê qenc binase û konseptên rast amade bike.

Ev mijar bala dost û dijminên kurdan jî dikişîne. Di çarçoveya ajandeya siyasî ya Rojhilatê Navîn de di rojeva hemî hêzên peywendîdar de ye. Hemû alî dixwazin bizanin, gelo kurd dê bikaribin li hevdu bicivin, bi hev re siyaseteke hevbeş bimeşînin? Ji ber ku eger kurd bikaribin bi siyaseteke hevbeş tev bigerin, ev yek dikare bandoreke nû li ser rewşa Rojhilatê Navîn bike. Ev rastî bala hêzên navnetewî û herêmî, yên ku berjewendîyên wan yên stratejîk li deverê hene, dikişîne. Hinek ji wan dixwazin rê li ber kurdan xweş bikin, da ku kurd bikarin li hev bicivin; hinek jî vê yekê wek xeterekê dinirxînin û heta ji wan tê, hewl didin pêşî lê bigrin û nehêlin kurd bi konferansa netewî yekrêzîya xwe bihûnin.

Tevgera welatparêz a kurdî girîngîya mijara konferansa netewî dizane û di nav xwe de di lêgerînekê de ye. Bi taybetî serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî ehemiyeteke zêde dide vê mijarê û dixwaze bi konferanseke serkeftî yekrêzîya „mala kurd" pêk bîne. Ji alîyekî ve ji bo hemî hêzan û kesayetên bi bandor zelal bûye ku hewce ye kurd di nav xwe de yekrêzîyê pêk bînin, bibin xwedî gotareke hevbeş û bi hevahengî tevbigerin. Lê heta nuha me kurdan nekarîye konferans an kongreyeke netewî ya xwedî biryar ku bikaribe hêzên kurd û kurdistanî di bin siwanekê de bigihîne hevdu û bicivîne. Bêguman gelekî zehmetî û astengî li pêşîya vî karî heye. Rewş û konjonktura siyasî ya Rojhilatê Navîn, peywendîyên stratejîk yên navneteweyî û yên dewletên herêmî bi hevdu re bandoreke zêde li ser vê mijarê dike. Çewtî û qelsîyên me yên navxweyî jî hene ku gelek alozîyan derdixin.

Di vê nivîsê de em ê hewl bidin mijara konferansa netewî bi van pirsên girîng ku me işaret pê kir, binirxînin.

Destpêkê em awirekî dîrokî bidin ser mijarê û sedemên pêdivîya konferanseke wisa binasin û bizanin çima niha? Ev pêdivî bêhtir bi pêvejoya azadbûna başurê Kurdistanê û bi prosesa dewletbûnê li vî perçeyê welatê me ve peywendîdar e.

Awirekî dîrokî û aspekta bîrewerî derbarê pêdivîya konferansa netewî de

Di dîrokê de hemî gel ji demên mîrekî û civakên derebegî û olî re derbas bûne, gîhane serdema modern, yanî çaxê dewletên netewî. Hinek gelan karibûye di dîrokê de dewlet û împaratorîyan damezirînin û di serdema modern de, yanî çaxê kapitalizmê de jî dewletên xwe yên netewî ava bikin. Hinek gelan jî nekarîye dewletên netewî damezirînin, mane bindest û welatên wan jî hatiye dagîr kirin. Hezar mixabin gelê kurd ji koma yên dawîyê ye. Her çiqas kurdekî wekî Selahedînê Eyyubî karîye imparatorîyekê damezirîne û piştî eyyubîyan jî hin mîrekên kurdan dewlet jî damezirandine, mixabin di serdema şîyarbûna netewî û çaxê damezirandina dewletên netewî de kurdan nekarîye dewletekê damezirînin. Gelê kurd, xelkekî otantîk (herî kevin) yê Rojhilatê Navîn e. Patrîyotizma zimanî û welatî (Feqîyê Teyra, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî) hê ji destpêka yekemîn hezar salê li nav kurdan dest pê kiriye.

▶ R. 3

Li ser pirsgirêka kurdî û pozîsyona Tirkîyê çend hizir

Giyasettin Sayan *

Meriv dikare bibêje ku li Tirkîyeyê hem çalakîyên ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdî û hem jî gengeşîyên fikrî bi her awayî ketiye koreriyekê. Sedemê vê yekê jî ew e ku her du alî hem pirsgirêka kurdî û hem jî çareserîya vê meseleyê ne wek hev dibînin û dinirxînin.

Serokwezîrê Tirkîyeyê Recep Tayyip Erdogan, weke ku di gelek axaftinên xwe de jî rave kirî, meselê ne wek mafê siyasî û çandî yê gelê kurd, lê belê wek maf û azadîyên şexsî yên hemwelatîyên kurd dibîne. Erdogan, ji bo çareserîya vê pirsê formulasyoneke weha pêşkêşî raya gştî dike: "Zêdekirina mafên hemwelatîyan, zêdekirina refahê û xurtkirina demokrasîyê." Û vê çareserîyê jî dixe nav çarçoveya "yek-milet, yek-al, yek-dewlet"ê. Hêvî dike ku dê meseleya kurdî bi vî awayî çareser bike.



Ahmet Aslan: **Dr. Mahir Aydın**, li ser kaxizê teknîka tevlihev, 40 x 40 cm

Ev bi salan e ku AKP xwedêgiravî ji bo çareserîya pirsgirêka kurdî derdikeve meydanan, pêş raya gştî û dibêje "vebûna demokratîk, projeya çareserîya demokratîk, projeya yekîtîya netewî û biratîyê." Erdogan, di 12ê tebaxa 2005ê de li Amedê gotibû: "Li Tirkîyê pirsgirêka kurdî heye. Dewletê neheqî li kurdan kiriye û pêwîst e ku dewlet hesabê vê neheqîyê bide. Pirsa kurdî pirsa min e jî." Lê mixabin çareserîya vê meselê bi mafên şexsî û çandî ve girê dide û sînordar dike. Mebest ew e ku bi maf û azadîyên şexsî, bi hinek mafên çandî, bi derî lê vekirina kanalên televizyon û radyoyên kurdî qaşo vê meselê çareser bike.

Herweha ji bo zimanê kurdî jî, dixwaze zimanê kurdî li dibistanan wek derseke bijarte bê dayîn û li hin unîversîteyan jî zimanê kurdî wek zimanê wêjeyî bê xwendin.

▶ R. 4

Ji edîtoryal

Xwendevanên hêja,

weke ku hûn jî dizanin rojnameya me Le Monde diplomatique-kurdî, dê ji vê hejmarê ve tenê li ser înternetê, bi rêya çapa elektronîk weşana xwe bidomîne.

Beriya hertiştî hûnê bikaribin LMd-kurdî dîsa wek berê bi mîzanpaja çapa orîjînal bi awayê PDF daxînin û bikin nav arşîva xwe. Bi derbasbûna çapa dijîtal, me rûpelên rojnamê ji 24ê daxist 20ê. Lê wek berê hûnê bikaribin makaleyên rojnamê di malpera me ya înternetê de yeko-yeko vekin, bixwînin, qeyd û prînt bikin.

Dê ji hejmara me ya bê ve, di çapa online ya LMd-kurdî de ji alîyê dîtbarî ve hin guhertin û nûbûn çêbibin. Di malpera rojnamê de, dê beşek bi navê LMd-kurdî-Extra hebe. Ji bilî makaleyên ku dê di her 20 rûpelên rojnameyê de cîh bigrin, herweha dê hin makaleyên din jî hebin. Emê di vê beşê de cîh bidin makaleyên bijare yên li ser siyaset, civak, ziman, çand û hwd, ku berê me nikaribû ji ber nebûna cîh û nisbeta nivîsên redaksiyona kurdî di rojnameya matbû de biweşandana. Herweha dîsa ji ber sînordarbûna rûpelan tabloyên wênesazên ku me berê nikaribû bi tevahî cîh bidanayê dê bên weşandin. Dê xwendevan û hunerhez bikaribin hemû tabloyên wênesazên kurd yên mehê di malpera me ya înternetê de bibînin. Dê bi vî awayî LMd-kurdî ji alîyê naverokê ve jî hîn dewlemendtir bibe. Emê di siberojê de hewl bidin ku bi aplîkasyoneke taybet (App) xwendevan bikaribin rojnameya me bi rêya telefonên smart û komputerên tablet jî bi hêsanî bixwînin. Xebatên me yên ji bo vê yekê hîn berdewam in.

Ji bo ku em bikaribin LMd-kurdî'yek hîn baştir û têkûztir pêşkêşî we bikin, dê hewcedarîya me bi dîtin, rexne û pêşnîyarên we xwendevanên hêja hebin, da ku ev yek rê nîşanî me bide.

Bi xoşewîstî û silavên dostane

Redaksiyona LMd-kurdî

www.arsivakurdi.org

EDITO

Radîkalbûn

Serge Halimi

Raperîna xwendekarên Québecî jî careke din nîşan dide: Siyasetên jixwekêmkirinê yên aborî êdî nikarin bêyî rêbazên otorîter werin ferz kirin. Hukûmeta lîberal (navendparêz) ya Jean Charest biryar da ku xercên bo qeydbûna zanîngehan di nav pênc salan de % 75 zêde bike, bêhtirî ji sê paran pareke xwendekaran dest bi boykotê kirin; 18ê gulana bihurî di rûniştineke taybet de Meclîsa Neteweyî ya Québecê mafên komeleyî û xwepêşandanê betal kirin. Zincîreke xwedî encamên kujer: Jêbirina destketîyeke demokratîk (li vir mijar mafê xwendina zanîngehê ye) zûzûka rê li ber betalkirina azadîyeke bingehîn vekir.

Ev radîkalbûn li deverên din jî tê dîtin. Li Fransayê, bi têkçûna koalîsyona muhafezekar, di encama kampanyayekê de ku tevahîya mijarên rasta tundraw hatin red kirin, qet nekir ku ev koalîsyon hewl bide berê xwe bide dengdarên navendê, yên ku dengên wan ji wê re diviya. Mîrasgirên Nicolas Sarkozy berevajî hê jî lipêşgirtina helwêstên herî paşverû dewam dikin – dijminatîya koçberan, muxalefeta li dijî sistbûna qaşo dadgerîyê, têkoşîna li dijî nelirêtîyên civakî – bi hêvîya ku ji Front national [Bereya Neteweyî, partîya rasta tundraw e; nota wergêr] dengên dengdarên girseyên çînên jêr bistînê, yên ku xwe weke "*karkerên ku naxwazin kesên ku kar nakin ji wan bêhtir pereyan bi dest bixin*" dibînin. (1)

Ji mehekê hindiktir dem di ser re derbas bûbû ku Barack Obama dest bi wezîfeyê kiribû, li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê beridîneke siyasî ya bi heman rengî qewimî. Bêyî ku li gunehê xwe mikur were, Partîya Komarxwaz da ser şopa Tea Partîyê, bi xirecir û bi awayekî paranoyak, lê belê nexasim jî bi awayekî bispor di wî hunerî de ku reqîbê xwe weke garaneke hirhopên çepgir, teknokratên xwe bi xwe şîretkirî û bi zorê ji wan tê xwe bi hilberînerên dewlemendîyan mijûl bikin da ku misêwa piştgirtîya "muhtacan" û bikêrnehatîyan bikin. Nivîskarên "Manîfestoya Tea Partîyê" dibêjin "*hema hema cîranekî me hemûyan heye, yan jî me bihîstiye ku behsa yekî dikin yekî ku ji hatina xwe bêhtir xerc dike, û em ji xwe dipirsin, çima diviyabû em li şûna wî pereyan bidin.*" (2) Rasta komarxwaz a ku tavilê têk çû, ji xwe re nekir kar ku dengên navendê ji nû ve bi dest bixe, weha dîyar e ku mirov di hilbijartinan de bi hêza navendê bi ser dikeve. Û wê kirasekî nû li xwe kir û li şûna pragmatîzma grî ya berpirsîyarên perîşan, daxwazên milîtanên xwe yên herî tundraw derxistin pêş.

Ev tesewura siyaseta rastê pir xurt e. Ne waez û şîret, ne jî hinekî guhertina nexşerêya aborî û malî dikarin vê îdeolojîya rastê têk bibin. Ew nexşerêya ku wê teqez têk biçe û rewşên aloz, bêhêvîbûn û panîkê zêde bike. Jixwe em behsa bandorên siyasetên zîyandar ên xeydeke ku armanceke şaş dide ber xwe, nakin. Piştî ku hêza her du partîyên mezin ên yewnan nema, her du jî berpirsîyar in ji petaxa welêt û zerara li gel kirî, bi awayekî mirov nelibendê partîyeke çepgir ango Syrîza bi pêş ket. Ev partî biryardar e ku dana deynekî qismî nerewa bixe ber lêpirsînê. Ev yek jî nîşan dide ku xilasîya ji tengavîyê pêkan e. Bi şertê ku wêrekî û hêza tesewurê hebe. Ev yek herweha maneya têkoşîna xwendekaren Québecî ye jî.

(1) Axaftina Nicolas Sarkozy li Saint-Cyr sur Loire, 23ê nîsana 2012ê.

(2) Thomas Frank ji ber girtiye, *Pity the Billionaire : The Hard-Times Swindle and the Unlikely Comeback of the Right / Wey weled Milyardar: Xapeya Demên Zehmet û Vegera Rastgiran a kêm Muhtemel,* Metropolitan Books, New York, 2012.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ji bo fîlozofîyeke civakî

Louis Pinto

Berevajî ariyer-gardê (paşing) avangardên (pêşengên) fîlozofîk ên bi awayê fransî, nifşekî nû yê fîlozofan derkete holê ku bi îdîaya xeternebûna guhnedanê ya cudabûna fikrî û newekhevîyê radibin. Ev nifşê nû her bi endîşe ye ku bi rastîyê re rûbirû bibe û li tiştekî bifikire; tiştekî ku em baş pê dizanin ku mirovên evîndarên hikmet û zanînê serê xwe pê naêşînin.

Yek ji van ên nû **Franck Fishbach** e, bisporê fîlozofîya alman, wergerê *Axel Honneth*, ji serî heta binî ji nû ve rahişt "Teorîya Krîtîk" a Dibistana Frankfûrtê. Dema vê jî dike konsepta silbûn û xerîbbûnê dixe ber lêpirsînê, bi rêya ji nû ve xwendineke hûrgilî ya gelek nivîskaran û bi **Marx** jî dest pê dike. Yek ji armancan jî ew e ku destekê bide vejîn û ji nû ve çalakkirina *"fîlozofîyeke civakî"*. (1) Lewma, ji bo rahêjin cîhana civakî, fîlozof xwe li pişt encamên bergir ên guftûgoyeke li ser bingehên zanistên mirovî vedişêrin, dema ku hewl didin bi fîlozofîya siyasî behsa rastîyê bikin ku destûrê dide wan ku vê bi rengekî esîl bikin, ango bi awayekî dûrî zanînên ampîrîk ên li ser civakê û bi awayekî "*depolîtîzeker*": ya ku fîlozofên sosyal-demokrat û hetta marksîst jî dikin ev e. Fîlozofîyeke civakî bi xwe, berevajî vê, hewl dide fikreke bikaribe armanceke veguherînerîya dinyayê deyne ber xwe. Ew "*bi awayekî zelal li alîyê fikira kevin a ku li gor wê ferd armancên xwe di nav civaka ku ew tê de ne, dîyar dikin û li dijî fikira modern e ya ku dibêje ferd armancên xwe ji tevahîya çarçoveyên heyî qut û serbixwe hildibijêrin.*" Mirov bi rengekî din derbibire, ya li vir behsa wê tê kirin têkilîyên civakî ne û ne muceredkirinên mîna "ferd" in.

Di *La Privation de monde (Bêparmana ji Dinyayê)* de **Fishbach** hewl dide **Heidegger** û **Marx** bike yek. Ji Heidegger ew fikra "hebûn-li-cîhanê" deyn dike: Têkilîya mirovî bi xwe re weke cîhanekê ye ku ne tişteke ponijîna ji dûr ve ye, lêbelê lezgînî û mohletan, wezîfe, îhtîmal û nemumkinan ferz dike. Ji **Marx** fikira karê zindî û darîçav weke awayekî pêkhatina mirovî di dîrokê de girtiye. Li devera ku ev her du xetên fikirê digihêjin hev, kar bi rolekî navendî radibe: Bi rêya wî mirov îhtimalên xwe yên hebûnê zêde dike, li cîhaneke ne weke rastîyeke bîyanî pê re rûbirû dibe, lêbelê weke asoyekî nas pê re rûbirû dibe. Çalakîya kedê bandora li ser rastîyê pêk tîne heta ku ew li cihê ku ferd têdigihin pêk were. "Bêparmana ji Dinyayê" (*Entweltlichung*) pêk hat dema ku kar xistin bin serwerîya hêzên civakî yên ku derbasbûna ji darîçavê ber bi muceredê ve bi rê ve dibin: Hêza kar veguherî jêhatîbûneke xwerû ya hilberîna ji nirxê pevguherînê û nirxê zêde.

Kapîtalîzm pirî caran li gor **Georg Lukacs** di bin têkilîya mekanî de bûye mijar: Karê bi mûçe weke bûbe eşya, weke ku tiştekî xwezayî be xuya dike, lê belê di rastîyê de dikare were pîvan û hejmartin, alîyê afirîner yê demê di nav rengsarîya yekrengîya mekanî de her diçe xirab dibe. Fishbach ji vê vîzyona "muhafezekar" a kapîtalîzmê dibihure; bi xêra têgeheke demê ya ku li gor wê dem teybetîya vî awayê hilberînê pêk tîne. Alîyê "şoreşger" yê kapîtalîzmê ku Marx binxêz kiribû, têra xwe nehat dîtin, girîngîya heqê wê, pê nehat dayîn. Awayê teqlîdkirina astên civakî û ya teqlîdkirina serwerîya civakî, bi awayekî radîkal bûrjûwazîyê ji qadên civakî yên serdest yên berê cuda dike. Berevajîyê bûrjûwazîyê, wan timî sabitbûn dixwest. Ev cara yekem e ku di dîrokê de qadeke civakî ya serdest bi saya veguhertineke dayimî ya cîhanê û ya qaîdeyên wê dikare li ser text bimîne. Guhertin weke tiştekî baş tê nîşan dan. Bi vî rengî jî berxwedana li hember guhertinê neçar dimîne timî hinekî paşve mayî be û şoreşger weke muhafezekar, an jî weke kevnar bên dîtîn.

Ji **Fischbachî** re tu tişt bi qasî peyamberîzma postmodern a li ser herikbarkirina gerdunî xerîb nîne. Ew baş dizane ka ji çi vedigere: Nexweşîya guhertinê ji holê rakirina perspektîfan bi xwe re tîne û tê maneya nirxandina dema niha û bêdawî weke tiştekî vala. Bi awayekî ji awayan kapîtalîzm dev jê bernade û her fîlozofan ji xewa wan a dogmatîk hişyar dike.

(1) Franck Fischbach, *Manifeste pour une philosophie sociale (Manîfestoya ji bo Fîlozofîyeke Civakî)*, La Découverte, Paris, 2009, 168 rûpel, 16 euro.

(2) *La Privation de monde. Temps, espace et capital (Bêparmana ji Dinyayê. Dem, Mekan û Kapîtal)*, Vrin, Paris, 2011, 144 rûpel, 16 euro.

Wergera ji fransî: Feryal Guladawiya



Ahmet Aslan: **Haçapuri**, verastkirina dijîtal, 2012

Le Monde diplomatique kurdî (Çapa elektronîk)
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Koordînasyon
Yado Ciwan

Alîkarên vê hejmarê
Nedîm Baran
Semra Polat
Ergün Yetkiner

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@diplo-kurdi.com
www.diplo-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.pirsakurdi.org

Pêdivîya konferanseke netewî ji bo doza Kurdistanê (Dewama rûpela 1)

Her wisa hestîyarî û şîyarbûna netewî jî herî kêm berî 350 salan bi bîrewerîya Ehmedê Xanî rû daye û li nav kurdan belav bûye. Lê mixabin, destpêka sedsala bîstan dema li Rojhilatê Navîn dewletên netewî hatin damezirandin, Kurdistan ji nû ve hat parve kirin û dagîr kirin (1923) û xelkê kurd nekarî dewleta xwe damezrîne. Ew tişta bi serê miletê kurd hatiye xedrekî mezin ê dîrokî ye, ne tenê dîrokî ye, ev neheqî îro jî hê jî berdewam e! Heta miletê kurd û qewmên resen yên din ku li Kurdistanê dijîn, nebin xwedî dam û dezgehên netewî (dewlet) û nikaribin bi azadî çarenûsa xwe dîyar bikin (self determination) û xwe bi xwe îdare bikin, ev neheqî dê ji holê ranebe. Yanî çareserî azadî û mafê dewletbûnê ye. Vêca ev dewlet dê bi çi cureyî werê danîn û xwedî pergaleke çawa be, ev yek teqdîr û biryara miletê kurd û qewmên resen yê Kurdistanê ye. Kilîta çareserîya doza miletê kurd û Kurdistanê ev e.

Her milet mafê xwe heye li ser axa bav û kalan azad û şanaz be, jîyaneke bextewar, aram û bi zikê têr bijî. Daxwazên miletê kurd û qewmên resen yên Kurdistanê ev in. Kîjan gel van mafên xwezayî û rewa tunebe, hewce ye li berxwe bide ku van mafan bi dest bixe. Eger miletekî din serdestîyê dike û welatê xelkekî din dagîr dike, dest dide ser dewlemendî û saman û sermîyanê wî xelkî, mafê xelkê bindest jî heye dagîrkerîyê red bike û bi hemû hêz û şîyanên xwe li dijî serdestîyê li ber xwe bide, welatê xwe azad bike. Rewşa miletê kurd li seranserê Kurdistanê ev e. Miletên tirk, faris û ereb Kurdistanê dagîr kirine, milet û dewletên serdest in, zilm û zordarîyê li xelkê kurd û qewmên resen yên kurdistanî dikin. Rewşa miletê kurd tenê li beşeke başurê welatê me ev bist sal in ber bi başîyê ve diçe. Li wê derê miletê me azad e û xwedî rêvebirîyeke kurd e. Kurd û qewmên resen yên Kurdistanê li wê derê xwe bi xwe îdare dikin. Lê ew destkeftî jî hê seda sed ne misoger in. Eger li Bexda rejimeke dîktator peyda bibe, destkeftîyên başurê welatê me dikarin bikevin ber metirsîyê.

Di dem û rewşeke wisa de û di pêvejoyeke ku li Rojhilatê Navîn di bin navê „Bihara Erebî“ de guherînên dîrokî diqewimin, miletê kurd jî li çarenusa xwe digere. Miletê me dixwaze destkeftîyên li başurê Kurdistanê zêdetir pêşve bibe, berfireh bike û di warê navneteweyî de yanî di asta huqûqa navdewletî de misoger bike ku ev jî îlankirina dewleteke serbixwe ye; yeka ku bikare bibe endama Neteweyên Yekgirtî û hebûna wê di bin misogerîya sîstema navneteweyî de be. Serokatîya siyasî ya Kurdistanê bi hişmendîyeke bilind li vî karî dixebite. Cihê keyfxweşî û şanazîyê ye ku Serokatîya Herêma Kurdistanê di asta navdewletî de xwedî qedr û qîmeteke zêde ye. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî jî liderekî siyasî yê li herêmê bi hêz e û xwedî pişteyanîya navdewletî ye. Ev jî şansek e ji bo miletê kurd.

Li rojhilat, rojava û bakurê welat jî xelkê kurd li dijî dagîrkerîyê li ber xwe dide. Li seranserê Kurdistanê êdî rejimên dagîrker ne rehet in. Rojavayê Kurdistanê ji pêvejoyeke taybet derbas dibe. Li Suriyê dikare di demên pêş de îqrar bi mafên kurdan bê kirin. Li bakur hêzên welatparêz li sed şaredarîyan desthilat in û tevgereke bi hêz heye. Dewleta tirk mecbûr bû siyaseta xwe ya înkarê biterikîne. Lê hê jî îtîraf bi hebûna gelê kurd û mafên miletî nekiriye. Dewleta tirk dixwaze kurdan bi gavên biçûk mijûl bike û di siyaseta xwe ya asîmîlasyonê de berdewam be. Kutleyeke mezin ji miletê kurd li bakurê welat baş şîyar bûye û bi siyaseta xapînok êdî razî nabe, dê berxwedan bidome.

Di pêvejoyeke wisa de yekrêzîya tevgera kurd dê hêza kurdan xurttir bike. Heman rewş li Îranê û rojhilatê Kurdistanê jî heye. Derfetên hevpeymanîyê û piştgirîyê bi tevgera welatparêza rojhilatê Kurdistanê re zêdetir e. Lê berî piştevanîya ji derve, pêwist e miletê kurd erk û wezifeyên xwe yên netewî bi cîh bîne. Ew jî rêkûpêkkirina yekrêzîya navxweyî ye. Hevkarî û hevpeymanîya hêzên welatperwer dê yekrêzîya tevgerê xurt bike. Bizava azadîxwaz a Kurdistanê her bi çi cureyî be, pêwist e bibe xwedî gotereke hevbeş a siyasî û pergaleke rêxistinî ya navendî hebe ku kêmtirîn kurd di van şert û mercên perçebûyî de bikarin hay ji hevdu hebin û ji bo armanca sereke di kar û xebatên xwe de hevaheng bin, hevdu temam bikin.

Di dîroka gelê kurd û Kurdistanê de, hêvî û daxwazên ji bo rêkûpêkkirina yekrêzîya tevgera welatparêz hertim hebûye. Ev yek hem di nivîsên siyasî de (nivîsên rojname û kovarên wek Kurdistan, Jîn, Gaziya Welat, Hawar, Ronahi û yên heta îro) û hem jî di wêjeya kurdî de (Ehmedê Xanî, Celadet Mîr Bedirxan, Cegerxwîn, Osman Sebrî û yên nuha) gelek caran derbas dibe. Rexne li nebûna yekîtîya kurdan hatiye girtin. Îro jî birîna kurdan mijara yekitîyê ye, kurt û kêmasîyên di mijara yekrêzîyê de ne.

Di dîroka gelek miletan de karesat û bûyerên taybet hene ku bandoreke zêde li wan kiriye, wekî tu geranekî li serê wan bidî, bi ser xwe de hatine. Almanan berê pesnê Napolyon daye, lê piştre Napolyon ji bo wan bûye wekî kabusekê, bandoreke zêde li ser wan hiştiye. Rewşa wê demê û tirsa ji ber Napolyon bûye sedem ku mîrekên alman yên ji hevdu belav sala 1848ê li Frankfurt Dêra Paulkirche li hevdu bicivin, yekitîya xwe çêkin û parlamentoya xwe netewî damezirînin. Genosîda yahudîyan bû sedem ku li cîhanê hestîyarîyeke bi rengê şirîkatîya vê gunehbarîyê peyda bibe û herwisa di bin vê bandorê de sala 1948ê dewleta Israil were damezirandin. Di dîroka kurdan de jî Helepçe û Enfal bandoreke zêde li ser rêxistinên başurê Kurdistanê hişt. PDK û Yekîtî nêzi hevdu bûn û bi hev re Enîya Kurdistanê danîn ku wê yekîtîyê rê li ber serkeftina raperînên sala 1991-92yê vekir.

Niha tevgera azadîxwaz a Kurdistanê bi qewimînên „Bihara Erebî“ ve peywendîdar ji pêvejoyeke nû û dîrokî derbas dibe. Derfetên ku miletê kurd serkeftinên nû bi dest bixe heye. Ev yek jî girêdayê rêkûpêkkirina yekrêzîya navxweyî ya kurdan e. Pêdivîya konferanseke netewî ji vê yekê der tê. Kurd divê li hevdu bicivin û peyama xwe ya hevbeş bigihînin xelkê xwe jî û cihanê jî. Em gîhane qonaxeke wisa hesas û zîz. Vêca ne pêwist e ku karesateke din bi ser me re were, da ku em li xwe şîyar bin û yekrêzîya xwe pêk bînin. Dîroka me bi zilm û zordarîyên xwînî û hov tije ne. Ji elîta rewşenbîr û siyasî ya kurdan re qusureke mezin e ku dersa ji dîroka xwe nestînin û nikaribin di konferanseke netewî de li hev bicivin û ji xwe re bername û rêbazeke siyasî ya hevbeş dîyar bikin. Xelkê Kurdistanê û dostên miletê kurd li vê hêvîyê ne. Derfeteke zêrînî li pêş bizava welatparêz heye ku serokatîya siyasî bikare gavên girîng ber bi îlankirina dewleteke serbixwe û demokrat ve bavêje. Tevgera kurdî hewce ye pişta serokatîya Kurdistanê xurt bike.

Pêdivîya konferanseke netewî bêhtir bi rewşa başurê Kurdistanê ve girêdayî ketiye rojeva kurdan

Di sedsala bîstan de du caran di pergala navnetewî de guherîn pêk hatin. Demên şerê yekemîn û duyemîn yê cîhanê de derfet çêbû ku hin ji xelkên bindest bigihîn azadîya xwe û dewletên xwe damezirînin. Kurdan nekarî dewletê damezirînin, lê koletî jî nepejirandin, li berxwe dan. Em gîhan heta îro.

Sala 1989ê li dinê pêleke nû yê guherîne destpê kir. Berê li Ewropayê, piştre sala 1991ê bi şerê giravê yê yekemîn ev pêl gîha Rojhilatê Navîn. Xelkê kurd ji rewşa Iraqê îstîfade kir û li piranîya deverên başurê Kurdistanê bû desthilat û dam û dezgehên xwe danîn. Ji wê demê vir de mijara konferansa netewî her di rojeva tevgera kurdî de ye. Kurd dibînin ku derfetek ketiye destê wan û têgihane ku dikarin bi tenê bi yekrêzîya navxweyî vê derfetê pêş bixin.

Di vê çarçoveyê de bi taybetî ev du car in, mijara konferansa netewî mohra xwe li rojeva siyasî ya kurdan dixe. Cara yekemîn sala 1991ê demê raperîna xelkê kurd li başurê Kurdistanê, lêgerîn û gengeşeyeke berfireh ji bo pêdivîya civandina konferanseke netewî peyda bû. Lê wê demê ew hewldan ji civandina çend konferansên danasîn û agahdarîyê li diasporayê (Paris û Stockholm) derbas nekir. Konferansek an kongreyek netewî ku tevgera azadîxwaz a Kurdistanê ji bo armancên siyasî yên hevbeş li hevdu bicivîne, mixabin wê demê pêk nehat. Hemî hewldan tenê li nav hêzên başurê Kurdistanê de ma.

Pêla gengeşeyên duyemîn jî, bêhtir ji sala par vir de piştî guherînên pêvejoya „Bihara Erebî“ ji nû ve destpê kir û niho jî berdewam e. Elîta siyasî ya Kurdistanê vê mijarê diaxive. Di medya kurdî de mijar tê nivîsîn. Carna jî di daxuyanîyan de bahsa vê mijarê dibe, tê gotin ku îsal dê konferansa netewî li Hewlêrê li paytaxtê başurê Kurdistanê bicive.

Armanca sereke ya konferansa netewî divê rêxweşkirina li prosesa dewletbûnê be

Li vê derê hewce ye em tespîtekê bikin. Eger em qenc li mijarê binêrin, dibînin ku daxwaz û pêşnîyazên ji bo konferansa netewî bêhtir bi rewşa başurê Kurdistanê ve girêdayî ketiye rojeva tevgera Kurdistanê. Gengeşe û lêgerînên sala 1991ê tenê li dora piştevanîya destkeftîyên başurê welatê me bû. Îro jî xala sereke pêvejoya dewletbûnê li başurê welatê me ye. Lê niha ferq û cudahîyek ji demê 1991ê heye; rewşa perçeyên din jî di rojeva tevgera kurdî de ye. Eger bicive rojeva konferanseke netewî niha du xalên sereke ne.

Xala yekemîn ya konferansê divê rewşa siyasî û diplomatîk ya Îdareya Herêma Kurdistanê be. Siyasetvanên kurd û Kurdistanê hewce ye derfetên gavên pêş û ji bo vî erkê li ser milê rêxistinên Kurdistanê binirxînin, biryarên dîrokî bidin. Elîta siyasî ya Kurdistanê divê xwe ji derfeta îlankirina dewleteke serbixwe re amade bike. Konferansa netewî pêwist e di vê mijarê de xwedî peyameke zelal be. Xelkê kurd û qewmên resen yên Kurdistanê divê ji bo vê armancê li dora serokatîya siyasî bicivin û doza dewletê, dewleteke demokrat bikin. Ev daxwaza miletê Kurdistanê hewce ye bi xurtî bigîhe raya giştî ya hemî cîhanê. Ev derfet li başurê welatê me heye û divê hemî kurd piştevanîya vê gava dîrokî bikin. Partî û rexistin û heta hemî kesayetên bihêz û xwedî bandor divê helwêstên xwe di vî warî de zelal bikin. Miletê kurd divê bibe xwedî dewlet û Kurdistan jî wek dewlet divê bibe endamek ji malbata cihanê.

Xala duyemîn divê rewşa siyasî ya li perçeyên din be. Di vê xalê de hewce ye parastina destkeftîyan û destxistina mafên bêhtir bê gengeşe kirin. Di vê mijarê de rewşa rojavayê Kurdistanê cihekî taybet digire. Jiber ku li vî perçeyê welatê me, tevger germ e û Suriye seranser li ber guherînên nû ye. Dixwaze bila rejîma baas bikeve, dixwaze bimîne, rewşa Suriyê êdî weka xwe namîne. Di vê pêvejoyê de teqez dê kurd hin mafan bi dest bîxin. Tevgera kurdî divê alîkar be ku bi kêmasî nasnameya kurdî werê pejirandin û kurd bikarin li herêmên lê piranî dijîn, xwe bi xwe bi rê ve bibin, yanî mafê xwe bi xwe rêvebirîyê bi zimanê xwe (self-administration) bi dest bîxin. Ev daxwaz û armanc, wekî federasyon, an xwerêvebirîya îdarî dikare ji bo rojhilatê Kurdistanê jî bê dîyar kirin.

Mijara ku li konferansa netewî bi berfirehî û balkêşî bikare werê gengeşe kirin bêguman rewşa bakurê Kurdistanê ye. Doz û daxwazên kurdan û cureyê xebata siyasî li vî perçeyê welatê me hewce ye bi hurgilî werê nirxandin. Tevgera welatparêz li bakurê welat li 100 bajar û navçeyan di şaredarîyan de desthilat e. Li Meclisa Tirkiyeyê jî 36 nûner hene. Lê ya girîng îdareyên herêmî, yanî şaredarîyên hêla Kurdistanê ne. Her çiqas dewleta tirk hê îtîrafê bi nasnameya kurdan nake jî, lê welatperwerên kurd li cihên ku desthilat in, heta ji destê wan tê lê kar dikin ku rêvebirîyeke kurdî tatbîk bikin. Ev ji bo doza Kurdistanê xebateke zêrînî ye. Ev destkeftî û mewzîyên siyasî û îdarî hewce ye wekî bîbilka çavan bên parastin. Ev gava destpêka ya rêvebirîya kurdî ye. Tevgera welatperwer di vî karî de fêrî rêvebirîyê dibe, azmûnên xwe zêde dike. Li her devereke Kurdistanê divê kurd û qewmên resen yên welatê me bi kêmasî mafê li ser axa xwe, bi zimanê xwe xwerêvebirîyê bi dest bixe. Tevgera kurdî li her derê divê destxistina dam û dezgehan heta şirîkatîya dewletê, bidestxistina desthilata rêvebirîya siyasî û îdarî ji xwe re bike armanc. Doza miletê kurd doza dewlet û desthilateke demokrat û humanîst e. Konferansa netewî hewce ye van mijaran wek ajandaka siyasî û bîrewerî amade bike, bide gengeşe kirin û plan û bername û nexşerê jê re amade bike.

Bi kurtî di konferansa netewî de nûnerên miletê kurd divê di sedsala 21ê de doza dewletbûnê li başurê welatê me û herwisa plan û nexşerêya întegrasyona civakî, kulturî, aborî û siyasî ji bo seranserê Kurdistanê bi rêk û pêk gengeşe bikin û xwe bigihînin gotareke hevbeş. Eger nûner û pêşengên miletê Kurdistanê vê yekê bikin û bikaribin bi yekrêzî derkevin pêş cîhanê, wê demê em dikarin bêjin, kurdan „AJANDA XWE YA SIYASÎ YA SEDSALA 21ê“ amade kir û ketin ser riyeke dîrokî.

Derfet û alozîyên li pêş tevgera kurdî bo civandina konferansa netewî

Miletê kurd li perçeyekî welatê me desthilat e, xwedî ezmûneke 20 salan e. Roja 19ê Hezîranê me 20 salîya hilbijartina yekemîn û pê re damezirandina nîşana vîna gel Parlemana Kurdistanê pîroz kir. Roja 4ê cotmehê jî em dê 20 salîya îlankirina federalîyê pîroz bikin. Ev destkeftîyeke zêrîn e. Li goreyê huqûqa navdewletî Îdareya Herêma Kurdistanê perçeyekî ji dewleta federe ya Iraqê ye. Lê qenc tê zanîn ku piranîya dewletan bi Idareya Herêma Kurdistanê re wekî dewleteke „serbixwe“ têkilîyan datînin. Heta niha 24 dewletan konsolxaneyên xwe li Hewlêrê vekirine. Alaya Kurdistanê li Brukselê pêş nûnerîya Îdareya Kurdistanê bi ala Yekitîya Ewrûpayê re pêl dide.

Bi gotineke raste rast dewleta li başurê welatê me ji bo doza Kurdistanê navend û bingeha stratejîk e. Kurd divê siyaset û bîrewerîya xwe li goreyê vê rastîyê dîyar bikin. Navenda civîna Konferansa Kurdistanê jî divê başurê welatê me be.

Derfeta duyemîn tevgera azadîxwaz li hemi perçeyên Kurdistanê bi hêz e. Beşekî zêde ji xelkê kurd şîyar bûye û xwe li dora tevgerên welatparêz daye hevdu. Kurd ne yên do ne, kurd xwedî li doz û daxwazên xwe derdikevin.

“Bihara Erebî” ji bo tevgera kurdî derfeteke erênî ye. Ruxandin û têkbirina rejimên diktator û ne demokrat ji feyda miletê kurd e. Tevgera welatparêz a Kurdistanê divê bizane ji van derfetan îstîfade bike. Wekî nuha li Sûrîyeyê.

Wek alozî em dê bahsa du pirsan bikin. Serêşîya herî mezin ew e ku rêxistinên kurdan, nûnerên wan hê jî li hevdu necivîne. Serê hinek rêxisitinên me di mijara dewlet û desthilatê de hê jî tevlihev e. PKK û rêxistinên dora wê, mixabin qenc, wekî pêwist girîngîyê nadin prosesa dewletbûnê. Hin nêrînên PKKyê ku dibêjin “em dewlet naxwazin” heta dereceyekê dibe sedemê têkilhevîyê. Jiber vê nêrîna wan serê wan di armanca sereke ya civandina konferansa netewî de jî ne zelal e. Eger ev konferans, di vê qonaxa dîrokî de ku erdnigarîya siyasî û statuya siyasî-îdarî ya Rojhilatê Navîn li ber guherînê ye, ji bo miletê kurd doza dewletê neke, vê armancê, wek armanca sereke nede pêş xwe, dê ji bo çi bicive û kîjan erkê dîrokî bi cîh bîne? Siyasetvan û rewşenbîrên kurd û kurdistanî hewce ye pir bi cidî gengeşeya vê pirsê bikin.

Alozîya duyemîn, li Rojhilatê Navîn di prosesa “Bihara Erebî” de du enî peyda bûne. Kembera Şîa (Îran, Surî, Malikî, Hizbullah-Libnan, Rêxistinên Şîa li dewletên giravê û Suudî, Taliban û El-Qaîde jî caran li vê cebheyê xuya dikin) û alîyê Sunî (Suudî, Qatar, Tirkiye serkêşîya vî alîyî dikin). Ev rewş ji bo tevgera kurdî hem derfet e, hem jî xeter e. Eger tevgera kurdî di vê mijarê de ne xwedî stratejîyeke hevbeş be, ev rewş dikere alozîyên navxweyî biafirîne. Ji ber vê mijarê û jiber peywendîyên partîyên kurdî bi desthilata Esad re li Suriyeyê heta dereceyekê hêzên kurd bûne du beş. Konferansa netewî hewce ye ji van pirsgirêkan re heta dereceyekê çareserîyê bibîne da ku nelihevîyên navxweyî kêmtir bibin.

Durişma Konferansa netewî divê doza dewleteke kurdî û peyama aşitîxwazîyê, demokrasîyê û misogerkirina aramîyê, refah û bextewarîya gelên Rojhilatê Navîn be. Wekî Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî jî di gotareke xwe de got: Kurd divê di vê konferansê de rûyê xwe yê aşitîxwaz nîşanî cîhanê bidin û doza mafên xwe rewa bikin ku ew jî mafê çarenusîyê ye, mafê damezirandina dewletekê li ser axa bav û kalan e. Peyama kurdan dive ji cîhanê re ev be: Em jî milet in, welatê me heye, em dixwazin li mala xwe serwerên welatê xwe bin û bi hemi gelên cîran re di nav aşitî û aramîyê de bijîn. Sererastkirina neheqîyên dîrokî û berdewamî bi tenê weha dikare bi cih bibe.

* Nivîskar, siyasetvan, mamosteyê dibistana navendî.

www.arsivakurd.org

◄ Li ser pirsgirêka kurdî û pozîsyona Tirkîyê çend hizir (Dewama rûpela 1)

Ji hêla din ve, ji Ewropayê re jî dibêje, "Me pirsgirêka kurdî bi piranî çareser kiriye, lê PKK asteng e. Heger PKK nebûya, me hemû çareser dikir." Hikûmeta AKPyê heta niha projeya xwe ya "Di çarçoveya maf û azadîyên şexsî de çareserkirina pirsa kurdî" jî bi şêweyekî nivîskî û fermî deklare nekiriye. AKP newêre ku bi awayekî aşkere fikra xwe ya ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd bîne ziman jî. Pir caran jî vê yekê bi şerê PKKyê ve girê dide. Hikûmeta AKPyê, hewldanên ji bo çareserîyê giran dimeşîne û dixwaze bi vî awayî wext derbas bibe. Pê dizane ku di nav dewlet û dezgehên wê de û herweha di nav partîya wî de fikreke hevpar a ji bo çareserîyê tuneye. Ji bo vê yekê jî hikûmet bi dudilî û bi endîşe gavên tirsonek diavêje.

Hevdîtinên hukûmet û PKKê

Hevdîtinên rasterast yên hikûmeta AKPê û PKKê ku di sala 2010ê de destpêkiribûn, dikaribû bibûya xaleke werçerxê ya girîng. Lê ev hevdîtin par di serdema hilbijartinên giştî yên Tirkîyê de hatin qut kirin. Ev yek jî nîşan dide ku di çarçoveyek demokratîk de plan an jî programeke konkret a hikûmeta tirk a ji bo çareserîyeke adîl nîne. Tersî vê yekê, dilnexwazîya xwe di her fersendê de nîşan dide. Bi lênêzîkbûneke giştî, hewl dide ku daxwazên kurdan bikşîne mertebeya herî nizim û zor bide ku kurd ji daxwazên xwe paşde gav biavêjin.

Li hember vê yekê, ne mimkûne meriv bikaribe bibêje ku alîyê kurd jî heta niha daxwazên xwe bi awayeke rêkûpêk derxistibin meydanê, ji bo muzakereyan xwe amade kiribin û helwesteke bi îstiqrar nîşan dabin.

PKKê di pêvajoya ku bi hikûmetê re muzakere dest pê kir de, da aşkere kirin ku, di nav rêxistinê de şûna fikrek yekpare dîmeneke belawela derdikeve meydanê. Herçiqas nayê zanîn ku di vî dîmenê perçeyî de hesab û planên alîyê tirk çiqas bandorker bin jî, bêguman vê yekê meydaneke fereh a manewrayê da hikûmeta tirk. Ji hêla din ve hate çavdêrîkin ku PKKê, şûna daxwazên gelê kurd ên demokratîk û netewî, daxwazên rêxistinî derxist pêş û helwesteke bi vî rengî nîşan da. Reqabeta ferasetên cuda yên di nav rêxistinê de û daxwaza kontrolkirina wan a pêvajoyê jî li alîyekî din. Tersî wê, ew lênêzîkbûna kontrola mutleq a PKKê, ger di nav gel de, ger jî di nav rewşenbîr û derûdorên siyasî yên din de gumanên heyî zêdetir kirin.

Vê rewşê ew rola ku BDPê dikarî di vê pêvajoyê de bileyizî jî xetimand. Bi israr ji dervehiştina BDPê ya ji muzakereyan, tesîra BDPê jî qels kiriye. Halbokî, wek di gelek mînakên cîhanê de BDPê dikarî di vê pêvajoyê de bi awayeke tesîrdar cîh bigirtana û daxwazên gelê kurd hîn bi dengekî bilind bianîya rojevê. Lê bêtesîrkirina BDPê ya bi vî awayî encameke wusa çêkir ku ji vê yekê hikûmeta tirk sûd wergirt.

Ji hêla din ve, ne mimkûne meriv bikaribe bibêje ku di vê pêvajoyê de bi awayeke giştî ew derûdorên siyasî yên derveyî PKK û BDPê jî îmtîhaneke baş dan. Dikarîn bi çalakîyên berfereh ku tê de daxwazên demokratîk yên gelê kurd bîanîna ziman li dar bixistana, wê helwesta bê îstiqrar û hevnegirtî ya dewleta tirk a li hember pirsgirêka kurdî bi awayeke xurt rexne û deşîfre bikirana. Mixabin di vî warî de qelsîyeke mezin nîşan dan.

Rewşa Kurdistanê êdî nayê tehemul kirin

Zarokên kurd hîn jî li dibistanên tirkan têne asîmîle kirin û her roj mecbûr in sond bixwin ku ew tirk û durist in. Hîn di dezgeh û dayreyên dewletê de kurdî qedexe ye. Hîn li gor makezagona 1924ê "hemû kesên ku li Tirkîyê dijîn tirk in." Ango kurd, tirk in. Hîn heta roja îroyîn qasî 8 hezar ronakbîr û siyesetmedarên kurd di zindanê de ne. Hîn rewşa aborî ya bajarên Kurdistanê wek bajarên welatên paşdemayî yên Afrîkayê ye.

Miletê kurd bi hezaran sal in ku li Kurdistan û li herêmê li heman coxrafyayê û bi nifûseke mezin dijî. Ne hindikahî ye. Miletê kurd ne bi reformên biçûk razî dibe û ne jî dev ji armanca xwe ya azadîya Kurdistanê berdide. Berîya hertiştî divê meriv bibêje ku, gelê kurd bi mafên şexsî yên hemwelatîtîyê razî nabe û doza hemû mafên xwe yê netewî û demokratîk dike. Miletê kurd dixwaze ku;

1- Divê hebûna kurdan bi şêweyekî fermî di makezagona nû ya sîvîl de bê pejirandin. Divê ew astengên zagonî yên ku li dijî mafên neteweyî yên gelê kurd halîhazir hene, bên rakirin.

2-Divê zimanê kurdî li Kurdistanê, li hemû dibistanan bibe zimanê fermî.

3-Divê Kurdistan bi şêweyekî xweser bê damezirandin.

Lewra, divê makezagona nû ya sîvîl ku tê amade kirin ji bo daxwazên gelê kurd vekirî be.

Makezagona nû ya sîvîl

Li Tirkîyeyê heta îro hemû zagonên dewleta tirkî di bin wesateya leşkerî de çêbûne. Ji bo vê yekê jî, di destûra nû ya sîvîl de rakirina wan zagonên ku li ser bingehê înkarkirina kurd û Kurdistanê ava bûne, dikare bibe sedemê alîkarîya aştîyeke civakî jî. Pêwîst e Tirkîye li ser esasên peymaneke civakî nasnameya miletê kurd û yên hemû miletên din qebûl bike. Û divê dewlet nekeve bin xizmeta tu ol an îdeolojîyekê. Herweha nekeve bin tu wesayeteke fikrî an jî grûbî.

Lê belê divê meriv balê bikşîne ser ku ji bo guhertina makezagoneke ewqas derbeker pewîstîya AKPê bi lihevkirina partîyên din jî heye. Mixabin gelek zehmet xuya dibe ku di parlamentoyê de hemû partîyên siyasî li hev bikin. Ji hêla din ve, AKPyê jî heta niha ji bo destûra nû tu reşnivî aşkere nekirine.

Miletê kurd pêwîst e ku çalakîyên modern û efektîv li dar bixe.

Dewleta tirkî, krîza ku ji pirsgirêka kurdî peyda dibe, bêyî ku zerareke mezin ya ekonomîk a milî bibîne, bi awayekî berfireh vî şerî sewk û îdare dike. Tevgera kurdî jî ji dinyayê re wek partîyeke terorîst nîşan dide û îdîa dike ku ji derve tê îdare kirin. Lê li dijî kurdan şerekî hov û bi kontrol dimeşîne. Kurdistan di binê bandora asîmîlasyonê de paşdemayî dimîne û bi koçberîyê wêran dibe. Ji ber ku herdu alî nikarin çareserîyeke efektîv pêşnîyar bikin, ew şerê bi kontrol ku tê meşandin herweha dibe bahaneyek ku vê yekê ji xelkê veşêrin.

Dewleta Tirkîyê ji alîyekî din ve jî herçiqas bizanibe PKK li çar perçê Kurdistanê organîze bûye û gelek endamên wê ji perçên din yên Kurdistanê ne û xwedî bandoreke siyasî ye jî naxwaze ji bo çareserîya pirsa kurd PKKyê bê çek bike û ji çîyê bîne jêr.

Ahmet Aslan: **Jina meta**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 90 x 90 cm

Ji bo çalakîyên efektîv tevgereke mezin a gel a sîvîl û xebateke dîplomatîk a navnetewî pêwîst e

Ji bo ku kurd û tevgera kurdî ji wan koreriyan derbikeve, ji bo daxwazên xwe yên

-xwe îdare kirinê
-li hemû dibistan û zanîngehên Kurdistanê perwerdeya bi zimanê kurdî
-makezagoneke demokratîk
raperîneke bi hêz û xurt pêwîst e.

Raperîneke wek 'bihara kurdî' pêwîst e ku herkes bizanibe ku kurd êdî zilm û zordarîya Tirkîyê qebûl nakin. Raperîneke weha dê bikaribe zexteke mezin û cidî li ser tebeqeyên ekonomîk û siyasî çêbike û dê ev yek jî bibe sedem ku pirsa kurdî zûtir çareser bibe. Miletê kurd dikare hêz û qeweta xwe ji bo raperîneke sîvîl weke ku di pêvajoya bihara erebî de li meydana Tehrîr a Qahîreyê li dar ket, bi kar bîne. Heger rêxistin, rewşenbîr û siyasetmedarên kurd înîsîyatîveke bi vî rengî bigrin, dê wê demê tevgera kurdî jî ji wê koreriyê derkeve.

Tirkîye, ji alîyê pêşveçûna aborî ve ketiye pêvajoya pêşketineke bi lez û bez. Dixwaze li Rojhilatê Navîn bibe xwedî roleke pêşeng û serekî. Herweha dixwaze bibe endamê Yekîtîya Ewropî. Tirkîyeyeke ku nikaribe pirsgirêka kurdî çareser bike, dê ne karibe bikeve Yekîtîya Ewropî û ne jî karibe wek wê dema osmanî ya mêtînger li Rojhilatê Navîn, Balkan û li welatên Kafkasyayê pirsgirêkan çareser bike.

Tirkîye heta ku pirsgirêka kurdî a li welatê xwe çareser neke, nikare ji bo pirsgirêkên Rojhilatê Navîn, Kafkasya û Balkanan wek muhatab bê girtin.

Tevgera kurdî gelek bi tenê ye û li dinyayê wek rêxistinên Rojhilatê Navîn ên dagîrker û terorîst hatiye nas kirin. Wek dijmina Ewropa, Îsraîl û Amerîkayê hatiye nasîn. Ji xeynî çend partîyên çep ên sekter ên ewropî li dinyayê kes alîkarî û piştgirîyê nade tevgera kurdî a bakûr. Tirkîye bi hemû hêza xwe ve ji bo îzolasyona tevgera Kurdistana Bakur dixebite. Kurdan hîn meseleya xwe nebirine dezgehên navnetewî yên wek UNO, Yekîtîya Ewropî, Helsînkî, Konseya Ewropayê û dezgehên din yên cîhanê. Ev jî kêmasîyeke kurdan a heyatî ye. Heta kurd bala wan dezgehên navbihurî nekşîne, pirsa xwe nebe wan deran, dê nikaribe tu alîkarî ji wan dezgehan bigre û tevgera kurdî pêşve bibe.

Ji bo hevkarî û alîkarîya têkoşîna Kurdistana Bakur potansîyeleke navnetewî ya gelek mezin heye. Dostên miletê kurd, li dinyayê zehf in. Ji hêla din ve, li Ewropayê ji mîlyonekê zêdetir kurd dijîn. Bi sedhezaran ciwanên kurd hene ku li Ewropayê hatine dinê, li wir xwendine, bi du-sê zimanan dizanin û di warê telekomunîkasyonê de xwe pêşve birine. Dikarin hemû Ewropayê ji pirsgirêka kurdî haydar bikin û bala hemû kesî bikşînin ser meseleya Kurdistanê. Lê mixabin, di alîyê siyasî de bê înîsîyatîf û bê xwedî ne. Ji xeynî min, li Ewropa û li Amerîkayê bi hezaran akademîsyenên kurd dijîn. Tevgera Kurdistana Bakur ji wan îstîfade nake.

Em kurd dikarin ji bo azadîya Kurdistanê bi xebatên dîplomatîk û lobîyê zexteke gelek mezin li ser Tirkîyê çêbikin.

* Endamê "Fraktion Die Linke"

Wênesazê vê hejmarê

Ahmet Aslan

Ahmet Aslan di sala 1986ê de li gundê Taburoglu yê Kirşehirê ji dayik bûye. Dibistana seretayîyê li gundê xwe xwendiye.

Di sala 1977ê de li navenda Kirşehirê bi cîh bûye û perwerdeya xwe li wê dere domandiye. Di 2000-2001ê de li lîseya Kirşehirê dest bi perwerdeya xwe ya navîn kiriye.

Di 2005-2006ê de li Zanîngeha Gazîyê dest bi perwerdeya xwe ya bilind kirïye, lê perwerdeya vê zanîngehê nîvco hiştiye û di 2007-2008î de li Zanîngeha Selçukê di Fakulteya Perwerdeya Mamostetîya Wênesazîyê de dest bi xwendinê kiriye.

Di vê pêvajoyê de beşdarî hin çalakîyên wek pêşbir, peşangeh û workshopan bûye, li ser îllustrasyonên dijîtal û vîdeoyê xebitîye.

Ji bilî van xebatan ji sala 2008ê vir ve bi rêya otostopê seranserî Tirkîyê û Gurcîstanê gerîyaye û bûye xwedîyê azmûnên girîng. Di vê pêvajoya gerê de li cîhên ku digerîya beşdarî organîyasyonên hunerî bûye.

Di 2011ê de perwerdeya xwe ya zanîngehê bi serkeftî temam kiriye.

Hunermend Ahmet Aslan ji 2007ê vir ve li gelek bajaran pêşangeh li dar xistine. Hunermend li Stenbolê dijî û xebatên xwe li kargeha xwe didomîne.



Di navbera îdeala sportîf û qanûna yê herî bi hêz de

Klubên futbolê yên wekhev, lê belê ne zêde

David Garcia*

Ji 8ê hezîranê heta bi 1ê tîrmehê, Euro 2012a futbolê, a ku ji alîyê Polonya û Ukraynayê ve tê organîze kirin, wê şahidîyê li musabeqeyên di navbera navdarên futbolê yên klubên mezin bike. Ev klub zêde ketine bin deynan û Yekîtîya Komeleyên Ewropî ya Futbolê (UEFA) banga nîzam û rêkûpêkîyê li wan kir. Lê belê "fair-play financier" a ku hê nû biryara wê hat dayîn gelo bi rastî dikare bike ku elîtên klubên Ewropayê fikaran bikin?

Adara 2003yê. Dema kongreyekê li Budapeşteyê, Yekîtîya Ewropî ya Komeleyên Futbolê (UEFA), ango sazîya birêveberîya goka glover li Ewropayê, henekê xwe bi kirina lobîya klubên mezin dike, ku ew îşaret bi tîbûna wan a desthilatdarî û kar ya bê hed dike, biryarek weha digire: "*Futbol hevwateya heqî, derfet, dildarî û cihêrengîyê ye. Ev sporeke girtî nîne ku bi tenê dewlemend û xwedî hêz karibin beşdar bibin. UEFA razî nabe bi avahîyekê, yan jî sîstemekê ku klubên piçûk, komeleyên piçûk û alîgirên wan nabin xwedîyên derfetan ku xewnên xwe pêk bînin. Ev yek bi îdealên UEFAyê, yên Ewropa û futbolê re hev nagire.*"

Nîsana 2012ê. Klubên pir dewlemend ên spanî serwer in li ser futbola Ewrupayê. Di nav heşt tîman de ku gihiştin nîvfînalên Lîga Şampîyonan û Lîga Ewropayê (UEFA her du pêşbazîyan organîze dike) FC Barcelona, Real Madrid, Athletico Madrid, Valencia CF û Athletic Bilbao (her sêyên dawîyê di Lîga Ewropayê de) hene. Serketineke sporê ku bi xêra muameleyeke bacê ya pir bi kêrî klubên futbolê tê, hat bi dest xistin. Li welatekî ku bêhtirî ji her pênc mûçegiran yek jê li kar digere, dilferehîya hukûmeta spanî ya rastgir –û ya berîya wê ku José-Luis Rodriguez Zapatero yê sosyalîst ew bi rê ve dibir– a ku kêm ecele dike ku 752 mîlyon euroyên derengmayî û ketî serhev ên li klubên futbolê bistîne (jixwe em behsa 250 mîlyon euroyên ku klub pê deyndarên sazîya Ewlekarîya Civakî ne jî nakin) (1) baş nayê dîtin. Berdevkê Partîya Karkerên Sosyalîst a Spanî (PSOE) Manuel Pezzi yê ku pêşnîyaza qanûneke armanca wê ew e ku mukelîfên bacê yên baca xwe nadin li derveyî musabeqeyan bihêle, derba xwe datîne "*ji bo musabeqeyê di navbera reqîban de wekhevîya tam hebe. Komên ku* [baca xwe] *nadin divê destûra wan neyê dayîn ku bikevin pêşbazî û musabeqeyan*." (2)

"Wekhevîya di navbera reqîban de"? Sekreterê giştî yê UEFAyê Gianni Infantino gumanbirîya xwe ji me venaşêre. Ew pirsgirêkê weha bi carekê hal dike "*wekhevîya mutleq dîtineke fikrî ye. Li hemberî vê asta lihevderneketina budceya hin kluban encamên musabeqeyan texrîf dikin.*" Ber bi dawîya sala 2010ê ve klub û komên ewropî yên dabeşa yekem zirareke 1.6 mîlyar euro nîşan dan. Hevkêşe hêsan e: Çiqasî klubek dewlemend be, ewqasî dikare lîstikvanên ku destûrê bidinê şampîyonê û kupayan kom bike, bikişîne nav refên xwe. Ev rewş "nedîyarbûna muhteşem" a ku armanca wê dîyarkirina encama musabeqeyên sporê ye, pir bêqîmet û kêmtesîr dike.

Michel Platini bi awayekî muhteşem ji nû ve weke serokê UEFAyê di adara 2011ê de hat hilbijartin, wî soz da ku rêzgirtina ji "fair-play-financier [lîstika durist-finansor]" (FPF) re wê bibe şertê tevlîbûna Kupayên Ewropayê. Li Romayê wî biryara xwe weha rave kir: "*Divê em fêrî kluban bikin ku normal bibin, ku pereyên wan ên nînin xerc nekin. Lewma heke em vê bikin, em ê bikevin girtîgehê; lê belê heke klubên futbolê bikin ew kupayan hêsanîtir bi dest dixin, û ev ne normal e.*" (3)

Cezayên ne birêkûpêk

Pasên rast xelas bûn? Ne bi temamî. Erê qaîdeya UEFAyê ya li ser fair-play-financier destûra lihevderneketina budceyê ya heta bi 5 mîlyon euroyan dide, di vê qaîdeyê de tolerans jî heye ku tesîra wê bisînor dike. Bi vî awayî dema du kontrolên pê, sî yên ku wê 2013 û 2014ê pêk werin, wê encameke negatîf a heta bi 45 mîlyon euroyan were qebûl kirin; di nav sê salên piştre de ev mîqdar wê dakeve 30 mîlyonan. Komîteya birêveber a UEFAyê di der barê rêjeya herî bilind a destûr dayî de ji sala 2018ê û pêve heta niha tiştek negotiye.

Serokê desteya kontrola fair-play financier, kevne-serokwezîrê Belçîkayê Jean-Luc Dehaene hişyar dike: "*Em bi roleke refaqeta kluban radibin, lê belê heke klub rêzê ji qaîdeyan re negirin em ê wan ceza bikin, çawa ku me anî serê Real Majorqueyê, hê berîya ku bikeve pêvajoya serdana fair play financier me xwest ku ew sala 2010ê nekeve Lîga Ewropayê.*"

Li dervehiştina kluba Baléaresê ango kluba bêqîmet a şampîyonaya Spanyayê, qet nebû sedema nerazîbûnên mezin. (4) Lê belê gelo UEFA wê biwêribe ku qada lîstikê li klubên mezin ên Ewropayê yên weke Real Madrid, Manchester United yan jî Bayern Munchenê qedexe bike? Platînî bi îhtiyat e û xwe nade ber ku bi awayekî zelal bipeyive. Çend rojan berîya ku 22yê adara 2011ê ji nû ve were hilbijartin wî got "*Gelo we karîbû hûn bifikirin ku berîya gelek salan Birêveberîya Neteweyî ya Kontrola Îdarî klubên weke Bordeaux (sala 1991ê) û Olympique Marseilleyê (sala 1994ê) ji lîga wan daxe?*" (5)

Desteya Kontrola Malî ya UEFAyê weke Birêveberîya Neteweyî ya Kontrola Îdarî (DNCG) ya fransî ye, û ew ê bibe xwedîya wê hêzê ku klubên herî dewlemend li derveyî Lîga Şampîyonan bihêle. Aborîzanê sporê Wladimir Andreff îşaret bi cihêtîya piçûk dike: "*Heke DNCG qaîde tam pêk bianîya Paris-Saint-Germain* [PSG] *wê di lîga yekem de nebûya. Lê belê DNCG cezayan bi awayekî ne birêkûpêk dide.*" PSGya ku milkê emîrê Qetarê ye, karîbû dawîya sezona 2011 û 2012ê bibe xwedî budceyeke ku 100 mîlyon euroyan lihev dernakeve... Andreff vê pirsê ji xwe dike "*Gelo mumkin e ku klubên pir baş ên ku navûdengê Lîga Şampîyonan in li ber ezmûna herî mezin ranebin?*" Ji bo kevne-serokê Olympique de Marseilleyê Pape Diouf "*nirxê pêşbazîyê wê kêm be heke Real Madrid û Chelsea tê de cihê xwe negirin*".

Xwedîya hêzeke malî ya mezin bi 754 mîlyon euroyan – ji mafên weşana televizyonê tên bidestxistin –ku ew leva dike li klubên beşdarî Lîga Şampîyonan dibin (6), Federasyona Ewropî deyndara mêvanên xwe yên herî xwedî prestîj dîmîne. Bi kurtî aborîzan Michel Desbordes weha rave dike: "*Di destê UEFAyê de deftera çekan heye. Lê belê heke klubên mezin bi hev re qaîdeyên fair-play financier red bikin û biryarê bidin ku ezmûnê boykot bikin, hingê wê deftera çekan nemîne, lewra Lîga Şampîyonan ji bo kanalên televîzyonê têra xwe wê balkêş nebe.*" Rîsk heye ku mirîşka hêkên zêr dike were ser jê kirin. Andreff bi bîr dixe "*UEFAya ketiye rewşa yekdestdar xwedîya berhemeke berîqendî ango Lîga Şampîyonan e. Û sedema hebûna vê komeleyê ew e ku bi futbolê pereyan bi dest bixe.*" Tevî ku wekhevîya paran a ku rêvebirên UEFAyê li Budapeşteyê pesnê wê didan, hatibe ji bîr kirin jî...

Sala 1992yê cografyanasê sporê Boris Helleu vê analîzê dike "*Lîga Şampîyonan ji ber daxwazên klubên herî dewlemend derket holê, wan dixwest bi vê bêîstîqrarîya spotîf bisînor bikin û mafên weşana televizyonê jî bixin rewşa herî baş.*" Bi gefa damezrandina lîgeke girtî ya paralel a ku bi tenê ji yên herî xurt re veqetandî, klubên mezin Kupaya Ewropayê ya Klubên Şampîyon dikujin. Sala 1955ê bi teşwîqa rojnameya sporê ya fransî *L'Equipe*ê "C1"ê dest pê kir, li gor "C1"ê serketîyên şampîyonayên ewropî wê li dijî hev bilîstana di rêzek musabeqeyên çûnûhatinê yên bi elîmînasyona yekser de, prensîp "ji her welatî tîmek" bû, mezinahî û hêza wan a aborî çiqas dibûya bila bibûya.

Di bin zexta federayonên mezin – Almanya, Ingilîstan, Spanya, Îtalya, Fransa– û yên weşanên wan dikin de, UEFAyê destûr da welatên herî xurt ku çar kluban pêşnîyaz bikin, ji ber lawazîya encamên xwe neteweyên piçûk dikarîn bi tenê yek klubê bişînin. Bi ser de jî ev klubên neteweyên piçûk neçar in di çar musabeqeyên berîya turnuwaya bi rastî de jî bi ser kevin. Klubên "mezin" ên ku bi hêsanî heqê ketina turnuwayê bi dest dixin û pir kêm carên îstîsnayî diskalîfe dibin, dikarin ji bo şampîyonîyê li hember hev bilîzin –helbet dewlemendîya ji mafên weşana televizyonê jî li hev leva dikin. Berdevkê UEFAyê William Gaillard sala 2005ê li xwe mikur hat: "*Qet şik û guman tê de nîne ku ev ji deh salekê vir ve pere ji serî ve encaman dîyar dikin û hejmara klubên ku digihîjin astên jor ên pêşbazîyê herdiçe sînordartir dibe*". (7)

Birêveberên kanalên televizyonê yên sereke yên ewropî, yên ku xwedîyên AC Milan û patronê sê kanalên televizyonê yên sereke yên taybet ên îtalî Silvio Berlusconi serkêşîya wan dike, ji qonaxeke xwedî qudret sala 1999ê gef xwarin ku ew ê lîgeke girtî damezirînin. Hingê UEFAyê serî li ber şantajê netewand. Elîtên klubên ewropî ders ji vê têkçûnê girtin û salekê piştre G14 ango koma zextê ya ku berjewendîyên tîmên herî dewlemend ên Ewropayê diparêze, damezirandin.

Platini yê ku sala 2007ê bi dengê welatên "piçûk" û welatên Rojhilatê Ewropayê hat hilbijartin, ketina Lîga Şampîyonan qismî demokratîk kir. Bi xêra vê pêşîlêvekirinê şampîyona Qibrisê Apoel Nicosie adara 2012ê heta bi qonaxa çaryek-fînalê çû. Fîloya şer a Real Madridê ya ku xwedîya budceyeke pêncîh caran ji ya wê bêhtir e, ew ji şampîyonayê seridand! Berîya wê bi salekê FC Copenhague ya dilnimiz xwe gihand heta bi heştyeka fînalê.

Reforma Platini ne dîyarker, lê belê sembolîk bû, û dest nedida tewazûna hêzan a ku para bêhtir bi kêrî klubên mezin tê. Berevajî ya ku ragihandî, serokê nû yê UEFAyê mafê tevlîbûna Lîga Şampîyonan nade serketîyên kupayên neteweyî. Ew bi vî awayî berjewendîyên welatên mezin diparêze, yên ku hejmara nûnerên wan wê bi awayekî otomatîk kêm bibûya. Pişta G14ê rast e bi fikr û helwêsta lihevker a Platini, û sibata 2008ê bi dilê xwe xwe fesix kir. Hema hema bi yekdengî çapemenîya ewropî lîstika xapê ya serokê UEFAyê silav kir, ew weke parêzvanê ji ya xwe nayê xwarê, yê lawazan li dijî yên xurt hat nîşan dan. Rojnameya aborîyê ya fransî *Les Echos* ya nêzî derdorên karsazan nexapîya, bi hinek îronîyê pîroz dike "*vrai-faux ennemi du "sport business / dijminê birastî-derewîn ê 'sport businiess'ê*" (13ê tîrmeha 2009ê).

Kevne-kaptanê koma Fransayê wekî din xwe dispêre têkilîyên xwe yên baş ên bi kluban re da ku reforma fair-play financier bi nermî derbas bike. Serokê Komeleya Ewropî ya Kluban (AEC) û dîrektorê teknîk ê Bayern Munchenê Karl-Heinz Rumenigge yê alman vê şiroveyê dike: "*ji serî ve kêfa min ji vê fikrê re hat, lewra jixwe wê demê dîyar bû ku futbola ewropî ya klubê ber bi rêya xirab ve diçe.*" (*Le Monde*, 25ê çileyê 2011ê)

Hin aktorên cîhana futbolê Platini bi xwe jî gij dikin da ku agirê birêkûpêkkirinê hê bêhtir bi pêş ve bibe. Serokê Şaxê Sendîkaya Cîhanî ya lîstikvanên futbolê yên profesyonel ango Federasyona Navneteweyî ya Komeleyên Futbolvanên Profesyonel (FIFPRO) yê Ewropayê Philippe Piat doza dîyarkirina sînorên pereyên li transfera lîstikvanan tên xerc kirin, dike. Ew vê çavdêrîyê dike: "*bi tenê çar yan jî pênc klub dikarin heqê Cristiano Ronaldo, yan jî Lionel Messi yên ku weke baştirîn lîstikvanên dinyayê tên nasîn, bidin da ku wan transfer bikin. Bi ser de jî ev her du lîstikvanên jêhatî avantajeke dîyarker didin komên di Lîga Şampîyonan de dilîzin.*" Ji ber vê jî ew pêşnîyaz dike ku pereyê transfera futbolvanan "*weke mînak bi 10 mîlyon euroyan were sînordar kirin da ku transferkirina wan ji bo bêhtir kluban mumkin be*". Hevserokê komîsyona fînansê ya AECyê û serokê Olympique lyonnaisê Jean-Michel Aulas bi heman mantiqî pêşnîyaz dike ku mûçeyên lîstikvanan û her weha komîsyonên menejer dema transferê distînin –ji sê paran diduyê dahata kluban li van komîsyonan diçe– werin dîyar kirin. Di encama biryara Bosman (8) a ku bazara futbolvanên profesyonel lîberal kir, nirxê bazarê yê lîstikvanan ji du dehsalan û vir ve pir zêde bilind bû.

Platini xwe dide ber sînordarkirina transferan û hecmê mûçeyan, lê belê li şûna "cezayên" li klubên qaîdeyên fair-play financier binpê kirî hatî birîn. Dema vê dike jî bi zanîn li ser kitekitên reformeke muhtemel, zelûl dimîne .

Komîsera Ewropayê ya ji sporê berpirsîyar Androulla Vassiliou ji ber transfera çileya 2011ê ya bi 58 mîlyon euroyan ku Fernando Torres ji Liverpoolê anî Chelseayê "*şok bû*" û destpêka "lêkolîneke" li ser birêkûpêkkirina tevgerên lîstikvanan ragihand. (9) Li gor wê prensîpa xwecihîbûnê "*erê kontroleke baştir a duristîya malî ya kluban* ferz dike, *lê belê ev karê her welatî ye ku bi rêzgirtina ji rêûresma xwe ya huqûqî û sportîf re navgîna herî baş bibîne.*" Dema mesele... çareserkirina pirsgirêkên newekhevîyan e, Androulla Vassiliou dilsozîya xwe bi tropîzma [eyar kirina tevgerên xwe li gor li faktorên derveyî, nota wergêr] desttênewerdanê ya Komîsyona Ewropayê nîşan dide.

* Rojnamevan

(1) ABC, Madrid, 5ê nîsana 2012ê.

(2) *El Mundo,* Madrid, 15ê adara 2012ê.

(3) *La Repubblica,* Rome, 24ê çileya2011ê.

(4) Çar klubên din jî hatin cemidandin: Cork (Komara Îrlandayê), Vetra (lîtwanya), Portsmouth (Ingilîstan) û FC Lokomotiv Astana (Kazakistan).

(5) *L'Equipe,* Parîs, 18ê adara 2011ê.

(6) Pereyê li beşdarên weşana 2010-2011ê hatî belav kirin.

(7) *Le Monde,* 22ê sibata 2005ê.

(8) Biryareke Dîwana Edaletê ya Ewropayê 15ê kanûna 1995ê dawî li kotayên lîstikvanên bîyanî yên ji welatên Yekîtîya Ewropayê tên anî, dema ev biryar da jî xwe sipart xala 48ê ya Peymana Romayê ya di der barê geşta serbest a karkeran di nava dewletên endam de.

(9) "Androulla Vassiliou: 'Je suis choquée' par le montant des frais de transfert au football / Androulla Vassiliou: 'Ez şok bûm' ji ber mîqdara buhayê transfera di futbolê de", 23ê sibata 2011ê, www.euractiv.com

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.kurdipress.com

Anîna dijber hev a têkoşîna çînan û doza cihêbûnê?

Wekhevî, nasname û heqîya civakî

Nancy Fraser *

Dozên kêmkirina newekhevîyê demeke dirêj der barê levakirina wekhev a dewlemendîyê de bû. Ji çend dehsalan û vir ve awayekî nû yê daxwazê wekhevîyê dike, yek bi rêzgirtina ji cihêtîyan, nasnameyên hindikahîyan û şerê li dijî cudakerîyê re. Gelo em dikarin li têkilîya di navbera van herdu têgehan de bi awayekî bifikirin ku hevdu ji alîyê xwe ve xurt bikin?

"Qebûlkirin" weke têgeheke kilît a serdema me hatiye ferz kirin. Ev mîrat ji fîlozofîya hegelî maye, wê kêlîya ku kapîtalizm têkilîyên transkulturel bi lez dike, şemayên şiroveyê dişkîne û nasnameyan polîtîze dike ji nû ve mayînde dibe. Kom di bin alayên netewe, qewm, "nijad", cins û cinsîyetê de têdikoşîn da ku "cihêtîyekê bidin qebûl kirin". Di van şer û têkoşînan de weke cihê seferberîya siyasî nasnameya kolektîf dikeve şûna berjewendîyên çînî –bêhtir doza "qebûlbûna" weke reş, homoseksuel, korezî (kesên ji Corrèzê) yan jî ortodoks tê kirin û ne ya weke proleter yan jî bûrjûwa; neheqîya bingehîn êdî ne hemwateya mêhtingerîyê ye, lê belê ya serwerîya çandî ye.

Gelo ev veguherîn lebikandinek e, ku wê rê li ber awayekî balkanîzebûna civakê û redkirina pîvanên exlaqî yên gerdûnî veke? (1) Yan jî gelo, dema ku bi awayekî qelp pîvanên koma serwer gerdûnî kirin, ew perspektîfa sererastkirineke korîtîyeke çandî ya girêdayî nêrîneke materyalîst, ya ku ji ber hilweşîna komunîzma tîpa sovyetî weke bawerî pê nayê navdar bûyî, û ya ku rengên cuda nabîne, wê neheqîyê xurt bike? (2)

Li vir du têgehên global ên neheqîyê tên hemberî hev. Ya pêşî neheqîya civakî ye, û bi xwe jî encama avahîya aborî ya civakê ye. Ew weke mêtinkarî, yan jî xizanîyê bi gewde dibe. Têgeha duyem bi cewherê xwe çandî, yan jî sembolîk e, ji mestereyên civakî yên temsîlê tê ku kodên xwe yên şirovekirinê û nirxên xwe ferz dikin û pê hewl didin ên din li derve bihêlin, serwerîya çandî, qebûlnekirin yan jî piçûkdîtinê pêk bînin.

Ev cudatîya di navbera neheqîya çandî û neheqîya aborî de nabe ku wê rastîyê tine bike ku di pratîkê de her du şêwaz bi awayekî adetî di zik hev de ne, bi rengekî ku hevdu dîylektîkî xurt bikin. Ya rastî, talîbûna aborî tevahîya beşdarbûna li hilberandina çandî qedexe dike, ku pîvanên wê bixwe ji alîyê dewletê ve, yan jî cîhana aborî ve hatine sazûman kirin.

Sererastkirin yan jî veguherîn?

Çareya ji neheqîya aborî re bi guherînên strukturel pêkan e: Levakirina hatinên madî, ji nû ve organîzekirina dabeşkirina kar, xistina bin kontroleke demokratîk a biryarên veberhênanê, bi tevahî veguhertina şewazê xebitîna aborîyê... Ev yekûn bi tevahî yan jî qismî girêdayî "ji nû ve levakirinê" ye. Çareya ji neheqîya çandî re bixwe di guhertina çandî de ye, yan jî sembolîk e: Ji nûve qedirpêdana nasnameyên piçûkxistî, qebûlkirin û qedirgirtina cihêrengîya çandî, yan jî bi awayekî globaltir, bi awayekî giştî serûbinîhevkirina modelên civakî yên temsîlê, ev jî wê têgihana her kesî ya derbarê xwe bi xwe de biguhere. Ev yekûn girêdayî "qebûlkirinê" ye.

Her du têgeh di têgihana xwe ya komên mexdûrên neheqîyê de ji hev cihê ne. Di çarçoveya jinûve levakirinê de mijar wê bi maneya giştî û berfireh çînên civakî bin, yên ku pêşî li gor şertên aborî û têkiliyên xwe yên bi bazarê, yan jî navgînên hilberandinê re tên dîyar kirin. Mînaka klasîk ya di vê biwarê de fikra marksîst a çîna karker a tê mêhtin e, lê belê ev têgehan herweha komên koçber, hindikahîyên etnîk û hwd. jî dihewîne. Di çarçoveya qebûlbûnê de, neheqî êdî ne girêdayî têkilîyên hilberandinê ye, lê belê girêdayî nebûneke liberçavgirtinê ye. Gelek caran behsa komên etnîk tê kirin yên ku modelên çandî yên serwer wan weke cihê û nirxkêm û piçûk dibînin: Homoseksuel, "nijad", jin ... rastî cudakarîyê tên. Daxwazên girêdayî jinûve levakirinê pirî caran doza tinekirina hêmanên aborî yên ku hîmê taybetbûna koman pêk tînin û meyildar in ku nedarîçavbûna cihêtîya wan teşwîq bikin. Berevajîyê vê, daxwazên girêdayî qebûlbûnê yên ku xwe dispêrin cudatîyên weke heyî qebûlkirî yên koman, meyildar in ku cudatîyê teşwîq bikin (heke ew wê bi kirdetî neafirînin berîya ku doza nirxê wê bikin). Ango siyaseta qebûlbûnê û siyaseta jinûve levakirinê weke ku bi hev re di nav ... alozîyê de bin xuya dikin.

Du rêbazên dermankirina neheqîyê

Di nav van şert û mercan de mirov dad û heqîya civakî çawa tesewur bike? Gelo divê mirov çîn li pêşîya cins, cinsîyet, nijad, etnîsîte bigire û û tevahîya daxwazên "hindikahîyan" red bike? Li ser navê gerdûnîbûnê, yan jî komarxwazîyê di asîmîlekirina li nav nirxên piranîyan de israr bike? Yan jî gelo divê mirov hewl bide ya ku hê jî destjênabe ya vîzyona sosyalîst û ya ku di fîlozofîya "piştîsosyalîzmê" ya pirçandîbûnê de rewa xuya dike, bike hevgirên hev?

Du rêbaz hene ji bo dermankirina neheqîyê. Dermanên sererastker, armanca wan berîya hertiştî başkirina encamên rêkxistina civakî ne, bêyî ku sedemên di kûrahîya wê de biguherin. Derman û çareyên veguherîner bixwe der barê sedemên di kûrahîya mijarê de ne: Muxalefet di navbera semptom û sedeman de ye.

Li qada civakî dermanên sererastker ên ku bi awayekî dîrokî têkildarî Dewleta-Refahê ya lîberal in, tên bi kar anîn da ku encamên levakirineke neheq lawaz bikin, lê belê destê xwe nadin organîzasyona pergala hilberandinê. Di nav du sedsalên bihurî de derman û çareyên veguherîner bixwe bi sosyalîzmê ve hatin têkildar kirin: Bi awayekî tundrew guhertina avahîyên aborî yên ku bingehê neheqîya civakî pêk tînin, vê jî bi riya jinûve rêkxistina têkilîyên hilberandinê dike, hem bi levakirina hêza kiryarîyê û hem jî bi parvekirina civakî ya kar, şert û mercên hebûnê diguhere.

Mînakek vê cihêkirinê rohnî dike. Alîkarîyên ku li gor dahata malê tên hesab kirin ên ku li yên herî xizan weke alîkarîyeke madî tên belav kirin, herweha alîkarîyê didin zexmkirina cudakirinan îhtîmal e rê li ber pevçûnê vekin. Bi vî rengî li qada civakî ji nû ve levakirina sererastker li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kirasê *affirmative action* (pirî caran weke "cudakerîya erênî" tê wergeradin) li xwe dike. Ev pêkanîn tê bi kar anîn da ku veqetandina beşeke adilane ya karan û perwerdehîyan ji mirovên reş re misoger bike, gava vê dike jî destê xwe nade cewherê meselê, yan jî hejmarê. Li qada çandî, [siyaseta] qebûlbûna sererastker xwe bi neteweparêzîyeke çandî dide der, ew bi rîya nirxdana bi "reşbûnê" hewl dide rêzgirtina ji mirovên reş re misoger bike, dema vê dike jî koda dualî ya spî-reş qet naguhere, û ya ku maneyê didiyê jî ev bixwe ye. Ango *affirmative action* siyaseta civakî-aborî ya dijnijadperestîya lîberal û siyaseta çandî ya *black power* dike yek.

Dîsa jî ev çareserî strukturên kûr ên ku newekhevîya çînan û nijadan diafirînin ji xwe re nake armanc. Bi vî rengî jinûve birêkûpêkkirinên seresere her zêde dibin. Ev sererastkirin dibin alîkar ku cudatîya di navbera nijadan de bêhtir were hiskirin û mirovên herî bêpar weke çîna herî kêm û têr nabe, timî hewceyî alîkarîyê ye û heta carinan weke çîna komeke xwedî îmtiyaz a ku... xatirê wê tê girtin, were nîşan dan. Bi vî awayî helwêsteke armanca wê rastkirina neheqîyên girêdayî levakirina dewlemendîyê dibe ku di encamê de rê li ber afirandina neheqîyên di qada qebûlbûnê de veke.

Çareyên veguherîner bixwe li hemberî vê, dema pergala civakî ya gerdûnî û ferzkirinên bi tevahî pêşverû bi hev ve dikin yek, hingê armanca wan ew e ku gihîştina kar û îstîxdamê ji her kesî re misoger bikin, pêre jî hewl didin vî karî ji bersivdana hewcedarîyên sereke cihê bikin. Ev jî rê li ber îhtîmala kêmkirina newekhevîya civakî vedike bêyî ku kategorîyên mirovên nazik lawaz biafirînе, yên ku weke ku ji xêrxwazîya dewletê sûdê werdigirin, tên nîşan dan. Helwêsteke bi vî rengî ya ku tevahîya bala xwe daye ser neheqîyên levakirinê, di dermankirina hin neheqîyên qebûlbûnê de alîkar e.

Ji nû ve levakirina sererastker û ji nû ve levakirina veguherîner di serî de têgehaneke gerdûnîparêz ya qebûlkirinê heyî dipejirînin, ango wekhevîya nirxên exlaqî yên mirovan. Lê belê beramberî jihevcihêkirina koman, ew xwe disipêrin mantiqên guhertî.

Tevgera gay homoseksuelîyê wek çandekê dibîne

Çare û dermanên sererastker ji bo neheqîya çandî ji wê tişta ku em jê re niha dibêjin pirçandîbûn: Ew dawîlêanîna rêznegirtinê ye ji nasnameyên kolektîv re yên ku bi awayekê neheq nirxê wan hatiye kêm kirin, lê belê dest nadin hem naveroka van nasnameyan û hem jî pergala cihêkirina nasnameyî ya ku xwedispêrinê. Dermanên veguherîner bixwe bi awayekî adetî bi jihevdexistinê re têkildar in. Ew hewl didin dawîyê li rêznegirtinê bînin bi veguherandina avahîya nirxpêdana çandî ya di bingehê wê de. Bi bêîstîqrarkirina jihevcihêkirina heyî, ev çare ne bi tenê rêzgirtina ji xwe re teşwîq dikin, ew hisa me ya derbarê me de jî diguherin.

Mînaka cinsîyetên piçûkdîtî vê jihevcihêkirinê rohnî dike. Çareyên sererastkirina homofobîyê bi awayekî adetî têkildarî tevgera *gay* in, armanca van tevgeran jî jinûve qedirpêdana nasnameya homoseksuel e. Çareyên veguherîner berevajîyê vê xwe nêzî tevgera nêremoyan dikin, ku dixwazin dubendîya homoseksuel û heteroseksuel ji hev de bixin. Tevgera gay homoseksultîyê weke çandeke xwedîya xisletên taybet a hinekî weke awayê etnîsîteyê, dibîne. Ev "modeleke nasnameyî" ye ku di gelek têkoşînên qebûlbûnê de hatine pejirandin. Ev model li şûna wêneyên neerênî yên derbarê xwe de ku çanda serwer ferzkirine û avêtine hundirê xwe, dixwaze çandeke xweser bi cih bike, ev çanda ku wê xwe bi awayekî eşkere nîşan bide jî wê bike ku tevahîya civakê rêzê jêre bigire. Ev model destekên otantîk dihewîne, lê belê bi li ser bicihkirina siyaseta qebûlkirinê û siyaseta nasnameyê, ew xwezayîkirina nasnameya komekê teşwîq dike, heta bi riya îdîakirina "otantîkbûn" û guhertîbûna xwe girîngkirin û cewherîkirina wê jî teşwîq dike.

Tevgera nêremoyan bixwe, berevajî vê, homoseksuelbûnê weke têkelmaneyeke ku hetereseksuelbûnê afirandî û bênirxkirî dibîne: Her du jî bêmane ne heke ya din nebe. Armanc êdî ne nirxdana bi nasnameya homoseksuel e, lê belê ji holê rakirina vê dubendîyê ye. Tevgera gay dixwaze nirx bi cudakirina heyî ya di nav komên cinsî bide –çawa ku siyasetên sererastker ên ji nû ve levakirinê yên dewleta-refahê jî ji bo cudakirinên civakî dikin–; tevgera nêremoyan hewl dide wan bixe ber lêpirsînê –îlhama xwe ji sosyalîzmê û civaka bêçîn digire.

Dema ku mirov bi qebûlnekirinê re weke pêşhukmekî bi awayekî xweser ji nirxên îdeolojîk û çandî pêkhatî muamele bike, hingê tevgera nasnameyî têkilîyên xwe bi heqîya levakirinê vedişêre, û nabîne ku xwe di nav avahîya civakî de bi cih kiriye. Ev yek jî carinan dike ku hevalbendên wê neheqîyên aborî nebînin, û hêz û qeweta xwe bidin ser veguherandina çandê, ku bixwe weke rastîyekê tê dîtin. Bi vî rengî dibe ku kêm qîmet bi têkilîyên sazûmanbûyî were dayîn, ew têkilîyên di nav pergala alîkarîya civakî de, di navbera nirxên heteroseksuel ên serwer û wê rastîyê de ku hin çavkanî li mirovên homoseksuel girtine. Lê belê ev tevger herweha dibe ku newekhevîyên aborî bi tenê weke îfadeyeke ji rêzê ya hîyerarşîya çandî bibîne: Li gor vî mentiqî tepisandina çînê ji kêmnirxkirina nasnameya proleter tê. Bi tevahî berevajîyê marksîzmeke pespaye ye; çawa ku maksîzma pespaye berê ji bo siyaseta ji nû ve levakirinê siyaseta qebûlkirinê qedexe kiribû, kulturalîzma pespaye jî ferz dike ku maneya ji nû ve nirxdana bi nasnameyên piçûkxistî daketina bi çavkanîya newekhevîya aborî bi xwe ye, kirina şerê wê ye...

Tehlûkeya psîkolojîzasyonê

Modela em ê jê re bibêjin statuyî (veguherîner) dijbera modela nasnameyî (sererastker) ye: redkirina qebûlkirinê êdî weke xirabûneke derûnî, yan jî pêşhukmekî çandî yê xweser nayê dîtin, bêhtir weke têkilîyeke sazûmankirî ya hîyerarşîya civakî, ya ku sazîyên civakî wê diafirînin. Ya ku divê mijara qebûlkirinê be, ne nasnameya komekê ye, lê belê ji bo endamên vê komê statuya alîbûna bêkêmasî ye di danûstandina civakî de. Ev siyaset jihevdexistina her du awayên girêdayî hev yên xistina nav nîzamê ya civakekê ango awayê aborî û yê çandî, pêşnîyaz dike, ew herweha pêşnîyaz dike ku li wan eşkere bike ka ew çawa li pêşîya wekhevîyê dibin asteng. Ango mijar ne bicihkirina mafekî ya ji rêzgirtina civakî ya wekhev ji herkesî re ye (3), lê belê mijar bi doza wekhevîya beşdarbûna danûstandina civakî ji herkesî re dîyarkirina qada heqîya civakî ye weke ferzkirina hem ji nû ve levakirin û qebûlkirinê, hem jî ya çîn û statuyê. Bi xwe dûrgirtina ji psîkolojîzekirin û exlaqîkirinê, dibe ku çarçoveya fikrê ji bo stratejîyeke hevgirtî di vir de be, ya ku wê alîkar be ku pevçûn, lihevnekirin û nakokîyên di nav du awayên mezin ên têkoşinan de nerm û bê tehlûke bikin.

* Xwedîyê erka "Justice globale / Edaleta global" li Collège d'études mondiales de la Fondation de la Maison des sciences de l'homme. Nivîskara *Les Mouvements du féminisme. De l'insurrection des années 60 au néolibéralisme / Tevgerên femînîzmê. Ji raperînên salên 60ê ber bi neolîberalîzmê ve*, weşanên La Découverte wê pirtûkê îlona 2012ê biweşînin.

(1) *Bigire li ber* Richard Rorty, *Achieving our Country : Leftist thought in twentieth-Century America / Gihiştina welatê me: fikra çepgir li Amerîkaya sedsala 20ê,* Harvard University Press, Cambridge, 1998 ; Todd Gitlin, *The Twilight of Common Dreams : Why America is Wrecked by Culture Wars / Şevereşa Xewnên Hevpar: Çima Amerîka bi Şerên Çandan Wêran Bûye,* Metropolitan Books, New York, 1995.

(2) *Bigire li ber* Charles Taylor, "The Politics of Recognition / Siyasetên qebûlbûnê" di Amy Gutman (di bin birêveberîya wê de), *Multiculturalism : Examining The Politics of Recognition / Pirçandîtî: Ezmûna Siyasetên Qebûlbûnê ,* Princeton University Press, 1994.

(3) Axel Honneth, *La Lutte pour la reconnaissance / Şerê ji bo qebûlbûnê,* Le Cerf, Paris, 2000.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.kurdishmonde.com

Wezîrê aborîyê yê Fransayê Pierre Moscovici da zanîn ku peymana budceyî ya ewropî "ew ê li qada dewletê erê nekin" û divê "ew were temam kirin bi beşeke li ser mezinbûna aborî". Lê belê gelo jinûve muzakerekirina wê ya ku Hollande soza wê dayî, gelo dê têra guherîna cewherê metna peymanê bike, ya ku jihevdexistina sîstemên civakî û mekanîzmayên demokratîk ên Ewropayê radigihîne?

"Qaîdeya zêrîn" û mekanîzmaya îstiqrarê

Du peyman ji bo darbeyeke ewropî

Raoul Marc Jennar *

Sekretera giştî ya Konfederasyona Ewropî ya Sendîkayan (KES) Bernadette Ségol berîya demeke kurt ev çavdêrî kiriye: Peymana li ser Îstîqrar, Koordînasyon û Birêvebirina di nav Yekîtîya Aborî û Pereyî de (PÎKB) "*belkî dilê hevalên siyasî yên serokwezîra alman Angela Merkelê xweş bike, lê belê teqez wê dilê bi mîlyonan bêkaran, karkerên xizan û mûçeyên wan kêm ên li Ewropayê xweş neke; ew bixwe belesebeb li benda alîkarîyeke bi rastî ya bi destê sazîyên ewropî ne. Ji ber vê yekê em li ber rabûn.*" (1) Di daxuyanîyê de tu tişta rêvebera rêxistneke ku heta niha li ber tu peymanên ewropî ranebûbû, bibêje nebû; nermî û dilrehetîya wê ya beramber Brukselê kir ku yek ji damezirênerên wê sendîkavanê belçîkî Georges Debunne pê biêşe ku KES veguherîye "*qayîşa ragihandinê ya patronên ewropî*". (2)

Hukûmetên bîstûpênc welatên Yekîtîya Ewropî 1ê adarê PÎKB – ya ku di der barê mijara budceyê de "qaîdeya zêrîn" (Peymana Cadenas) ferz dike (nivîsa di çarçoveyê de bixwîne) – mohr kir û divê di nav mehên li pêşîya me de were erê kirin. Cadenas gihîştina çavkanîyên neteweyî asteng dike, ew bi peymaneke din re tê ku Mekanîzmaya Ewropî ya Îstîqrarê (MEÎ) pêk tîne. Parlemana Fransayê 21ê sibata 2012ê – bi bêalîmana xêrxwaz a piranîya gelekî mezin a hilbijartîyên sosyalîst û kesk – MEÎ erê kir, ev MEÎ tiştekî weke Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) pêk tîne. Ew ê ji 2013ê û pê ve şûna sazîyên 2010ê damezrandî bigire da ku ji heqê krîza deynan a Ewropayê derkeve. (3)

Transfera erk û jêhatîbûnan

Ev her du metin di jihevdexistina sazîyên demokratîk û paşvestandina modelên civakî yên ewropî de mohra xwe li qonaxeke dîyarker dixin. Piştî demeke îhtiyateke nisbî, mirov êdî nikare vê beridînê nebîne: Barên her diçe girantir dibin ên Dîwana Edaletê ya Yekîtîya Ewropî (DEYE), ferasetên ku ew bi pêş dixe û bi ser de jî peymanên ku Jacques Delors dema ew serokê Komîsyonê bû pêşnîyaz kiribûn (Seneda Yekane ya Ewropayê ya sala 1986ê û peymana Maastrichtê ya sala 1992yê) rê li ber derketina holê ya teknokratîyeke xurt xweş kirin, ev teknokratî hesab nade welatîyan û dikare bi hêsanî wan ji hin destketîyên civakî bêpar bike. Biryarên di civînên bilind ên li Barselona (2000) û Lîzbonê (2002) de hatin girtin ev jirêderketin xurttir kir, tevî ku hingê ji panzdeh hukûmetên welatên Yekîtîya Ewropî sêzdeh di bin bandora sosyal demokratan de bûn; paşê careke din hat xurt kirin dema ku Peymana Lîzbonê sala 2007ê bi zorê hat qebûl kirin, beşa girîng a naveroka vê peymanê sala 2005ê ji alîyê gelên Fransa û Hollandeyê ve hatibû red kirin.

Ev derbasbûna bi zorê tişteke din bi me dida zanîn: Bikaranîna prosedura jê re "hêsankirî" tê gotin ji bo ku endamên herêma euroyê MEÎyê damezirînin. Bi awayekî teorîk nabe ku ew ji bo "*zêdekirina erkên dayî Yekîtîyê*" were bi kar anîn. (4) Dîyar e ku MEÎ dikeve nav vê kategorîyê. Desteyeke wezîrên maliyeyê yên ku navê "walîyan" li wan tê kirin ew tê bi rê ve birin û bi vî awayê xwe dişibe dewleta di nav dewletê de: Ew serbixwe ye ji Parlemana Ewropayê û ji parlemanên neteweyî, dest bi buro û arşîvên wê nabe, û nabe ku ew bibe mijara lêpirsîn û lêkolînên huqûqî. Li hemberî vê "walîyên" navbirî dikarin DEYEyê bixin dewrê ya ku erkdara yekane ye li dijî dewleteke li ber wê rabe. Armanca MEÎyê "*seferberkirina çavkanîyên malî û dabînkirina bi şert a bêtawîz*" e, (5) ji bo welatekî endam ê ku di nav şert û mercên pir zehmet ên malî de ye û guman li ser hene ku îstîqrara malî ya herêma euroyê bixe tehlûkeyê. Ji bo pêkanîna vê armancê erka wê heye ku fonên ji dewletan û ji bazarê bistînin. Sermayeya wê weke 700 mîlyar dolaran hatiye dîyar kirin ku dewletên endam didin, ev dewlet "*bi awayê nikaribin lê vegerin û bê şert*" qebûl dikin ku sermayeya MEÎyê "*di nav heft rojên piştî daxwaza wê gihişte wan*" dabîn bikin. Fransa divê 142.7 mîlyar euroyan bidiyê. MEÎ dikare biryarê bide ku beşdarîya her yekê ji dewletên endam bilindtir bike, bêyî ev dewlet bikaribin gotinekê jî bikin.

Dema ku welatek doza sûdgirtina ji desteke MEÎyê bike, Komîsyon û Bankeya Navendî ya Ewropayê (ECB) ku nakeve ber tu kontrolên demokratîk, an jî siyasî, wê rîska herêma euroyê dikeviyê hesab bikin. Bi hevkarîya bi IMFyê re ew ê "hêza hilgirtina" deynê dewletê yê dewleta serî li wan daye û di warê malî de pêdivîyên wê yên "bi rastî" binirxîne. Piştre, heke alîkarîya malî hat erê kirin, dîsa Komîsyon tevî ECB û IMFyê wê şertan bi dewleta serî li alîkarîyê dayî re muzakere bikin. Rêzgirtina ji şertên ferzkirî re jî wê erka vê "troykayê" [birêveberîya ji kesan] be.

MEÎ wê bêşê ji dewletên endam bistîne, lê belê dikare herweha daxwazê li bazara sermayeyan jî bike. Maneya vê jî ew e ku ew bi xwe jî wê bikeve ber ajansên notdayînê. Bankeyên ku dikarin ji ECByê bi faîza % 1 pereyan deyn bikin, wê heman pereyî bi rêjeyeke faîzê ya gelekî bilindtir bidin MEÎyê û MEÎ jî paşê bide dewletan ... helbet bi rêjeyeke bilindtir. Ev fon wê bi kêrî dayîna barê deynan were û pêre kaseyên bankeyan dagire. Kurt û kurmancî mekanîzmaya nû dîyar e ne bi kêrî xelkên welatan, lê belê bi kêrî bankevanan tê. Jixwe ev ne wekaleteke hukimranîyê ye ku karibe were betal kirin, ev jidestdayîneke serxwebûnê ye ku peymanê weke "*veger jê nîne û bê şert û merc*" tarîf dike.

Û va ye qonaxeke din pêk tê. Lewma berevajî ya ku hin şexsiyetên ekolojîst îdîa dikin –ev kes MEÎyê dişibînin "sîgortayekê" (6) – dewletek divê siyaseta jixwekêmkirina budceyî ya ku PÎKB pêş dibîne, qebûl bike ji bo ku bikaribe bigihîje alîkarîyan: Her du peyman nabe ku ji hev werin qut kirin. Ji ber vê yekê ev ê bibe xwexapandinek, heke mirov bibêje ez ê yekê ji nû ve muzakere bikim bêyî ku dest bidim ya din. Ya ku serokkomarê nû yê Fransayê François Hollande di dema kampanyaya xwe ya hilbijartinê de soza wê dayî ev bû.

PÎKB li ser welatên peyman mohrkirî ferz dike ku "qaîdeya zêrîn" di destûra xwe de bi cih bikin. Heke Komîsyon –yekane erkdar e di vê mijarê de– "lihevderneketineke strukturel" (7) derêxe holê, dewlet divê mekanîzmayeke sererastkirinê ya jê re "*otomatîk*" tê gotin bixin dewrê, otomatîk ango "*wê nekeve ber biryara parlemanê*". Ango ne hilbijartî, lê belê Konseya Destûrî wê xwedîya hêza kontrolkirinê be, binêre ka budceyên dewletan li gor vê qaîdeya nû ne, yan na. Dema ku dewletek ji çarçoveya berê dîyarkirî derkeve (lihevderneketina budceyî ya bêhtir ji % 3yê Hilberîna Hundir a Nesafî [HHN] û bihurîna deynê dewletê ji % 60ê HHNyê), hingê divê ew bernameyeke reformên strukturel ên mecbûrî pêşnîyazî Komîsyonê û Konseyê bike. Bêyî mirov zehmetîyê bikişîne dikare naveroka wê bîne ber çavên xwe: "reforma" bazara kar, xistina ber lêpirsînê ya mafê teqawidbûnê, kêmkirina mûçeyan, kêmkirina budceyên alîkarîya civakî, yên tenduristî û perwerdeyê, û taybetkirin.

PÎKB yekemîn sedema hebûna parlemanê bêmane dike: Hêza biryardana dahat û lêçûnan. Ew roleke girîng ji parlemanê distîne û dide Komîyona Ewropayê. Ew karê çareserkirina îxtîlafên di navbera dewletan de emanetî DEYEyê dike, tevî ku wezîfeya wê heta îro ferzkirina qanûnên ewropî bû –rolek ku ew wekî din bi kedeke mezin bi dest dixe, dema ku mijar xwedî imtîyazkirina mantiqên lîberal e. (8)

Li gor parêzvanên vê peymanê, DEYE wê "*birêveberîyeke aborî ya hevpar*" bi cih bike. (9) Êdî tu tişt ne şaş e: Armanca mekanîzmayên avakirî ew e ku siyasetên budceyî û aborî asê bike di nav qaîdeyên hişk û otomatîzmên ku tevahîya adaptasyonên li gor rewşa dewletan qedexe dikin. Heke li vir maneyeke peyva "birêvebirinê" hebe, ew jî nikare bi tenê bi pêkanîna sîstematîk a qaîdeyên naguherin were sînordar kirin. Ne jî dikare mikur were li bêberpirsiyarîya ku Komîsyon û Dîwana Edaletê pê xeriqîne. Çawa ku serokkomar François Mitterrand li hemberî serokwezîrê elman Helmut Kohlê ku doza serbixwebûna ECByê dikir, gav paş ve avêtibû, wisa jî Nicolas Sarkozy li hember Merkel li ser mijarên MEÎ û PÎKByê gav paş ve avêt. Lê belê Mitterrand peymana Maastrichtê xistibû referandûmê, serokkomar Hollande bi xwe ev îhtîmal da alî, difikire ku PÎKB wekaleta hukimranîyê nahewîne. Li hemberî vê, di dema kampanyaya xwe ya hilbijartinê de –bi rengekî ku Merkelê pir aciz û nerehet bike– wî soz da ku ew doza ji nû ve muzakerekirina wê bike, sedema wî jî lawazîya wan tedbîrên qanûnî bû ku wê bi kêrî mezinbûna aborî bihatana.

Meliktîya Yekbûyî û Komara Çekê yên ku difikirin bacstendin erka serwerîya neteweyî ye, ev peymana ku vê dewra erkê erê dike, mohr nekirin. Dewletên peyman mohrkirî bi awayekî eşkere dev ji doza erêkirina bi yekdengî ya dewletên endam –ku prensîp e di nav Yekîtîya Ewropayê de– berdan, û wan bi xwe sînorê ji bo ku PÎKB bikeve meriyetê weke duwanzdeh erêkirinan (ji bîstûpêncan) dîyar kir. Hukûmetan nexwest dersan ji referandûmên fransî û hollandî yên sala 2005ê bigirin: Ew careke din hewl didin bi destûrê heman siyaseta aborî û malî ji bo herkesî ferz bikin.

* Nivîskarê *Quelle Europe après le non ? / Piştî 'Nayê Ewropayeke Çawa,* Fayard, Parîs, 2007.

(1) Daxuyanîya çapemenîyê ya 31ê çileya 2012ê.

(2) Dema civîna li raya giştî vekirî ya Henri Emmanuelli li dijî Peymana Destûra Ewropî (PDE) organîze kiribû, 20ê nîsana 2005ê li Parîsê.

(3) Gotara li jêr bixwîne: Bernard Cassen, "Contorsions pour sauver la monnaie unique / Çivdanên ji bo saxhiştina pereyê yekane", *Le Monde diplomatique,* çileyê 2012ê.

(4) Xala 48ê, § 6ê, benda 3yê ya Peymana li ser Yekîtîya Ewropî (beşa yekem a Peymana Lîzbonê).

(5) Peymana mekanîzmaya ewropî ya îstîqrarê saz dike, DOC/12/3, Rojnameya Fermî ya Yekîtîya Ewropî, 1ê sibata 2012ê.

(6) Jean Paul Besset, Daniel Cohn-Bendit, Alain Lipietz û Shahin Vallée, "Mécanisme européen de stabilité: la bourde historique de la gauche /Mekanîzmaya ewropî ya îstîqrarê: Şaşîyeke ehmeqane ya dîrokî ya çepgiran", *Le Monde,* 24ê sibata 2012ê.

(7) Lihevderneketina strukturel li derveyî guhertinên konjukturê lihevderneketina budceyê ye.

(8) Bûyera Viking, bûyera Laval, bûyera Rüffert, bûyera Luxembourgê: Her carê Dîwana Edaletê biryarên xwe li ser xeta mantiqê lîberal, li dijî mafê grevê, yan jî berjewendîyên mûçegiran, dan.

(9) *Le Monde,* 10ê sibata 2012ê.

Wergera ji fransî : Luqman Guldivê

Heşt tedbîrên qanûnî yên sereke

Ji bîstûheft dewletên Yekîtîya Ewropî bîstûpêncan 1ê adara 2012ê peymana li ser îstîqrar, koordînasyon û birêvebirinê (PIKB) di nav Yekîtîya Aborî û Pereyî de mohr kir. Hê yekê ji wan jî ev peyman li parlemanên xwe yên neteweyî erê nekiriye. Ew heşt tedbîrên qanûnî yên sereke dihewîne:

1. Budceyên hukûmetan divê bi tewazun be. Bi tenê ji bo şert û mercên aborî yên îstîsnayî, yan jî di dema sekinîna aborî ya giran de destûra lihevderneketinên budceyê hatiye dayîn. Li gor Komîsyona Ewropayê heke lihevderneketina strukturel (1) % 0.5ê nebihure hingê wê wisa were qebûl kirin ku rêz ji vê qaîdeyê re hatiye girtin. Weke mînak li gor Dadgeha Hesaban sala 2010ê lihevderneketina strukturel a Fransayê % 5ê Hilberîna Hundir a Nesafî (HHN) bû, ango 96.55 mîlyar euro bûn. Ango heke vê rêjeyê daxe % 0.5ê hingê divê 87 mîlyar euroyan ji xwe zêde bike.

2. Dewlet divê vê qaîdeya jê re qaîdeya "zêrîn" tê gotin, bixin nav destûra xwe û çerxeke xweber a sererastkirinê pêk bînin "*ya ku wê ne girêdayî biryardana parlemanter be*". Êdî yên ku wê li gor bûna budceyan kontrol bikin, ne hilbijartîyên neteweyê bin, lê belê Konseya Destrûrî be.

3. Gava deynê dewletê ji % 60ê HHNyê bihurî, hingê dewlet divê zend û bendan vemalin da ku di nav sê salan de bi rîtmeke salê ji bîst paran yekê kêm bike. Di rewşa Fransayê de, ku deynê wê digihîje % 87ê HHNyê, maneya vê yekê ew e ku divê dewleta Fransayê ferqa di navbera %87 û %60ê de salê ji bîstan yekê kêm bike; ango salê %1.35ê HHNyê, ev jî li derveyî tevahîya mezinbûna aborî dike 26 mîlyar.

4. Dema ku lihevderneketina budceya dewletekê ji asta qaîdeyên berê dîyarkirî (%3yê HHNya lihevderneketinê, %60ê HHNya deynan) bibihure, hingê ew divê bernameyeke reformên strukturel ên mecbûrî pêşnîyazî komîsyon û konseyê bike.

5. Dewlet divê projeyên xwe yên neteweyî yên dana deynan pêşnîyazî Komîsyona Ewropayê bikin.

6. Gava ku komîsyon îdîa bike ku dewletek qaîdeyan bin pê dike, mueyideyên pêşnîyazkirî otomatîk in. Heke piranîyeke mutleq a li dijî rabe peyda nebe, dewletên din divê destekê bidin van mueyideyan.

7. Her dewleta ku difikire dewleteke din li gor qaîdeyên vê peymanê tevnegerîyaye dikare gilîyê wê li cem Dîwana Edaletê ya Yekîtîya Ewropî (DEYE) bike. Komîsyon wê dewleta, yan jî dewletên ku wê ji ber gilîkirina dewletên din derkevin pêşberî Dîwana Edaletê, dîyar bike.

8. Ev peyman wê dema ku ji bîstûpênc dewletên peyman mohrkirî duwanzdehan peyman erê kir û herî dereng 1ê çileyê 2013ê bikeve meriyetê.

R.M.J.

(1) Li jêrenota 7ê ya nivîsa têkildar binêre.

www.arsivakurdi.org

Vekişîna amerîkî ya ji Iraq û Afganistanê û ji nû ve dîyarkirina pêşekên stratejîk

NATO fatûreya xwe li Ewropayê dibire

Olivier Zajec *

Endamên Hevgirtina Atlantîkê 20 û 21ê Gulana 2012ê wê li civîna bilind a li bajarê serokê DYAyê Barack Obama, Chicagoyê bicivin. Kêm caran wê ev hevdîtin evqasî bi kelecan bihata prove kirin. Ji bo tiştên berê plannekirî qet cih nehatiye hiştin: Bawerîya mayî ya bi "NATOya nû" girêdayî vê civînê ye, dema şerê sar bi dawî hat, NATOyê bawer kiribû ku veguherîbe cendirmeyeke global, ya ku têra xwe xwedî erk e da ku di xizmeta nirxên rojavayî û aştîya cîhanî de destûrê bide xwe û xwe li seranserê dinyayê wezîfedar bike.

Çerxek e digere, ya tevneke cîhanî ya ewlekarîyê, ya ku ji hevkarîyên bi bêtirsî welatan re hatin bi cih kirin". (1) Bi van gotinan ***Qesra Spî*** bi israr e ku pesnê rêxistineke Peymana Bakurê Atlantîkê (NATO) bide ya ku bi xwe bawer difikire ku ne bi tenê hevgirtineke eskerî ye, belê herweha yeke ewlekarîyê ye, heta di qada birêvebirina sîvîl a krîzan de jî -Yekîtîya Ewropayê di vê qadê de bispor e. (2) Dîsa jî ji semantîka nermkirî ya civînên transatlantîk û wêde, îlûzyona nepixandî û xwenavend a "NATOyeke globalbûyî" xwe bi xwe li çîyayên afgan têk bir. Wisa tê gotin ku **Barack Obama**yê ku bendeyê stratejîyeke çeloxwarî ye, bi tenê encamên "*nation-building*" (3) û yên şerê li dij-serhildanê yê birêveberîya **Bush** bi rê ve birin, ev jî di dezangajmaneke kêm û zêde baş lîstî re pêk anî.

"*Claim Victory and run!*" ("Îdîa bike tu bi ser ketiyî û bireve "): Ev awayê ku hin analîstên amerîkî bîlanço û hesabê operasyona afgan bi kurtî îfade dikin, li ser encamên bidestketî gelek tiştan dibêjin. (4) Hemû di bin şiva du sekreterên giştî yên NATOyê **George Robertson**ê brîtanî û **Anders Fogh Rasmussen**ê danîmarkî, ên ku biqasî hostetîya wan a xîtap û peyvê ji bo rewakirina nebûna stratejîyeke xwe jêhatî ne û ku xwestin rexneyên li xeta fermî bi lêz bifetisînin, ji bo bipêşxistina berjewendîyên parzemîna ewropî bikêrhatî nebûn. Bi wî awayî ku ji dema jihevdeketina URSSyê ve ev avahîya mezin a sala 1949ê damezrandî evqasî nehatibû lawaz kirin.

Ji danezanên civîna bilind a Lîzbonê a sala 2010ê ya li ser "ewlekarîya kooperatîf" ya ku bi kelecan endametîya "rojavayîyên dûr" yên weke ***Zellandaya Nû*** yan jî ***Japonyayê*** jî kiribû rojev û vir ve, her diçe bêhtir dewletên endam bi poşmanî hewl didin da ku NATO li rewşa xwe ya berê vegere, weke berê tevbigere û bi tenê di çarçoveya wezîfeya xwe ya destpêkê, ango parastina kolektîf a ewropî de dest werde, ango li gor mentiqekî cografîk û êdî ne îdeolojîk (weke parastina "nirxên hevpar"). Di paşxana doktrînal de gelek endamên NATOyê dixwazin kevana berjewendîyan (erd, nufûs, cîranîya nêzîk) bi giştî şûna "kevana krîzan" bigire, fikra kevana krîzan zelûl û nedîyar e, dikare ber bi her deverî ve bê kişandin.

Budceya Pentagonê, hilbijartin û piştî 13 salan derfetên yekem civîna NATOyê li DYAyê

Mijara girîng a li Chicagoyê krîza etîk e û zexta hilbijartinên serokatîyê li DYAyê jî wê li vê zêde bibe. Ev civîna bilind ji sêzdeh salan û vir ve ya yekem e ku li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê pêk tê. Bi awayekî mentiqî birêveberîya **Obama** hez dike lê danezanên biryardar û avaker bike û van danezanan weke pêşketinên berbiçav nîşan bide, pê di heman demê de rexneyên dijberên xwe yên komarparêz bêtesîr bike. Ji bo koma namzedê demokrat a herî hêsan ew e ku nîşan bide ku NATOya piştî Afganistanê di warê stratejîk de, belê berîya her tiştî di yê pîşesazî û teknolojîk de *(argumaneke girîng e lewra di nav deh salên bên de dibe ku kêmkirina ji budceya Pentagonê bigihêje 400 mîlyar dolaran)* "karekî bikêrhatî" ye ji bo Washingtonê. Perspektîva vê jidestdanê *(dîsa jî hertişt li ber 600 mîlyar dolar budceya bergirîya amerîkî nisbî ye)* dibe sedem ku hilbijartîyên ku li herêmên wan ên hilbijartinê fabrîkeyên ***Boeing, Lockheed Martin, General Dynamics***, yan jî ***Raytheon*** hene, mertalên xwe hildin. Di bin zexta hilbijartinan de şêwirmendên Qesra Spî dê teqez hewl bidin civîna bilind a Chicagoyê veguherînin hola gurçûpêçkirina bi çekan a amerîkî.

Ji salên 1960ê ve, hîletê hîyerarşîya Pentagonê ji kêmbûna budceyên bergirîyê yên ewropî diçe. Lê belê moralê xirab ê dayendeyê sereke yê budceya NATOyê van demên dawîyê hê bêhtir xirabû. Pir nîşan ji hevgiran re hatin şandin da ku derbarê ekîpmanan de bi rastî hewl bidin, bi awayekî ku "rêwîyên qaçax" ên bergirîya kollektîf *(piranîya wan bêpar in ji pîşesazîyeke bergirîyê ya neteweyî)* gij bikin da ku malzemeyên bikêrhatî ji Dewletên Yekbûyî dabîn bikin. Sala 2002yê civîna bilind a "jinûveavaker" ya Pragê hê hingê hewl dabû *"angajmanên der barê kapasîteyê de"* dîyar bike: Her welat, her yekî di beşeke dîyar de *(balefirên bêpîlot, satelît, navgînên îkmalê, ragihandin...)* soza birêvebirina terîfê dida û *in fine* [di dawîyê de] ya kirîna hevpar a ekîpmanên ku ji bo bihevrexebitîn û bikêrhatîbûna herkesî pêwîst in.

"Kê pê li pişkokê kir?"

Ev hewes li ser qaxezê ma, çawa ku şerê li Lîbyayê ev yek eşkere nîşan da: Ji bilî fransîyan, ên ku hê jî xwedî hêzeke hewayî û deryayî ya serbixwe ye û hinekî kêmtir jî be brîtanîyan, tu welatê ewropî ku hinekî ji peravên Parzemîna Pîr dûr be, nikare ya ku balefirên Rafale roja 19ê adara 2011ê bire serî, bi ser bixe: Weke "kesê pêşî" xweser derketina ser dika operasyonekê. Lê dîsa jî keştîyên îkmalê, îstîxbarat, navendên fermandarîyê û kontrolê yên amerîkî destek dan operasyonên Lîbyayê bi xwe.

Di vî karî de amerîkî bi biryardarî li paş man ("*leading from behind"*) û bi vê dixwestin peyamekê bidin: Dibe ku Washington sibe kêmtir bi karê Hevgirtinê (yanî NATOyê) bibe. Belgeya Hizirîna Stratejîk *(Defense Strategic Review, DSR)* ya çileyê 2012ê tam dike ku mirov bi vê bihise. **Barack Obama** bi xwe ev belge pêşkêş kir. Di belgeyê de behsa jinûve bicihbûna li Asya-Pasîfîkê tê kirin û belge eşkere dide zanîn ku wezîfeya dîrokî ya NATOyê êdî li Ewropayê "pêk hatiye". (5) Kevne wezîrê bergirîyê yê amerîkî **Robert Gates** ev DSR dabû dest pê kirin. Wî hezîrana 2011ê di erefa teqawidbûna xwe de herweha bi biryardarî bi peyvên pir hişk pêşnîyazî ewropîyan kir ku bêhtir berbiçav para xwe li bergirîya kollektîf a parzemînê zêde bikin.

Amerîkî dixwazin têkçûna xwe wek krîza angajmana ewropî nîşan bidin

Bi vî awayî tevî ku ev deh salên derbasbûyî têkçûneke etîk û stratejîk a lîdertîya amerîkî nîşan didin jî, ku krîza NATOyê encama wê ye..., DSR û Gates vê krîza NATOyê vediguherînin krîza angajmana ewropî. Ji bo ku sêwî nemînin bang li ewrôpîyan hat kirin ku gelek ji wan pereyan li fînansmana jêhatîbûna destek û fermandarîyê razînin, ku di bin koordînasyona teknîk û operasyonel a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de ye. Ev bingeha têgeha *smart defense* e ku sibata 2011ê **Rasmussen** weke awayê herî baş ê li hemberî krîza aborî pêşnîyaz kir, lewma ev krîz çavkanîyên welatên endam dixe bin bar û erkên giran de. Naveroka wê weha ye, mirov wê giranîya xwe bide ser jêhatîbûnên eskerî yên herî zêde avaker û wan bi hev re fînanse bike, lê belê her weha israr bike ku welatên hê xwedî bingeheke pîşesazî û teknolojîk a bergirîyê ne, xwe li gor şaneyan [qadan] bispor bikin da ku du welat nebin bisporên heman qadê. Ev proje gelek tehlûkeyan dihewîne. Tehlûkeya sereke ji bo welatekî mîna Fransayê wê bibe; her diçe bêhtir jidestdana xweserîya pêşesazî û stratejîk, a ku heta îro bi zehmetî parastiye. Beramberhevkirina bar û erkan dikare bibe çareserîyek. Lê belê mentiqê "şaneya" teknolojîk di dawîyê de dibe sedema "vegera li şaneya" siyasî. Nexasim *smart defense* pir kêm serê xwe bi koordînasyoneke bi navgînên Yekîtîya Ewropayê diêşîne û di maneya xebata bi hev re, herweha standart û pîvanan de yek gotina bi tenê jî nake der barê jêhatîbûneke bi rastî parvekirî ya di navbera ewropî û amerîkîyan de da ku "berê xwe bidin paşerojê".

Amerîka dixwaze teknolojî û kontrol di destê wê de be

Dema ku mijar pêkanîn e, bi xwe senaryo tê zanîn. Pêşî, li gor wê, ya herî baş a teknolojîya amerîkî wê were parastin ji bo bikaranîna bi tevahî neteweyî, ev jî wê bi danîna bendeke li dijî îxrackirina teknolojîyên hesas were kirin. Paşê pîşesazên amerîkî wê makîneyeke şer a ji bo îxrackirinê ya ne ewqasî zêde bipêşketî xurt bikin, dema vê dikin jî wê xwe bispêrin hilberînên bi serî yên pir mezin, ev yek jî destûrê dide buhayên [erzan] –di teorîyê de– ên bi kêrî reqabetê tên. Ji bo ku tablo temam bibe em bibêjin, hê berîya kirîna ekîpmanê bi xwe, bipêşxistina bernameyê wê bi herikandina budceyên lêkolîn û teknolojîyê (L&T) ya hevgirên ewropî were fînans kirin, yên ku wê paşerojê her diçe bêhtir nikaribin sîstemên neteweyî bi awayê serbixwe bisêwirînin. Parastina dijfuzeyan a balîstîk yek ji wan qadan pêk tîne ku xweserîya siyasî û jêhatîbûna teknolojîk di nav hev de dihelin –ev ê bibe yek ji mijarên li pêş ên navenda kirînê ya ku ji bo du rojan li peravên gola ***Mishigan***ê hatiye bi cih kirin. Li wir jî "lîsteya malzemeyên divê werin kirîn" weke mohrekê li pişta stratejîya şaneyê xuya dike.

Ya rastî hatiye pêş dîtin ku welatên endam ên Hevgirtinê sûdê ji civîna li Chicagoyê bigirin da ku bi awayekî pir fermî "*jêhatîbûneke navîn a parastina dij*-fuzeyan" *(interim operational capability)* a hevpar bidin zanîn, heta 2018ê jî li benda pêkhatina jêhatîbûneke bêkêmasî bimînin. Ji bo vê jî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi desteke welatên rojhilatê Ewropayê û tevî muxalefeta pircarî îfadekirî a Moskovê, wê pêşnîyazî hevkarên xwe bike ku li ser terîfa hevpar a tehlûkeyê, wezîfeyan û navgînan li hev bikin. Li navenda vê pêvajoya erêkirinê çi heye: Doktrîna plankirin û qaîdeyên angajmana sîstemê *("kî ekrana hewarê kontrol dike?"; "kî pê li pişkojê dike?")*. Ji gelek salan û vir ve di warê bergirîya dij-fuzeyan de Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li ser NATOyê helwêsta xwe û teqwîma xwe ferz dike. (6)

Sala 2007ê jî ya qewîmî ev bû, bi pêşnîyaza yekalî ya birêveberîya **Bush** a ji bo vekirina "baregeheke sêyem" a [fuzeyên] pêşîgir ên sîstema dij-fuzeyan (7) li Lehistan û Komara Çekê, piştre sala 2009ê jinûve bicihkirina bi destê birêveberîya Obama. Serokê nû "helwêsteke li qonaxan dabeşkirî a li gor Ewropayê" *(European Phased Adaptive Approach* – EPAA*)* pêk anî.

Siyasîyên ciwan yên ewropî dikarin pişta xwe bidin Amerîkayê

Ev helwêst xwe dispêre fuzeyên pêşîgir ên di ser atmosferê re yên di keştîyên şer ***Aegis*** de hatine bi cih kirin û hêzdarkirina jêhatîbûneke fermandarîyê û kontrolê ya di bin berpirsiyarîya navenda ***Ramsteinê*** (Almanya) de, ku wê navendê jî amerîkî kontrol dikin. Wezîrên bergirîyê yên ewropî hezîrana 2007ê û çirîya pêşî ya 2009ê de qebûl kirin ku mîmarîya bergirîya dij-fuze ya NATOyê bi awayekî belav wê li gor pêşnîyazên were ava kirin. Ji hingê, di dema kurt de li gor ajandayekê ku di wê bi xwe de jî zelalî û vîzyon kêm e, tevahîya endamên Hevgirtinê xwe amade dikin bisporîyeke li gor şaneyan [qadan] qebûl bikin, ku ji serî heta binî Washington şewazê wê dîyar dike ***("pêvajo 1, sala 2015ê", "2, sala 2018ê"*** *û* ***"3, sala 2020ê").*** Di dawîyê de heke pêşnîyazeke cuda nebe ya ku li gor wê ewropî jî wê di astên "bilind" ên mîmarîyê de bi dilxwazî werin bi cih kirin, ev rewş rasterast ber bi kirîna yekser a sîstemên amerîkî ve dibe, bi ser de jî hêza biryar û kontrolê ya li ser tevahîya mertal jî wê nebe.

Bipêşketina siyasetên bergirîyê di paşerojê de –yên hêzên didin der yên mîna Çîn, Brezîlya û Hindistanê jî– xwe dispêre xwedîhêzbûna li qada fezayî, û "reda gihiştina" qadên cîhanê yên çûnûhatinê û pevguherînê *(rotayên deryayî, hewayî, fezayî, tevnên ferazî yên Înternetê),* û derfetên agahdarî û ragihandinê. Ev qadên bawerîyê û bandorê, yên hêdî lê bivênevê pêk tên, rave dikin ka çima *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê* hê di serî de spartî budceyên ewropî yên NATOyê dixwaze ji bo wan rola xwe ya navendî biparêze, ev rola navendî ya weke xwedîya fonksîyonên "bilind" (hêza hewayî, bergirîya dij-fuzeyan) e ku yên din hemû (yên "şaneyan") wê girêdayî wê bin. Piştî hisîyana bi van hesab û pirsên dêwane, dibe ku biryardana teknolojî û veberhênanên ewropî yên paşerojê ne weke temamker, belê weke hizirîna siyaseteke derfetên xweserîya stratejîk li pêş digirin, girîng xuya bike.

Smart defence xwe weke bergirîyeke "biaqil" dibîne. Delegeyên ewropî yên li ***Chicago***yê dikarin vê yekê îsbat bikin, ji bo vê jî dikarin bi jinûve muzakerekirina şertên yekalî yên pevguherînê yên ku di warê materyalan de Hevgirtinê bi gewde dikin û di warê çandî de jî ji hev dixin, dest pê bikin. Heke vê bi ser nexin, bi gotinên xîtabeta taybet a ***Gates,*** di paşerojê de, yên ku wê werin manîpule kirin, dikarin li hevalê xwe yê amerîkî biqulibin, berpirsîyarên ciwan ên siyasî yên ewropî ne.

***** Doçentê dîrokê, wezîfedarê lêkolînê li Înstîtuya Stratejî û Pirsgirêkan (ISC). Nivîskarê *La Nouvelle Impuissance américaine / Lawazîya nû ya amerîkî,* L'Œuvre, Parîs, 2011.

(1) Belgeya analîzê: "Les Etats-Unis vont accueillir le sommet de l'OTAN à Chicago / *Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wê li Chicagoyê mêvandarîya civîna bilind a NATOyê bike",* Qesra Spî, Buroya Sekreterîya Çapemenîyê, 21ê adara 2012ê.

(2) Fikra birêvebirina sîvîl a krîzan (BSK) bi awayekî ji rêûresmê di siyaseta ewropî ya ewlekarî û bergirîyê (SEEB) de xwedîyê grîngîyeke mezin e. NATOya ku sûdên vê nêzîkatîyê dîtin, meyildar e were ser vê qadê da ku qada xwe ya çalakîya siyasî-ewlekarîyê fireh bike.

(3) Desttêwerdanên ku armanca wan avakirin yan jî xurtkirina sazîyên desthilatdarîyê û çarçoveya aborî ya welatekî petixî. "Reconstructions nationales / Jinûveavakirina neteweyî", dosyeya *Le Monde diplomatique*ê, kanûna 2003yê.

(4) Gene Healy, "With Bin Laden gone, declare victory and come home / *Piştî ku Bin Ladin çû, niha serketina xwe bide zanîn û vegere malê", The Examiner*, Washington, 2yê gulana 2011ê.

(5) Michael Klare, "Quand le Pentagone met la cap sur le Pacifique / *Dema ku Pentagon berê rotaya xwe dide Pasîfîkê*", *Le Monde diplomatique*, adara 2012yê.

(6) "Subtile partie d'échecs entre Moscou et Washington / *Lîstika kişikê a zehmet a di navbera Moskov û Washingtonê de", Le Monde diplomatique*, nîsana 2008ê.

(7) Herdu baregehên din li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ne. Tercîha birêveberîya Bush a vê peyva "baregeha sêyem" îşaret pê dikir ku bicihkirin berîya hertiştî weke hemanekî cewherî yê amûra amerîkî ya bergirîya parzemînî hatiye sêwirandin: Bergirîyeke dij-fuzeyan a li Ewropayê, lê belê ne ileh ewropî.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurdi.org

Reqabeta sazîyan a di zêdebûnê de

Siberoja hilbijartinan tahl e

David Nowell-Smith *

David Cameron soz dabû ku ji bo vekişîna dewletê tenzîm bike, wî dê bi navê «Big Society» derketina civateke dilxwazan biparasta. Brîtanî pê ne bawer in. Li gor rojnameya heftane «The Economist», ew vê projeyê weke «nixumandina teserufên di budceyê de» dihesibînin. Jixwe budce bi awayekî giran daketibû, bi taybetî budceya zanîngehan.

Piranîya xwendekarên brîtanî Noelê bi malbatên xwe re derbas dikin, lê belê Julian Howard ligel pênc hevalbendên xwe, odeyeke Zanîngeha Kentê dagir kir da ku nerazîbûna xwe li hember reforma fînansmana perwerdeya bilind nîşan bidin. Ji vebûna zanîngehan a 2012ê û pê ve, ev reform wê rê bide zanîngehan, bihayekî ku ji yê îro sê qatan bilindtir, heta bi qasî 9 000 sterlînan -10 700 euro (1)- xerca qeydkirinê ji xwendekaran bixwazin. Piştî perwerdeyeke sê salî, wisa dibe ku xwendekarên ne xwedî burs dê bi qasî 40 000 sterlînan (47 600 euro) -xercên debare û îqametê jî di nav dedeyndar bibin û ew ê piştî ku dest bi karekî bikin vî deynî bidin.

«Ji bîst û heft rojên dagirkirinê, çardeh rojan tu girêdanên me bi cîhana derve re tunebûn, Julian vedibêje. *Xwendekarên din pişta me girt, her wekî piranîya mamosteyan. Ew ketin dorê da ku ji bo me paketên xwurekan di pencereyan re derbas bikin, kincên nû û alavên serşûştinê ji me re bînin».* Mezinahîya tevgerê nepayî bû. Siftê hatibû gotin ku xwepêşandana pêşî, ya ku Sendîkaya Neteweyî ya Xwendekaran (NUS) roja 10-10-2010ê li dar xist, dê 20 000 kesan bicivîne; lê hejmareke du qatan mezintir hat meydanê.

Hin xwendekaran sozên berbijêrê lîberal-demokrat, Nicholas Clegg, ên di dema kampanyaya ji bo hilbijartinên giştî yên gulana 2010ê de ji bîr nekiribûn. Soza wî ya ku ew ê *«li dijî her zêdebûneke mesrefên qeydkirina li zanîngehê, raya xwe bi kar bîne»* (2) dengekî mezin vedabû -her weke nerazîbûna wî ya li hemberî *«sozên bi cih neanî»* ya hikûmetên berê. (3) Şeş mehan paşê, Clegg bûye alîkarê serokwezîrê koalîsyona muhafezekar û lîberal-demokrat a ku di gulana 2010ê de bû desthilat û ew vê pêşniyaza reformê weke *«bi edalet û pêşverû»* (4) dinirxîne.

Ji bo demeke dirêj, Keyatîya Yekgirtî perwerdeyeke bilind a belaş li gel pergaleke bûrsên xwendinê diparast. Di navbera 1980 û 2003ê de, rêjeya xwendina li zanîngehê duqat bû û gihîşt % 37ê serjimara mirovên temenê wan di navbera 18 û 23 salan de. Lê belê, pereyê ku ji bo zanîngehan tê veqetandin, li gor vê yekê zêde nebû. Lewre jî, ji dawîya salên 90ê ve, ev model bû sedema rexneyên cur bi cur.

Di 1997ê de, ev êrîş şiklê «lêkolîneke li ser fînansmana zanîngehê» digire, ku **John Major**ê serokwezîrê muhafezekar biryar da ku bi **Ronald Dearing**ê sazkarê ferdîkirina pîşesazîyên hewa-fezayî û înşayên deryayî yên brîtanî bide nivîsandin. Lewre jî, bi tu kesî ecêb nehat ku rapora wî pêşniyaza temamkirina fonên giştî bi danîna xercên perwerdeyê yên neguherbar kir, ku dê piştî bidawîhatina xwendinê bên dayîn û bi qasî % 25ê bihayê nîvekî yê xwendina bilind (bi salekê 1 000 sterlînan) bibe.

Salekê piştre, Partîya Karkeran li Downing Streetê hejmara 10ê [navenda serokwezîrtîya îngilîzî] tên hilbijartin û bi têra xwe coş dide ser şopên yên berîya xwe. Ew çend tiştên din li ser pêşniyazên rapora **Dearing** zêde dikin: Yek, ew tercîha peredayîna li dawîya her saleke zanîngehê dikin -ev jî xwendekaran mecbûr dike berîya debara xwe bikin, xwendina xwe fînanse bikin- didu, ew kredîyên xwendekaran ên ku li gorî hatina maddî tên hesabkirin, dikin şûna pergala bûrsên bixweber a berê. Di 2004ê de, ew gavekê bi paş ve diavêjin; ew bûrsên ji bo xwendekarên herî xîzan dîsa jî bi cih dikin û dana deynî ji nû ve li dawîya xwendinê tînin, lê Partîya Karkeran di heman demê de destûrê dide zanîngehan ku li ser mîqdara xercên qeydkirinê bi xwe biryarê bidin - di bin sînorê 3 000 sterlînan de.

Di çirîya pêşîn a 2009ê de, di çarçoveya kêmbûna tevahîya mesrefên giştî de, **Lord Peter Mandelson**, wezîrê şîrket, nûkirin û pewerdehîyê yê hikûmeta Partîya Karkeran ji **Lord John Browne of Mandingley** (kevneserokê fîrmaya BPê, ku hingê weke *British Petroleum* naskirî bû) dixwaze ku siyaseta perwerdekarîyê ji nû ve di ber çavan re derbas bike. Partîya Karkeran jî projeyeke belgeyê li dû xwe dihêlin, ku hikûmeta serokwezîrê muhafezekar **David Cameron** ê bi hêsanî, di çarçoveya kampanyaya xwe ya kêmkirina (pir mezin a) mesrefên giştî de hilgire.

Rapora Browne -bi navê «Misogerîya siberojeke mayînde ji bo perwedehîya bilind» -pêşniyaz dike ku zanîngeh bixwe di navbera 6 000 - 9 000 sterlînan de biryara mîqdara xercên qeydkirinê bidin. Brown soz dide ku ev azadî wê reqabetê teşwîq bike û asta giştî ya perwerdeyê bilind bike. Bi tarîfeyên qanûna 2004ê, vegerandina pereyî wê hîn bi pey mezûniyetê re û di bin şert û mercên hatinîyê de pêk bê. Lê belê, sînorê vegerandinê zêde dibe; salê ji 15 000an derdikeve 21 000an.

Helbet, faîz wê ji bo kesên hatinîya wan salê ji 21 000 sterlînan kêmtir e, li gor rêjeya enflasyonê bên hesab kirin û ew ê ji bo kesên hatinîya wan salê ji 41 000 sterlînan zêdetir e jî, bi %3 di ser asta înflasyonê re bên zêde kirin. Rast e, deynên ku bi pey 30 salan re nehatine dayîn wê betal bibin. Lê belê, **Laura Kilbride** ya li Cambridgeyê doktoraya xwe dike û tevlî dagirkirina kampusê bû, van pêşniyazan weke *«perdeyeke dûmanê ji bo nermkirina prîvatkirinê»* dinirxîne. Em derbasî çaxekî nû bûne: Heta niha, zanîngehên brîtanî bi fînansên giştî ve girêdayî bûn û fonên taybetî (bi riya xercên qeydkirinê) ev temam dikirin; ji niha û pê ve, ev bi pergaleke taybetî dixebitin, ku para subvansîyonên dewletê tê de hindik e û bi tenê dirûvê kredîyên xwendekaran digire.

Em ketin serdema **(**KÊM E-lewendi**).** Heta 2009ê jî, aborînas û qunciknivîs David Banflower, der barê zanîngeheke taybetî ya pir buha de, weha digot: *«Dema ku bihayê perwerdeyê wisa bilind e, xwendekar xwendina xwe nîvco nahêlin, ew ji bo hemû dersan amade ne û hişê xwe didin ser».* Di bin van şert û mercan de, *«kengî ji xwe re bihayê seeteke dersê hesab dikin,* [ew] *serê sibehê zû ji nav nivînan radibin».* (5) Rapora Browne veguherandin ser pêşnimaya zagonê û ew ê 9ê kanûnê bikeve dengdanê.

Kilbride nerazîbûna xwe weha derdibire: *«Modeleke perwerdeyê ya bi vî rengî, pêwîstîya xelkê ya meraqkirina cîhanê û hişmendîyeke rexnegir ji xwe re saz bikin, bi temamî pişt guh dixe».* Dibe ku xwendekar zûtir rabin jî, lê ihtimal e ku ew ê dev ji xwendina ne berhemdar berdin: Felsefî, mirovnasî, dîroknasîya serdema navîn an jî xwendina elîzabetî [ji serdema keybanû Elîzabeth, a ku di navbera 1558 û 1603ê de li Meliktîya Yekgirtî hikûmdar bû]. Lord Browne wê gazinan ji vê yekê neke. Li gor wî, reqabeta di navbera zanîngehan de û zêdebûna xercên qeydê wê rola insûrên berpirsyarîkirinê bileyîzin. Bi xêra wê, perwerde dê wekî veberanîneke şexsî bê hesibandin û zanîngeh wê teşwîq bibin ku *«qabiliyetên xwe adapteyî pêwîstîyên aborîyê bikin».* (6) Ew li ser vê mijarê ... bi Partîya Karkeran re hevfikir e.

«Çarçoveya bêqisûrîya lêkolînê» (Research Excellence Framework, REF), ku Partîya Karkeran bixwe ew sêwirandibû, îroj di destê koalîsyona desthilatdar de ye. Ew îlan dike ku % 25ê subvansîyonên lêkolînê ku ji bo laboratuar an beşên lêkolînê tên veqetandin, wê li gor pîvanên *«bandordarîyê»* biguherin. Bi gotineke din, *«qezencên dikarin bên jimartin, yên ku aborî û civak wê ji wan werbigirin».* (7) Vê tertîbatê li nav lêkolîneran pêleke nerazîbûnê rakir. *«Programasyona komputerî xwe dispêre ilmê mantiqê, ku Gottlob Frege sedsala 19ê bingehên wê danîbû, lê ew wê demê li sazkirina komputeran nedifikirî, 'qaîdeyên giştî yên rastîyê' di serê wî de bûn»*, Komeleya Brîtanî ya Felsefeyê (BPA) di nameyeke 22ê tîrmeha 2010ê de ji David Willetts ê wezîrê zanîngehan re şandî, wisa bi bîr dixist. Paradoks jî ev e, eger bera lêkolînê bi berhemdarîya yekser bê dayîn, dibe ku zirarê li aborîyê jî bike. Xem nake: Çarçoveya bêqisûrîya lêkolînê dê sala bê derbas bibe.

Fikira ku divê perwerdeya bilind ji pêwîstîyên yekser ên aborîyê re bibe bersiv, giranî dayîna ser hin mijarên «sereke» jî rewa dike: Matematîk, zanyarî, muhendîsî. Berî ku pêşniyazên wê yên ji bo perwerdeya bilind biweşin jî, hikûmeta Cameron, di çarçoveya plana xwe ya teserifa zêde de, % 40ê kêmkirina budceya zanîngehan îlan kir. Willetts jî qebûl kir ku fonên mayî wê bi tenê ji bo perwerdekarîya zanyarîyan bi kar bên. Li gor Alan Finlayson ê mamosteyê Zanîngeha Swanseayê, reforma behsa wê tê kirin ji bo alîkarîya bazarê ya bersivdayîna pêwîstîyên şîrketan tê meşandin: *«Lê belê, reform hevsengîya bazara ku ew dixwaze biparêze xira dike, ji ber ku ew beşên edebiyat û zanyarîyên mirovî ji finansmanên giştî bê par dihêle. Di heman demê de, di serî de yên ku ji bo têgihîştina tevahî ya rewşa me ya civakî, aborî û siyasî herî girîng in, ew tevahîya alîyên zanînê dirûxîne.»,* (8) an jî, ji bo têgihîştina bandora siyasetên hevkarîya desthilatdar.

Halî hazir meraqên sereke li alîyê pratîkê ne. Xirakirina bihayan, dibe ku reqabeta zanîngehan, asta perwerdeyê nizm bike. Ev nemaze ji bo sazîyên kêm bi prestîj rast e, ji ber ku ew ê nikaribin ji her xwendekareke/î xwe 7 200 sterlînan -ku ew ê bi vê mîqdarê tenê xwedîyên heman fonên niha bibin- bixwazin. Dibe ku hin sazî, di demeke nêzîk de têk biçin, an jî ji mecbûrî berê xwe bidin sektora taybetî, ku wê personelên kêmtir jêhatî bi meaşên erzan ji wan re peyda bikin.

Wekî din, rîsk heye ku hin zanîngeh li hemberî zexta «xwendekarên mişterî» ji standartên xwe dakevin û dîplomayên erzanfirotî li wan belav bikin. Ji ber ku ew di navbera asta perwerdeyê û dîplomayê de ferqekê diyar nake, pêşketineke bi vî rengî jî, dê enflasyoneke bazara dîplomayên zanîngehan bi xwe re bîne û ji ciwanên derdorên ne dewlemend re destpêkirina zanîngehê hîn zehmettir bike.

Lord Browne dixwaze raya giştî aş bike: *«Zêdebûna xercên perwerdeyê ya sêzdeh salên dawîn rê neda kêmbûna daxwazên qeydkirinê».* Wekî din, wî pêşbînî kir ku zanîngehên bihayekî têketinê yê pêşîyê ji 6 000 sterlînan zêdetir bixwazin, dê bi pereyê xwe, sala duyemîn, xwendekarên herî xizan finanse bikin. Ev pêşniyaz bi mirov sosret tê: Gelo zanîngeh wê bi rastî demeke dirêj di navbera xwendekareke/î feqîr, ku ew ê mecbûr bibe nîvê xwendina wê/wî finanse bike û yeke/î din ku dikare bixwe meserefên xwe hemûyan bide, dudil bin? Clegg ji pergala heyî ya *«zanîngehên weke amûrên cudakarîya civakî»* (9) nerazîbûna xwe derdibire, soza bicihanîna kontroleke dijwar daye. Lê belê, sê mufetîş û sed û sih zanîngehên Meliktîya Yekgirtî hene... Hin kes kêfa xwe tînin ji ber ku hikûmeta brîtanî dixwaze ji krîzeke fînansî -ya bi mezinbûna nekontrolkirî ya deynên ferdî ve girêdayî ye-, derkeve, lê ew reforma xwe ya fînansmana zanîngehan disipêre ... heman deynên ferdî. Ev deyn wê hîn mezintir bibe, lewre koma bisporên serbixwe ya ***Higher Education Policy Institute*** (HEPI) pêşbînîyê dike, eger fiyet neyên kontrol kirin, piranîya sazîyan dê li derdora 9 000 sterlînan ji xwendekaran bixwazin û kêm caran wê doza hindiktir pereyî bikin. (10) Jixwe, xerceke mezin wê li ber çavên xwendekarên ku dikarin zanîngeha xwe tercîh bikin, bibe hevwateya prestîjê jî. Berevajî vê yekê, dê guman ji kalîteya perwerdeya zanîngehên «erzan» were kirin.

Li gor lêkolînerên HEPIyê, hikûmetê hatinîya siberojê ya mezûnan jî zêde hesibandîye. Encam jî ev e ku dê pereyê % 50ê kredîyan neyê vegerandin û dewlet wê deynên wan bigire ser milê xwe. Lêkolîner hikûmetê hişyar dikin ku di dawîyê de, li gel biryarên nû, *«dewlet wê ji pereyê ku distîne bêhtir, pereyan bide»*, ji ber ku ew ê weke niha, mesrefa perwerdeyê di cih de nede, lê ew ê bihayê bazarê subvansîyon bike. (11) Hemû ji ber sedemên berdarîyê.

Li gor encamên desteya budceyê ya brîtanî *(Office of Budgetary Responsability)*, mîqdarên ku dewlet ji bo kredîyên xwendekaran vediqetîne wê di navbera 2010 û 2011ê de, ji 4,1 mîlyar sterlînan bigihîje 10,7 mîlyarên di navbera 2015 û 2016ê de. Bi gotina profesor Richard Drayton ê King's College ya Londonê, hikûmet pêre rûbirû ye ku vî deynî bifiroşe veberhênerên ferdî. Ew ê jî bibe *«diyarîyeke mezin a ji bo sektora finansê, ku wê dirûvê deynên bi misogerîya dewletê bigire –ji ber ku jî bê rîsk in- û wê rê bide herikeke bi rêkûpêk a qezencên bi dana fayizên bi rêjeyên qezencker ve girêdayî».* (12) Bi vî rengî, dê prîvatkirina zanîngehan pir biha bibe.

* Mamosteyê Zanîngeha Paris 7.

(1) Sterlînek bi 1,19 euroyan e.

(2) Judy Friedberg, « Crib sheet email » [«E-peyamên kaxiza kopyayê»], *The Guardian*, London, 12 cotmeh 2010.

(3) Binihêre: Vîdeoya kampanyayê ya li ser malpera me: www.mondediplomatique.fr/20190

(4) «Nick Clegg under fire in Commons over tuition fee rise » [«Nick Clegg li Meclîsê dibe hedefa rexneyên li ser zêdebûna xercên qeydkirinê»], BBC News, 10 mijdar 2010, www.bbc.co.uk

(5) Sernavê gotarê, *The Observer*, Londra, 27 kanûn 2009.

(6) Lord Browne û yên din, «Securing a Sustainable Future for Higher Education» [«Misogerkirina siberojeke mayînde ji bo perwerdeyê»], Londra, 12 cotmeh 2010.

(7) «Second consultation on the assessment and funding of research» [«Şêwirmendîya duyemîn a li ser nirxandin û fînansmana lêkolînê»], Higher education founding council for England [Desteya fînansmana perwerdeya bilind a Ingîltereyê, London, îlon 2009.

(8) «Britain, greet the age of privatised Higher Education» [«Brîtanya, wê pêşwazîya serdema perwerdeya bilind a taybet bike»], *Open Democracy*, Londra, 9 kanûn 2010.

(9) Jeevan Vasagar, «Universities must widen access, Clegg will warn» [«Clegg wê zanîngehan hişyar bike, divê ew bêhtir derîyên xwe ji xwendekaran re vekin»], *The Guardian*, 8 sibat 2011.

(10) Lord Browne û yên din, *berhema navbihurî.*

(11) «HEPI publishes analysis of Government concessions on HE funding and student finance » [«HEPI analîza xwe ya gavên ku hikûmetê li ser fînansmana perwerdeya bilind û finansên xwendekaran bi paş ve avêtin, diweşîne], 14 kanûn 2010, www.hepi.ac.uk

(12) Hevpeyvîna nivîskêr

Wergera ji fransî: Simko Destan

www.kurdipedia.org

Cotmeh 1986

Ji Mem û Zîn a Ehmedê Xanî *

Dubendên jêrîn ji Mem û Zîn a helbestvanê herî mezin ê serdema klasîk ya Ehmedê Xanî hatine girtin. Ev helbest bi qasî 2500 dubendan dirêj, doznameyek e ji bo rizgarkirina gelê kurd û yekkirina bi dehan mîrekên ku di bin nîrê împaratorîyên ecem û osmanî de bûn…

EHMEDÉ XANÎ
(1650-1706)

Lew pêk ve hemîşe bêtifaq in
Da‘im bi temerrud û siqaq in
Ez mame di hikmeta Xwidê da
Kirmanc di dewleta dinê da

Aya bi çi wechî mane mehrûm
Bil-cumle ji bo çi bûne mehkûm

Bif‘kir ji ‘ereb heta ve gurcan
Kirmancî ye bûye şubhê burcan

Ev rûm û ‘ecem bi wan hisar in
Kirmanc hemî li çar kinar in

Herdu terefan qebîlê kirmanc
Bo tîrê qeda kirîne amanc

Goya ko li serhedan kilîd in
Her ta’ife seddek in şedîd in

Ev qulzimê rûm û behrê tacîk
Hindî ko bikin xurûc û tehrîk

Kirmanc dibin bi xwîn mulettex
Wan jêk ve dikin misalê berzex

Cwamêrî û himmet û sexawet
Mêrînî û xîret û celadet

Ew xetm e ji bo qebîlê ekrad
Wan dane bi şîr û himmetê dad

Hindî ji seca‘etê xeyûr in
Ewçend ji minnetê nefûr in

Ev xîret û ev ‘uluwê himmet
Bû mani‘ê hemlê barê minnet

Lew pêk ve hemîşe bêtifaq in
Da‘im bi temerrud û siqaq in

* Fransîya bendên li jor ji berhema Joyce Blau (Bîranîna Kurdistan, weşanên Findakly, Parîs, 1984.) hatine wergirtin û di cotmeha 1986ê de jî di rojnameya Le Monde diplomatique de hatiye weşandin.

Ahmet Aslan: **Xwîn 1**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 100 x 100 cm



Ahmet Aslan: **Hişmendîya spontane 3**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 90 x 90 cm

www.arsivakurdi.org

TÎRMEH 1997

"Pirsgirêka kurd"

Di nav krîzeke mezin de

Kendal Nezan

Li vî Rojhilatê Nêzîk ku timî yek ji navendên alozî û şerên cîhana me ya îro ye, pirsgirêka kurdî ji ber xisleta xwe ya ji sînoran dibihure û ji ber alîyên xwe yên demografîk û aborî vediguhere hêmaneke dîyarker ji bo îstîqrar û manûnemana gelek dewletên mezin ên li herêmê. Bi hejmara xwe ya 30 mîlyonî, kurd li ser erdekî dimînin ku çemên Dîcle û Firatê ango çavkanîyên sereke yên avê yên herêmê û rezervên mezin ên petrolê lê ne. Tevî şerên wan, alozîyên wan ên birakujîyê jî kurd xwedîyên zindîtî û şervanîyeke kêmdîtî ne. Pirsgirêka kurdî demeke dirêj bi tenê bi alîyê wê yê insanî dihat dîtin, niha êdî di wê borê de ye ku xwe li ser biryardêrên siyasî yên herêmî û navneteweyî ferz bike. Ji ber tevlîhevîyeke zêde ew ê demeke dirêj li rojevê bimîne. Ma ne wek pirsgirêkeke kronîk û weke ku çareser nabe xuya ye, întelektuelên tirk navê "*Kürt Meselesi*" (Pirsgirêka Kurd) lê dikin.

Piştî şerê Kendavê, ji nû ve bal diçin ser kurdan, ku bi weşana gelek berhemên li ser bûyerên diqewimin berbiçav dibe. (1) Dewletên herêmê yên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn li ser xirbeyên Împaratorîya Osmani ava bûn, bi kêr nehatin ku taybetbûna kurdan nas bikin û mafên wan misoger bikin, nexasim jî mafên wan ên çandî û zimanî yên ku kurd lê hene. Tirkiyeyê hewl da netewe-dewleteke bi yekziman û bi yekçandî ava bike. Jixwe di dema qirkirina sala 1915ê de qira ermenîyan anîbû, 1.2 mîlyon yewnanên Anatolyayê kiribûn der û di navbera salên 20 û 30ê de jî ji sê paran pareke nifûsa xwe ya kurd a ku projeya wê ya yekkirinê xera dikir, an mişext kir, an jî bi tevkujîyan qeland. Neteweperestîyeke din a bê serûber a baasîzma îraqî ye, vê neteweperestîyê rê li ber komkujîya 400 000 kurdan û xerakirina hema hema tevahîya gundên wan di dema "şerê sî salan de vekir" (1961-1991), di vî şerî de tevgera kurdên Iraqê û hukûmeta Bexdayê dijberên hev bûn. Îranê bi xwe destek dida kurdên Iraqê û di heman demê de daxwazên hindikahîya xwe ya kurd bi awayekî hişk ditepisand.

Ji ber nebûna qada îfadeya siyasî ya pasîfîk li van dewletên ku yek ji wan jî ne modeleke demokratîk e, ji ber hovîtîya zilma li ser miletê wan, hin kurdan tercîha şerê çekdarî kir. Kurdistan erdeke dorlêgirtî ye û peravên wê yên deryayî nînin, ji ber vê yekê jî her tevgera çekdarî neçar bû ku ji bo lojîstîka xwe bi dewleteke sînordar re bibe hevgir, ev dewlet bi xwe jî bi kurdên xwe re di nav alozîyeke eşkere, yan jî veşartî de ye û tu berjewendîya wê nîne ku li dewleteke cîran hebûneke xweser a kurd pêk were –lê belê karta kurdî bi kar tîne ji bo ku dewletên cîran lawaz bike.

Ev lîstik bê tehlûke nîne. Ew di navbera Iraq û Îranê de bû sedema şerekî pir kujer, Iraq ji vî şerî bi awayekî helak û jihevdeketî derket. Tirkiyeya ku ev sêzdeh sal in bi gerîlayên kurd ên biryardar re şer dike, xwe bi awayekî zêde çekdar dike (ji bo du dehsalên li pêşîya me 150 milyar dolar). Ev yek dike ku cîranên wê fikaran bikin û dibe barekî giran li ser budceya wê ya ku ji ber şerê li Kurdistanê xwîn jê kişiyaye –li gor texmînan salê 8 mîlyar dolar li şer diçin. Ew dibe hevgira Îsraîlê û her diçe bi israreke zêdetir berê tilîya xwe dide cîranên xwe Sûrîye û Îranê û her duyan jî bi piştgirîya Partîya Karkerên Kurdistanê gunehbar (PKK) dike. Şer tevî xirakirina gundan, ji cih û war kirina bi mîilyonan gundîyên kurd, tevî mexdûrên xwe yên kurd û tirk dubendîya etnîk xurt dike, neteweperestîyan gij dike, dibe sedema bipêşketina îslamîzmê û sîstema kevin a ji Ataturk mayî jî ji hev dixe. Gelek şiroveker bi awayekî eşkere ji xwe dipirsin ka gelo Tikiye wê piştî şerê bi kurdan re li ser xwe bimîne? û behsa îhtîmala şerekî herêmî dikin.

Yek ji xalên hêja ya pirtûka Hamît Bozarslan *La Question kurde* [Pirsgirêka Kurdî] (2) ew e ku ji bûyeran û kirdeyên wan wêdetir diçe, beridînên siyasî û dînamîkên civakî, aborî û dînî yên li cihêcih analîz dike, doktrînên damezrêner ên aktoran, cîhana wan a zêhnî tarîf dike, çerxa navxweyî û nakokîyên tevgerên kurdî li wan eşkere dike, şewazên çalakîyên wan bi yên şerên hindikahîyên din re li ber hev digire. Kurt û kurmancî tevlîhevîya dîrokeke mohra trajedîyê li ser e, dide fêm kirin.

Lêkolînerê bi eslê xwe kurd, civaka xwe baş nas dike. Ji ber ku bi ziman dizane, û bi xêra têkilîyên xwe yên şexsî jê hatiye ku bigihêje agahîyên yekser ên bê navbeynkar. Di heman demê de bi awirekî rexnegir nêzî civaka xwe dibe, xwendevan jî wê bi kalîteyên wî yên bêtawîz û mesafeya pêwîst bihisin, ev kalîte hêja ne ku mirov behsa wan bike, lewra di vê serdema dildarîyên neteweperest de kêm tên dîtin.

Nivîskar rave dike ka çima du şêwazên birêvebirina pirsgirêka kurdî bi ser neketin. Şêwaza pêşî li desthilatdarîyê hevparkirina elîtan e û ya diduyan zora serhişkan û girseyê ye, her du jî di salên 20ê de derketin holê û ji hingê ve dewletên ku welatê kurdan bi rê ve dibin, wan bi kar tînin. Giştîkirina perwerde, agahî û navgînên ragihandinê, demografîyeke pir bi lez zêde dibe dikin ku întegrasyona elîtên kurd nemumkin bibe, jixwe hejmara wan jî her diçe zêde dibe û daxwazên wan zêdetir dibin. Zor jî binê rewabûna van dewletan a ku bi têra xwe nazik û hesas bûye, dikole. Sînor bi xwe êdî nisbî bûne, nexasim jî ji 1991ê ve lewra artêşên îranî û tirk gelek caran ev sînor çawa ku tevgerên kurd jî dikin, bin pê kirin. Ev tevgerên kurd pêk tên û tevdigerin "*weke bersiveke herdu şêwazên birêvebirinê yên ku dewletan qebûl kirine*", û her yek ji wan dişibe "*dewleta xwe*". Bi vî awayî li gor Bozarslan PKK di rastîyê de ji alîyê "*kemalîzmeke perepaşkirî*" ve tê bi rê ve birin, milîtanên wê ji serokê xwe Ocalan re heman kult çêkirine ku tirkan ji Ataturk re çêkiriye. Zerarên ku gelek dehsalên şer û jiçandêkirinê rê li ber wan vekirine, ne bi tenê texrîbkirinên meteryal in, di mêjîyan de jî pir giran in. Ev pirtûka têr û tijî ya xwe disipêre belgeyên pir û saxlem encama xebateke dirêj a zanîngehê ye. Ew rohnîyek e ji bo fêmkirina pirsgirêka kurdî û dînamîka tevgerên hindikahîyan ên ku çav li rê ye bibin beşeke mezin a şer û alozîyên sedsala bê.

(1) Di nav pirtûkên vê dawîyê weşandî de em behsa van bikin, *Le Malheur kurde* (*Bextreşîya kurd*) a Gérard Chaliand, Le Seuil, Parîs, 1992; *Le Défi kurde* (*pirsgirêka kurdî*) a Chris Kutchera, Bayard, Parîs, 1997*; û herweha A Modern History of the Kurds* (Dîrokeke modern a kurdan) a David MacDowell, I. B. Tauris, London, 1995, ev pirtûk bi ingilîzî ye û berhema herî tekûz a li ser vê mijarê ye.

(2) Hamit Bozarslan, *La Question kurde: Etats et minorité au Moyen-Orient / Pirgirêka Kurdî: Dewlet û Hindikayî li Rojhilatê Navîn* , Presses de Sciences Po, Parîs, 1997, 383 rûpel, 188 Frank

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ahmet Aslan: **Mirovê biçûk**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 100 x 100 cm

Ahmet Aslan: **Welat**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 75 x 75 cm

Ahmet Aslan: **Xwîn 2**, li ser tuwalê teknîka tevlihev 50 x 50 cm

www.kurdiya.org

Di encama greveke dirêj a birçîbûnê de ku ji bo hin kesan bêhtirî du mehan dewam kir, girtîyên siyasî yên filistînî di nîvê meha gulanê de gihiştin lihevkirinekê ku teahud dike dawîyê li tecrîdkirinê bîne, cezayên disîplînê sînordar bike û mafekî mezintir ê serdana malbatan bide. Lê belê sîstema girtîgehan a Îsraîlê her amûreke sereke ye ji bo kontrolkirina erdên dagîrkirî û xelkê li van erdan.

Huqûqeke îstîsnayî ya Îsraîl ferz dike

Filistînî di nav sîstema girtîgehê de

Stéphanie Latte Abdallah *

Filistînî navê "*girtîyên şer*" (*asra*) yan jî girtîyên siyasî li wan dikin; birêveberîya girtîgehên îsraîlî (Şabas) bi xwe behsa "girtîyên ewlekarîyê" dike, binavkirineke ku li rastîya qanûnî nayê û girêdayî biryarên artêşê, rêxistina îstîxbaratê (Şîn Beth) û birêveberîya girtîgehan e. Ev kategor bi tenê ji bofilistînîyan hatiye veqetandin; çi hemwelatîyên Îsraîlê bin û çi jî ne hemwelatîyên Îsraîlê bin. Şert û mercên lêpirsînê, yên xwe gihandina parêzerekî û yên girtîbûnê ku ji yên girtîyên din zehmettir in, li gor rewşa siyasî û ewlekarîyê ji nû ve tên nirxandin, ceza giran in: Li gor hejmara îsraîlîyên ji ber kirina gunehbarîyê yekser, yan jî neyekser hatin kuştin, cezayê gelek muebbetan li gunehbaran tê birîn. Di rastîyê de jinûve nirxandin an jî kêmkirina ceza jî nîne.

Sîstema girtîgehan a ji bo filistînîyan ne bi tenê weke awayekî cezakirina sûcên piştrastbûyî û bi delîl hat bi pêş xistin: Girêdayî sîstema dadgerîya eskerî, ew yek ji şêwazên birêvebirina xelkekî bû. Ji sala 1967ê vir ve bi qasî % 40ê zilaman di girtîgehên îsraîlê re derbas bûn. Piştî mohrkirina peymanên Osloyê di sala 1993yê de, piranîya girtîyan hatin berdan. Ji îlona 2000ê û întîfadaya duyem ve girtin êdî bi awayê girseyî pêk hatin. Ber bi nîvê salên 2000ê ve serjimara kesên girtî ji 8000an bihurî. Di adara 2012ê de ev hejmar 4386 bû (1), ber bi dawîya sala 2011ê demeke kurt piştî berdana 1027 girtîyan di berdêla berdana eskerê îsraîlî Gilad Shalit de. Ji 2002yê û pêve bi dorlêgirtinê, destwerdanên artêşê yên bi rêkûpêk û kuştinên li armancê, van girtinan kir ku erdên filistînî ji dûr ve werin bi rê ve birin. Şerîa Rojava bixwe li sedan parçeyên dorlêgirtî hat parçe kirin û bi pergaleke nuqteyên kontrolê yên sabit û seyar ên li dora bajar û gundên filistînî tê kontrol kirin.

Ev sîstema girtîgehî hêmanê mezin ê naskirin û kontrolkirina xelkê erdên dagîrkirî ye ya ku dadgerîya eskerî wê bi rê ve dibe û bi rêya rêxistina îstîxbaratê dixebite. Ev pergal xwe dispêre delîlê ku bi xwe xwe dispêre mikurhatinên kesên xwedî berjewendî, yan jî kesên sêyem. Mikurhatinên ku kesên jêpirsînê dikin dixwazin bi dest bixin, buhayê wê çi dibe bila be; vê yekê jî zexta dijwar a fizîkî û manewî yên ku ji êşkencê hatine veguhertin – rapora Landau ya sala 1987ê bikaranîna wan teşwîq kir (2) – rewa kiribû, heta ku biryareke Dadgeha Bilind a Îsraîlê sala 1999ê ev pêkanîn bi sînor kirin.

Dused û hijdeh zarok di girtîgehê de ne

Ev hêman ewqasî heyatî ye ku bêhtirî % 95ê dozan pêk nayên: Mesele bi hevdîtinên li ser ceza yên di nav parêzer û dadgeran de tê hal kirin; ji bo vê şert e ku gunehbar li xwe mikur hatibe. Otorîteyên dadgerîya eskerî zorê didin van hevdîtinan ku destûrê didin pêşî li dozê were girtin, û yên ku hevdîtinê red bikin, piştî prosedûrên dawî li wan nayê, bi awayekî girantir tên ceza kirin. Hema hema tevahîya gunehbaran weke gunehkar hatine îlan kirin (3), ev yek jî li ber çavên raya giştî ya îsraîlî û navneteweyî girtinên girseyî û şewazên –gumanbar ên– xebitîna vê dadgerîya eskerî rewa dike.

Bi vî awayî sala 2008ê, piştî ku sê salên xwe girtî bihurandin franko-filistînîyê bi navê Salah Hamouri weke gunehkar hat îlan kirin, li gor îdîayê wî kuştina birêveberê partîya ultra-ortodoks Shas Ovadia Youssef plan kiriye, û di encama hevdîtinekê de heft sal cezayê girtîgehê lê hat birîn: Ew li çalakîyên xwe yên milîtanî yên di nav ciwanên Bereya Gel ji bo Azadîya Filistînê (BGAF) de mikur hatibû. Piştî ku biryara dadgehê hat dayîn, meqamên fransî bi îdîaya rêzgirtina ji biryara dadgehê re, êdî hema hema qet serê xwe bi mijarê neêşandin.

Sîstema ku dikare herkesî bike gunehbar

Sucên ku ji wan re "yên ewlekarîyê" tê gotin, û artêş wan weke "çalakîyên terorîst ên dijminane" terîf dike, sala 2007ê % 47ê gunehbarîyan pêk tînin. Dîsa jî piranîya wan ne kirinên bûne sedema mirina mirovan in, ne jî amadekarîyên êrişekê ne, bi tenê xwe disipêrin hebûna têkilîyên bi "rêxistineke neqanûnî" re (4), ango tevahîya partîyên siyasî yên filistînî, rêzeke komele û rêxistinên civaka sivîl ên li derveyî hukûmetan (NGO) ku lîsteya wan her û her dirêj dibe – û li ser vê listeyê El-Fetîh jî heye, ku bi xwe hosteyê peymanên Osloyê ye, sala 1986ê weke "rêxistina terorîst" hatibû îlan kirin. Ji hingê ve milîtanên ku di seferberîya pasîfîk a komîteyên berxwedana gel (Nailin, Beilin, Nabi Saleh, û hwd.) de cihê xwe digirin, gelek caran cezayê girtîgehê li wan tê birîn.

Ev sîstem di pratîkê de destûrê dide girtin heta zindanîkirina hema hema herkesî, ji 12 salî û pê ve ya hemû jin û mêran. Yên ku hîna zarok in, dadgerîya eskerî bi wan re elaqedar dibe û piştî 16 salîya wan, wan di şert û mercên mezinan de dadgeh dike. Li gor huqûqa sîvîl a Îsraîlê û navneteweyî, ev temen diviyabû 18 sal bûya. Ev taybetmendîya dadgerîya eskerî ji dawîya sala 2011ê û vir ve êdî dikeve ber lêpirsînê. 1ê gulana 2012ê 218 zarok di girtigehan de bûn, û ji van temenê 33yan di bin 16 salan de bû. (5)

Çi rastî û çi xeyalî, sîstema girtîgehê tevahîya têgeha demê dişkîne. Mirov dikarin ji ber kirinên xwe yan jî ji ber têkilîyên xwe yên malbatî, civakî û siyasî yên niha û yên berê yan jî ... yên siberojê bên girtin. Amûrên girtina îdarî destûrê didin ku kesek şeş mehan were ragirtin, ev dem dikare gelek caran were dirêj kirin, di îhtiyata Şîn Bethê de bêyî ku gunehbarîyek pêwîst be; destpêka gulana 2012ê 308 kes ketibûn ber vê pêkanînê. Hinek dikarin girtî bimînin piştî mirina xwe li morgan, yan jî li goristanên ji bo vî karî veqetandî. Bi riya van girtinên dewam dikin, rêxistina îstîxbaratê hevkaran peyda dike, dikeve nav civakê, lihevkirinan li ser berdêlan dike û çavkanîyeke mezin a agahîyên li ser jîyana siyasî, civakî û rojane ya filistînîyan bi dest dixe.

Piştî Peymanên Osloyê, girtîgehên ku berê li erdên dagîrkirî bûn, veguheztin ser erdên Îsraîlê. Bi ser de jî ji sala 2003yê ve wan dixin nav sîstema girtîgehan a sivîl a îsraîlê ya di bin hukmê Shabasê bi tenê de ye. Ev guhertin alîkarîyê didin jêbirina sînorên di navbera Îsraîl û erdên Filistînê de; ew dagîrkerîya eskerî bi awayekî mayînde misoger dikin, pêre jî bi dûrîçavkirina wê wê normal dikin. Ew wekî din jî çaremîn Peymana Cenevreyê jî red dikin, ku li gor wê xelkê erdên dagîrkirî divê li ser erdên xwe werin girtin. Wezîrê Girtîyan ê Filistînê dixwaze vê pirsgirêka rewşa huqûqî ya girtîyên filistînî ya heta niha nedîyarkirî, bibe ber sazîyên navneteweyî.

Girtîgehên eskerî derbasî bin parazvanîya Rêveberîya Girtîgehan bû, ev jî bi van hêncetan hatibû rewa kirin: Kapasîteya wê ya kêmkirina mesrefên siyaseta girtîgehan, jêhatîbûna personelê Shabasê û sedemên insanî ji bo başkirina şert û mercên girtîbûnê. Di vê navberê de rêxistina îstîxbaratê di girtina vê biryarê de bi rola dîyarker rabû. Endamên Huqûqê yê Desteya Birêveberîya Shabasê, ji hingê ve tevlî girtina biryaran dibin û gelek îlham dan birêveberîya nû ya girtîgehan a ku sala 2003yê dest bi wezîfeyê kir.

Birêveberîya Filistînî kêmkirina mesrefên girtinê mumkin dike: Bi ji nû ve destpêkirina girtinên girseyî re, rola Wezareta Girtîyên Şer û Kevne-girtîyan a ku sala 1998ê hatibû damezrandin, xwe mezin kir û pêre jî veberhênanên xwe yên malî. Birêveberîya Filistînî her meh qederê 20-25 mîlyon şekelan (nêzî 4.5 milyon euroyan) dişîne Îsraîlê û bi vî awayî tevî fînansorên xwe yên ewropî û navneteweyî beşdarî mesrefên girtina welatîyên xwe dibe. Wezaret alîkarîyeke huqûqî dide û pereyan jî dide ji bo kirîna tiştan ji kantîna girtîgehê.

Birêvebirîya Filistînê pereyê cezayê dîsîplînê yê girtîyan dide

Tebaxa sala 2004ê, Shabasê xwarin û pêdivîyên sereke (dermanê şuştina cilûbergan, sabûn, cil û berg, pêlav û hwd.) yên didan girtîyan gelekî kêm kir. Kirînên rojane ji kantîna girtîgehê –ên ku buha li wan ji taybetîkirina wan û vir ve pir zêde bûye– êdî veguherîn pêdivîyekê. Birêveberîya Filistînê wekî din mîqdareke dîyar her meh ji girtîyên "ewlekarîyê" yên filistînî, yan jî ereb tevan re dişîne. Heke pêwîst be ew xwendina li zanîngeha vekirî ya Tel Avîvê jî fînanse dike; Shabas destûra xwendina li vê zanîngehê bi tenê dide, ew jî zanîngeheke taybet e û dersan jî bi zimanê ibrî dide.

Ji sala 2011ê vir ve di nav tedbîrên zor û zextê de yên ku ji ber dewama girtina eskerê Îsraîlê Shalit hatibûn girtin, xwendina zanîngehê û îmtîhana xilaskirina lîseyê hatibûn betal kirin, pêre jî dana pirtûkan û pêdivî û amadekirina amûrên ji bo nivîsandinê jî. Wekî din Shabasê bi ser cezayên adetî (cezayê hucreyê, tecrîda dirêjkirî, carinan bi salan, bêparkirina ji serdanan, û hwd.) de sîstemeke cezayê ya nû da dest pê kirin (ya 400 shekelan ango 100 euroyî) ji bo tevahîya binpêkirina rêzikên nav girtîgehan. Cezayên pereyan van salên dawîyê êdî bi rêk û pêk bûn û ji bo ku ev înflasyon dewam neke, Birêveberîya Filistînê alîkarîya xwe ji bo dana deynên cezayên dadgehê serê girtîyekî bi 4000 shekelan sînordar kir.

Rayedarên girtîgehan hewl dan îxtîlafa di navbera Hamas û El-Fetîhê de ya sala 2007ê dijwartir bikin. Wan girtîyên girêdayî partîyên dînî –Hamas û Cîhada Îslamî – û endamên partîyên siyasî –El-Feîh, BGAF, Bereya Demokratîk ji bo Azadîya Filistînê (BDAF) û komunîst – li qawîşên cihê bi cih kirin.

Girtî herweha li gor welatîbûna xwe, yan jî statuya xwe, li gor heman rêzikên tebeqebûn û tecrîdkirinê yên li erdên dagîrkirî di meriyetê de jî tên cuda kirin, li derve çawa filistinîyan ji hev vediqetînin di nav girtîgehê de jî bi heman rengî wan vediqetînin . Filistînîyên ku weke "yên sala 1948ê" tên nasîn –welatîyên Îsraîlê û Qudsa Rojhilat – rastî heman muameleyê hatin û gelek caran ji yên din hatin tecrîd kirin, ev yek jî dikeve nav perspektîfa îsraîlî ya bi tevahî îlhaqkirina bajarê pîroz. Di girtîgehê de weke girtîyên "ewlekarîyê" tên dîtin, weke "dijminê hundir" cezayên li wan tên birîn girantir in ji yên li filistînîyên li erdên dagîrkirî dimînin. Ji ber vê yekê dawîya sala 2011ê berdana îstîsnayî ya çilûheşt filistînîyên ji Qudsê û heft filistînîyên "sala 1948ê" weke yek ji serketinên Hamasê di vê lihevkirinê de hatibû dîtin.

Li gor şahidîya Walid Dacca yê ku ji bêhtirî bîst salan û vir ve zindanî ye (6), Shabasê li hin girtîgehan cihêkirin zêdekirine, hem jî li gor cihêtîyên cografî û heta malbatî: Bi vî rengî şênîyên bajaran ji yên wargeh û gundan hatine veqetandin; yên bi eslê xwe ji Ramallahê ji yên ji Nablûs, Cenîn û Hebronê hatine cihê kirin.

Jinûve ketina dewrê û bikaranîna girtîgehên li Îsraîlê serdanên malbatan (yên ku ji sala 1996ê ve bi xizmên yekser ên dereceya yekê ve hatibû sînordarkirin: dê û bav, zarok, xwîşk û bira) asteng kirin, lewra niha ji bo serdanan destûreke ketina nav erdên Îsraîlê pêwîst e, ev destûr gelek caran bi hêncetên "ewlekarîyê", yan jî liberrabûna pêwendîyên xizmtîyê tên red kirin. Yên ku bêhtir diçin serdana girtîyan, jin yan jî zarok bi tenê ne. Ji sala 2004ê ve ji bilî zarokên temenê wan di bin 6 salan de, dûrbûna bedenê ji kabîna hevdîtinê qaîde ye: Hevdîtin di camekanekê re bi riya telefonekê pêk tên.

Rê li ber ferdparêzî û pasîfbûnê xweş kirin: Internet, telefonên destan, Facebook

Ev çerxa tecrîda zêdekirî jî xwe dispêre mantiqekî neolîberal yê bipêşdebirina madî ya girtîyan ku armanca wê teşwîqa ferdparêzî û pasîfbûnê ye. Li çend girtîgehan, bi bicihkirina nav birêveberîya Shabasê re û bi tamîrkirin yan, jî avakirina avahîyên nû re şert û mercên ku bi rastî jî pir xirab bûn bi awayekî radîkal guherîn: Li Oder, li Ksiot yan jî li Hadarim, bi baskekî stîla amerîkî ya tevahîya konfora wê, midbexek, mekîneyeke şûştina cilûbergan hatiye dabîn kirin... Teknolojîyên nû dikin ku kontrol û ji azadîyê bêparkirin hindiktir xuya bikin. Li vir berîya ku gardîyanek pergala navendî ya girtina derîyên sed hebek hucreyî bixebitîne, girtî bi xwe derîyan digirin; hinekên din li qadeke "xweser" dimînin, bêyî ku çavdêran bibînin, "bi awayekî azad" navberê didin kar û mijûlîyên xwe. Armanca vê rehetîya madî berîya hertiştî –lê belê ne bi tenê– fîgurên navdar ên girtîgehê ne, newekhevîya muameleya bi girtîyan re dibe ku bibe yek ji hêmanên bikêr ên lihevnekirina di navbera girtîyan de ye.

Ev siyaset dixwaze hizra li ser xwe derêxe pêş. Spor û kêfûşahîyên televizyonê ji dema ji bo perwerdeya siyasî, çandî, yan jî xwendinê hatine qut kirin, ev bi xwe heta hingê tewereya navendî ya civakîbûna girtîyan bû.

Bûna adet a tecrûbeya girtîgehê, çûn û hatinên di navbera hundir û derve de, di navbera jîyana di girtîgehê û ya li derve de. Girtî dixwazin jê û wê de jî bijîn tevî girtîbûnê: Dibînin ku rêjeya qedandina beşeke zanîngehê di girtîgehê de di pêvajoya piştî Osloyê de pênc caran li berê zêde bû û zewac jî tên teşwîq kirin. Li hemberî parçekirina girtîgeh dibin sedema wê, teknolojîyên ragihandinê, têkilîyên dildarî û milîtanîyê ji nû ve hûnandin: Ji 2002-2003yê û pê ve telefonên destan ketin nav hin girtîgehên mêran û derfet dan dîyaloga bi derve re, pêre bazareke reş û amûrekî kontrolê ji bo rayedarên girtîgehan afirandin. Girêdana Înternetê û çêkirina profîlên Facebookê yên ku xizmên girtîyan, yan jî NGO wan dixebitînin, destûrê didin ku di qada xeyalî ya Înternetê de jî girtî li derve hebin û rezonanseke kolektîf a nû dide seferberkirina girtîyan.

* Wezîfedara lêkolînê ye li CNRSê (Ireman, Aix-en-Provence), bi Cédric Parizot (birêveber) nivîskara vê berhemê ye, *A l'ombre du Mur: Palestiniens et Israéliens entre séparation et occupation / Di bin sîya dîwêr de: Filistînî û Îsraîlî di navbera cihêbûn û dagirkirinê de*, Actes Sud, Arles, 2011.

(1) Çavkanî: www.btselem.org. Di nav van hejmaran de filistînîyên sala 1948ê, welatîyên Îsraîlê nînin.

(2) Komîsyona Îsraîlî ye ku piştî kuştina du girtîyên filistînî hat damezrandin û serokê Dadgeha Billind a Îsraîlê dadger Moshe Landau ew bi rê ve dibir. Wê bikaranîna birêkûpêk a êşkencê li girtîgehên Îsraîlê qebûl kir, lê belê biryar da ku qaîdeyên destûrê didin "*bikaranîneke nerm a zexta fizîkî*" çêbike.

(3) "Guilty. Membership and activity in unlawful associations. Military courts 2008 / Sûcdar. Endametî û çalaktî di komeleyên neqanûnî de. Dadgehên eskerî 2008", Machsom Watch, Tel Aviv, 2008, www.machsomwatch.org

(4) *li heman çavkanîya jor binêre*.

(5) www.addameer.org

(6) "Consciousness molded. Or : of the re-identification of torture / Bîrewerî xistin qaliban. Yan jî: Jinûve tarîfkirina êşkencê", di Abeer Baker û Anat Matar (di bin birêveberîya wan de), *Threat. Palestinian Political Prisoners in Israel / Tehlûke. Girtîyên Siyasî yên Filistînî li Îsraîlê,* Pluto Press, Londres, 2011.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Messali Hadj, bavê jibîrkirî yê neteweparêzîya cezayîrî

Alain Ruscio *

Di dîroka neteweparêzîya cezayîrî de pirsek heye: Çawa û çima bavê damezrêner Ahmed Mesli yê navê wî weke Messali Hadj tê hildan, dikarîbû ji alîyê kurên xwe yên manewî ve were mandelkirin, paşê şerê wî were kirin, tevî ku ew kesê pêşî bû ku ji xwe re ne birêkûpêkkirina pergala kolonyal, belê şerê ji bo serxwebûnê kire armanc?

Erê navê Habîb Bûrgûîba li Tûnisê û yê Muhemmed Bin Yûsif – yan jî Muhemmed V – li Fasê di bîra kolektîf de girêdayî têkoşîna ji bo serxwebûnê ne, lê belê li Cezayîrê yê Messali Hadj hê jî mijara sergirtin û nixumandinekê ye ku ji dehsalek, yan jî du dehsalan û vir ve hema hema weke berê dewam dike.

Stêrka Bakurê Afrîkayê (SBE) bihara sala 1926ê hat damezirandin; bi înîsîyatîfa derdorên komunîst ên fransî yên ku bala wan hingê pir li ser birêxistinkirina "karkerên kolonyal" ên li Fransaya parzemînê bûn. Di nav komîsyona kolonyal a Partîya Komunîst a Fransî (PCF) de berpirsîyarê sereke Abdelkader Hadj Ali bû: Milîtanên ciwantir alîkarê wî bûn, yek ji wan jî Messalli Hadj bû. (1) Di sibata 1927ê de li Brukselê dema kongreya Lîga Cîhanî ya li dijî Emperyalîzm û Zilma Kolonyal, erka Messaliyê ciwan e ku bernameya Stêrkê bide nasîn. Cara yekem e ku ji jora trîbûneke navneteweyî, axaftvanek doza serxwebûna Cezayîra kolonî û mandayên tûnisî û fasî dike: "*Serxwebûna yek ji van her sê welatan bi tenê heke tevgerên azadker ên herdu welatên din destekê bidin tevgera wê ya azadker, mumkin e.*" (2)

Serketina Stêrkê her mezin dibû, nexasim jî di nav koçberên cezayîrî yên li erdên Fransaya parzemînê. Lê belê bi dawîya dehsala 1920ê re têkilîyên di navbera komunîst û stêrkîstan de ji hev dûr dikevin. Messali û birêveber fikaran dikin da ku nekevine rewşeke ku bi PCFyê re werin dijberî hev. PCF li têkilîyên xwe yên bi tevgerên neteweparêz re bi tenê li gor yekane stratejîya xwe serwext dibe û ev stratejî jî –piştî Bereya Gel [Front populaire]– her bêhtir girêdayî Fransaya parzemînê û dûrî navneteweyîbûnê dibe. Heta hingê her alîyî yê din ji bo armancên xwe bi kar anîbû.

Piştî ku Bereya Gel bû desthilatdar, şaşfêmkirin eşkere dibe. Hevnegirtinê xwe li ser armancan da der. Der barê mijara Kolonîyan de siyaseta çepê a fransî bi awayekî biîhtîyat reformîst e: Plana şermokî ya Blum-Viollette –sala 1936ê ji alîyê Léon Blum tevî kevnewalîyê Cezayîrê Maurice Violletee ve hat bipêşxistin– jî a ku armanca wê ew bû destûrê bide bîstûpênc ta sîh hezar cezayîrîyan ku bibin welatîyên Fransayê bêyî ku rewşa xwe ya şexsî biguherin, ango dev ji misilmantîyê berdin, wê ti caran bo parlemanê nehata pêşkêş kirin. PCFyê sala 1936ê bîra şemaya "*neteweyê pêk tê*" bir, a ku xwe dispêre têkelhevîyeke di navbera nufûsa ewropî û erebo-berber; wê derketa holê ku şema nebikêrhatî ye. Zimanê stêrkîstan bi xwe naguhere: Gelê Cezayîrê divê berîya hertiştî xwe bispêre hêzên xwe bi xwe. Messali Hadj weha hişyar dike: "*Birano, nabe ku niha em rehet rakevin û bawer bikin ku kar hemû xilas bûye. Lewra ew hê nû dest pê dike*."

Hingê li dijî stêrkîstan kampanyayeke hişk û paşê jî eşkere dest pê dike. 26ê çileyê 1937ê hukûmeta Léon Blum xwe spart qanûnên li dijî serhildêrîyê û Stêrk fesx kir. Erkdarê mijara Cezayîrê yê PCFyê Robert Deloche destekê dide vê gavê di rojnameya *L'Humanité* ya 12 sibatê de; êdî bi tevahî hev berdan.

Messali Hadj û hevalên wî Partîya Gel a Cezayîrê (PGC) dadimezrînin, wê weke Stêrka Bakurê Afrîkayê nekir, û xwe li Cezayîrê jî bi cih kir. Berdêla vê ji bo Mesalî bû gunehbarîya "jinûve sazkirina lîga fesxkirî" û girtina wî ya 27ê tebaxa 1937ê. Ji bo damezrênerê PGCyê piştî dozeke xwerû li gor rêûresma kolonyal, hingê jîyaneke nû dest pê dike. Wî dê ji 37 salan –di navbera 1937ê heta sala mir 1974ê– 22 sal yan di girtîgehê de, yan jî di xanîyê di bin çavan de derbas bikira, li gor daxwaza baş a çar rejîman: Komara Sêyem a bi dawî dibû, Dewleta Vichyîst, paşê jî Komarên Çarem û Pêncem.

Di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de wî tevahîya avansên Almanyaya Nazî dane neteweparêzên welatên kolonîzekirî red kirin, vê jî otorîteya wî ya exlaqî zêdetir kir. Paşê bi ketina nazîzmê re du dem bi awayekî xirab li hev rast tên: 8ê gulana 1945ê drama li Constantinoisê ya dema xwepêşandaneke ji bo serxwebûnê, a ku bi rasthatina serketina Hêzên Hevgir hatibû li dar xistin, bi zorê hat tepisandin. (3) Komkujîyê –bi hezaran kes hatin kuştin– bandor li tevgera neteweparêz a cezayîrî kir. Ji bo milîtanên nifşên ciwan, ya rastî şerê Cezayîrê hingê dest pê dike, û amadekarîya ji bo şerê çekdarî xwe ferz dike. Messali –yê ku êdî li Cezayîrê namîne– bi xwe girêdayî şemaya klasîk a bîrewerkirina herdiçe bêhtir a gel dimîne. Li gor wî bangên ji bo raperînê "*zirt û fortên*" "*çepgirîyeke ehmeqane*" ne. (4)

Van cudatîyan wê rê li ber qutbûna sala 1954ê vekira. Tevgera neteweparêz a cezayîrî ji hev parçe dibe. Otorîteya Messali Hadj ê damezrêner û serokê PGCyê – piştî ku fransîyan sala 1946ê PGC qedexe kir, dibe Tevgera ji bo Serketina Azadîyên Demokratîk, TSAD– kete ber lêpirsînê. Di navbera messalîst û navendparêzan (ji ber ku piranîya wan di Komîteya Navendî de bûn ev nav li wan hatibû kirin) cudabûnek xwe dide der.

Navikeke piçûk a xweser a ku ji Rêxistina Taybet (RT, avahîyeke neqanûnî a ku armanca wê amadekirina şerê çekdarî bû) peyda bû, wê nazikîya li hember herkesî bi dawî bikira û amadekarîya berbiçav a raperîneke çekdarî bikira. Ev fikr roja damezirandina Komîteya Şoreşger ji bo Yekîtî û Çalakîyê (KŞYÇ) ango 23yê adara 1954ê hat ragihandin. Berîya hingê, di sibatê de yek ji neh damezrênerên KŞYÇyê Moustapha Ben Boulaïd hatibû cem Messali û

Ahmet Aslan: **Hişmendîya spontane 1**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 90 x 90 cm

Messali bi piçûkxistinê planên van "amatoran" red kiribûn. Îro em pê dizanin ku wî bi xwe jî xwe dabû ber –lê gelo ew pê bawer bû?– raperîneke li derdora 15ê çirîya paşî ya 1954ê.

Pêşbazîyeke lezê di navbera her du bendan de dest pê dike, tevî ku her du jî bi heman îdealê dildar in û xwedîyê stratejîyên pir nêzî hev in, lê belê li ser dem û taqwîmê li hev nakin. Bêguman tiştekî mirov ji heq dernekeve nebû; lê belê du hêmanan wê ev mijar şîlo û tevlîhev bikira. Li Fransayê wezîrê karê hundur François Mitterrandê ku dîyar e der barê mijarê de baş agahdar e, îlonê biryarê dide ku Messali careke din bixe hepsa malê li Sables-d'Olonneê. Ev jî tecrîda li ser wî xurttir dike. Li Misrê KŞYÇ baregeha xwe ya pişt bereyê bi cih dike, Cemal Abdil Nasirê ku li wir 23yê tîrmeha 1952yê dast datîne ser desthilatdarîyê ji bo bêtêsîrkirina Messaliyê li gor ciwanên neteweparêz –di nav wan de Ehmed Bin Bella jî heye ku wê sala 1962yê bibûya serokdewletê pêşî yê Cezayîra serbixwe– serhişktir xuya dike, zend û bendan ba dide.

Raperîn 1ê çirîya paşîn dest pê dike. Navekî nû mohra xwe li qutbûna ji rabihurîyê dide: Bereya Azadîya Neteweyî (BAN). Messali bi xwe partîyek damezirand ku wê bi lez û bez weke reqîba BANê xuya bikira: Tevgera Neteweyî ya Cezayîrî (TNC). Hingê yek ji demên herî biêş ên vê raperînê dest pê dike. Piştî sala 1956ê di nav çend mehan de pevçûna di navbera neteweparêzan de gihîşte asta şideteke berê nedîtî. Li gor tevahîya lêkolînê dîrokî, ya ku şer û pevçûnên pêşî dayî destpêkirin BAN e, da ku serdestîya ji dehsalan ve di destê messalîzmê de ye feth bikin. Li Cezayîrê wê baregehên li gor îdîayê yên TNCyê ne xira dike, herweha gundê Melouza jî ku lê sêsed û panzdeh mirov di gulana 1957ê de hatin kuştin; komkujîyeke ku bêguman propagandaya fransî bi kar anî.

Li ser erdên Fransaya parzemînê bi xwe tevî qebqebûya BANê û tecrîda birêveberê kal jî xebata çar dehsalan kir ku messalîzm desteke piranîya mezin a civakê bi dest bixe. Ji bo ferzkirina têgehana xwe ya şoreşê BAN ji 1957ê û pêve dest bi kuştina birêveberên TNCyê dike. Piştî demeke dudilîyê, a ku mohra bangeke merasîmane ya Messali ("*Ev qetl û ev guneh her roj zêde dibin, tevî ku welatîyên me hemû ji bo heman armancê şer dikin*", 1ê îlona 1957ê) (5) li ser e, TNC bersivê dide êrişên BANê. Di vî şerê navxweyî yê li nav Şerê Cezayîrê bi xwe de –a ku Fransaya kolonyal agirê wê carinan gur dike– li gor texmînên dîrokzan Gilbert Meynier li ser erdên Fransaya parzemînê hejmara kuştîyan digihêje çar hezar kesan (6), ev jî li sê komên hema hema biqasî hev mezin dabeş dibe: Ji sê beşan beşek jê endamên BANê ne ku TNCyê kuştin, beşek jî endamên TNCyê ne ku BANê kuştine û beşa mayî ji wan cezayîrîyan pêk tê ku red kirine serê xwe li ber her duyan jî bitewînin. (7)

Messalîst li Cezayîrê ji sala 1957ê û pêve dişkên, û ji sala 1959-1960ê û pêve jî li Fransaya parzemînê. Şer radiwestin ji ber ku li bereya TCNyê şervan namînin: BANê hegemonyaya xwe perçîn kiribû. Sala 1959ê dema ku rejîma gaullîst biryarê dide dawîyê li mişextîya Messali bîne, Messali bi xwe mirovekî şikestî û têkçûyî ye, ku li xanîyekî piçûk ê herêma Parîsê li Chantillyê li starê geriyaye. Saxfilitîna xwe jî ew deyndarê –rûreşîya herî mezin– parastina bidizî ye, ku dewleta hingê li dijî gelê wî şerekî wêranker dimeşand, misoger dikir.

Du tewereyên fikra siyasî ya Messali tevahîya jîyana wî kîjan bûn? Bidestxistina serxwebûnê; mayîndekirina piştgirîya di navbera sê welatên Mexrebê di şer de û paşê di azadîya bidestketî de. Sala 1962yê mafê wî ye ku xemgîn be. Erê bêguman serxwebûn hat bi dest xistin, lê belê di berdêla tecrîdkirina wê bixwe de. Cezayîra ku xeyala wî bû, ya ku xwe dispart tevgereke xurt a karkeran a xwedî tecrûbeyeke xurt a siyasî ya li koçberîyê û di nav têkoşînên siyasî de berhevkirî, wê tu caran pêk nehata. Ya ku wî bêguman pêş dîtibû, ango bi lez û neheq desteserkirina desthilatdarîyê ji alîyê kasteke eskerî-burokratîk ve, li ber çavên wî bi gewde dibe, û heta bi darbeya eskerî ya Houari Boumediene a 19ê hezîrana 1965ê zexmtir dibe. Û dîroka fermî ya ku nû dihat nivîsandin bi tenê pesnê serdest û efendîyên nû dida, pêre jî têkilîya bingehîn a di navbera messalîzm û tevgera neteweyî de mandel dikir.

Xeyala Messali Hadj yekîtîya sê welatên Mexrebê bû; ev yekîtî jî wê pêk nehata. Tûnisa Bourguiba, Fasa Muhemmed Bin Yûsif û Cezayîra Bin Bella yên serbixwebûyî, wê her yek ji wan bi rêya xwe de biçûya, û heta carinan bi hev biçûyana. Messali Hadj 3ê hezîrana 1974ê bêyî ku Cezayîrê careke din bibîne, ji vê dinyayê bar kir.

* Dîrokzan, nivîskarê berhema *Le Credo de l'Homme blanc. Essai sur les mentalités coloniales françaises / Amentûya Mirovê Spî. Ceribandina li ser Mentalîteyên Kolonyal ên Fransî,* Complexe, Bruksel, 1995.

(1) Messali Hadj, *Mémoires, 1898-1938 / Bibîranîn, 1898-1938* metnên ji alîyê Renaud de Rochebrune, Jean-Claude Lattès ve amadekirî, Parîs, 1982 ; Benjamin Stora, *Messali Hadj,* Le Sycomore, Parîs 1982.

(2) *L'Ikdam,* çirîya pêşîya 1927ê, Mahfoud Kaddache di berhema xwe de jê girtiye, *Histoire du nationalisme algérien,* berg I, Editions Paris-Méditerranée/EDIF, Parîs-Cezayîr, 2003.

(3) Bixwîne Mohammed Harbi, "La guerre a commencé à Sétif /Şerî li Sétîfê dest pê kir", di *Manière de voir* de, "Algérie, 1954-2011. Histoire et espérances / Cezayîr, 1954-2011. Dîrok û hêvî", sibat-adar 2012.

(4) Benjamin Stora, *berhema li jor navbirî.*

(5) *Heman çavkanî.*

(6) Gilbert Meynier, *Histoire intérieure du FLN / Dîroka navxweyî ya BANê,* Fayard, Parîs, 2002.

(7) Paul-Marie Atger, "Le Mouvement national algérien à Lyon. Vie, mort et renaissance pendant la guerre d'Algérie Tevgera neteweyî ya cezayîrî li Lyonê. Jîyan, mirin û vejîn di dema Şerê Cezayîrê de", *Vingtième siècle, Revue d'Histoire,* hejmar 104, çirîya paşîn-çile 2009

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.kurdishdiplo.org

Dema ku Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî hewl dida Xartûmê razî bike ku eskerên xwe ji navçeya li ser nehatiye li hev kirin Abyeiyê vekişîne, navberkarê Yekîtîya Afrîkayê Thabo Mbeki jî hewldanên xwe dewam kirin, lewra dîyar bû ku hevdîtinên di navbera herdu Sûdanan de wê ji nû ve dest pê bikin. Bawerîbihevneanîneke kûr Xartûm û Jubayê ji hev cihê dike, û lîstika milîsên xwecihî jî hewldanên lihevkirina alîyan hê zehmettir dikin.

PETROL, SÎNOR, DEYNÊ DEWLETÊ...

Jihevcihêbûna tahl a herdu Sûdanan

JEAN-BAPTISTE GALLOPIN *

23yê çileya 2012ê serokdewletê Başûrê Sûdanê Salva Kiir li pêşîya parlemanê ragihand ku desteya wezîran " *bi yekdengî biryar daye ku tevahîya karûbarên elaqedarî petrolê yên li Başûrê Sûdanê tavilê werin rawestandin, û petrola xam êdî ber bi Komara Sûdanê ve neherike* ". (1) Vê tedbîrê bersiv dida desteserkirina beşek ji petrola Başûrê Sûdanê bi destê Xartûmê, û bi vê jî alozîya li ser parvekirina hatinên ji hîdrokarburê di navbera herdu welatan de jî gihand asta herî bilind.

Ji bo komara ciwan a ku ji tîrmeha 2011ê vir ve ser bi xwe ye, petrol heyatî ye (2): Ew %98ê hatina birêveberîya wê pêk tîne. Di nav van şert û mercan de rawestandineke demdirêj a hilberandinê tehlûkeya jihevdeketina avahîyên dewletî yên ku jixwe rewşa wan nazik e, bi xwe re tîne, û piştî dehsalên şerê navxweyî derbeke giran jî li hêvîyên biîstîqrarkirina herêmê dixe (*kronolojîyê bixwîne*).

9ê tîrmehê wê kêlîya ku Sûdana Başûr serxwebûna xwe pîroz dikir, serokdewletê Sûdanê Omer El-Beşîr jî weke gelek birêveberên navneteweyî çûbû paytexta dewleta nû Jubayê. Hazirbûna wî li wir nîşan dikir ku Xartûm piştî gelek virdewêdeyan parçekirina welêt qebûl dike.

Dîsa jî gelek pirs bê bersiv man. Lihevnekirin nexasim li ser parvekirina hatinên ji petrolê, deynê dewletê û rewşa dawî ya xeta sînorê hevpar bûn. Birêkxistina ewlekarîya herêmî jî hê nehatiye çareser kirin.

Şerekî milîs ketî navê

Weha xuya dikir ku her du Sûdan neçar in li hev bikin. Li Bakur û li Başûr petrol yek ji çavkanîyên sereke yên dovîz û hatina ji bacê ye. Lê belê berîya hertiştî girêdana bi hev ve ya her du welatan a di vê sektorê de bi tevahî ye: Yek jê rezervan kontrol dike, ya din binesazîyên îxracatê. Bêyî erêkirina Xartûmê ya mafên derbasbûnê û rafînekirinê, her du jî niha xwe dixin ber krîzeke aborî ya di asta felaketê de.

Ji tebaxa 2010ê ve muzakerevanên her du alîyan li paytexta Etîyopyayê Addis-Abedayê ji bo hevdîtinên dawî li wan nayê û bêber dicivin. Di encamê de têkilîyên her du alîyan ji ber parçebûnên navxweyî yên elîtên birêveber her xirabtir dibin, ji ber meyla wan a lêzêdekirinê û bêkêrîya wan a rûbirûbûna bi pevçûn û alozîyên herêmî yên li deverên li ser sînor.

Di gulana 2011ê de artêşa Sûdanê navçeya Abyei ya ku li ser hê nehatiye li hev kirin dagîr kir, ango berîya bi serxwebûna fermî bi du mehan, ev yek jî destpêka krîzê bû. Statuya vê devera li ser sînor a ku xwedîya girîngîyeke pir kêm a stratejîk e, diviyabû bi referandûmeke şêwrê ya herêmî ku wê bi ya cihêbûna Başûr re bihata lidarxistin, bihata dîyar kirin. Lê belê Xartûm lidarxistina vê referandûmê asteng dike û xwedî li tevahîya deverê derdikeve. Ji lihevkirina aştîyê ya sala 2005ê û vir ve, şerê di navbera herdu artêşan de digihêjê asteke berê nehatî dîtin. Peyman dîyar e zelal e: Bakur amade ye ku xurtîya xwe ya eskerî bi kar bîne da ku li ser hevdîtinan serdest be.

Ango Artêşa sûdanî li dijî endamên Artêşa Gel a Azadîya Sûdanê dikeve nav liv û tevgerê (SPLA, tevgera serhildêr ya ku êdî li Jubayê desthilatdar e) ên li ser erdên wê – şeş hezar şervan li eyaleta bakurî Kordofana Başûr (3) û çar hezar û sed jî li eyaleta Bîla Şîn (4), her du jî cîranên Sûdana Başûr in û nufûsa wan ji ereban bêhtir efrîqî ye û hem çandî û hem siyasî nêzî Başûr in.

5ê hezîrana 2011ê artêşa Bakur û milîsên hevgirên wê êrişeke mezin li dijî endamên SPLAyê yên çekdar û neçekdar ên li Kordofana Başûr dan dest pê kirin. 1ê îlona 2011ê şer û alozî belavî Nîla Şîn jî dibe. Piştî gulebarana mala xwe, Malik Agarê ku SPLAa Bakur (SPLA-N) bi rê ve dibe, xwe vekişand nav daristanan û banga hilweşandina rejîma Xartûmê kir. 8ê îlonê îxtîlaf û cihêbûna xwe ya tevgera xwe û partîya li Jubayê desthilatdar ragihand. Şerekî nû yê navxweyî dest pê dikir.

Di wê navberê de hevdîtinên di navbera Xartûm û Jubayê de dewam dikin, pêre jî di qada aborî de bêyî ku dilê wan bi hev bişewite, şerê hev dikin. Ji gulana 2011ê ve Sûdan astengan li ser bazirganîya sînor a bi Başûr re ferz dike, para bêhtir a vê bazirganîyê jî xwe dispêre îthalatên ji Bakur. (5) Di tîrmeha 2011ê de herdu hukûmet bêyî ku li fikrên hevûdin bipirsin, her yekî pereyekî nû dixin bazarê. Rêjeya pevguherînê ya pereyê Başûrê Sûdanê û pereyê nû yê Sûdanê li ba dikeve, bêîstîqrar e, ji ber bêîstîqrarîya girêdayî hewaya krîza bacê û alozîya ku bankeyên navendî yên herdu welatan neçar dike destên xwe bavêjin rezervên xwe yên dovîzan ên ku ji xwe kêm û ji wan xerc bikin da ku pêşîyê li dêvaluasyonên mezin bigirin.

Her yek ji wan herweha hêza yekser, an jî neyekser jî bi kar tîne da ku bike yê din serê xwe bitewîne. Bakur alîkarîya lojîstîk û eskerî digihîne gelek komên milîsên serhildêr ên ku li dijî hukûmeta Başûrê Sûdanê şer dikin (6), û ji çirîya paşîn a 2011ê ve gelek caran erdên cîranê xwe bombebaran dike.

Hukûmeta Jubayê bi xwe li alîyê xwe zehmetîyê dikişîne ji bo dewamkirina xeyala veqetîna ji serhildêrên SPLA-Nyê. Serhildêrên SPLA-Nyê li gor dilê xwe Sûdana Başûr weke baregeheke pişt bereyê bi kar tînin, weke yên Tevgera ji bo Edalet û Wekhevîyê (JEM) ên ku beşek ji çekdarên wê ji Darfûrê vekişîyan û çûn Kordofana Başûr. Dawîya adara 2012ê, artêşa Başûr, JEM û SPLA-N bi hev re êrişeke hevpar li dijî Hegligê dan dest pê kirin, ev dever qadeke petrolê ya li sînor e, û êrişê jî asteke koordînasyonê ya berê nedîtî raxist ber.

Tewazûna bi tehlûke ji bo Pekînê

Wekî din SPLA-N û komên ji Darfûrê êdî hevgirên hev in di bin sîwana Bereya Şoreşger a Sûdanê (SRF) de û armanca wan guhertina rejîma Xartûmê ye. Tevlîbûna Başûr a nav SFRê zêde dibe û di serî de ya Pagan Amun (yekî ku nêzî birêveberên SPLA-Nyê ye) lihevnekarîya muzakerevanên Başûr dike ku mirov fikaran bike ku beşek ji elîta siyasî li Jubayê bûbe yek bi armancên wan re. Juba dizane ku dikare pişta xwe bide Îsraîlê jî, ya ku ji 1955ê û vir ve tilîya xwe xistiye nav meseleyê li alîyê serhildana Başûr. (7)

Welatên Rojava û Çîn hêvî dikin ku peymaneke dualî ya li ser mafên derbaskirina petrolê wê şerekî nû yê di navbera bakur û başûr de bê tesîr bike; lê belê hêzên mezin di mijara ferzkirina lihevkirinekê de bêkêr xuya ne. Washingtona ku alîkarîya wê ya dîrokî ya bi başûrîyan re û dijminahîya wê ya bi bakur re gihiştiye asta herî jor, dibîne ku qada wê ya manovrayê ji ber raya giştî ya biryardar dijmina Xartûmê ye, pir zêde kêm e. Bala çapemenîya amerîkî û kongreyê li ser binpêkirinên mafên mirovan ên bi destê artêşa Sûdanê yên li Kordofana Başûr e, ji ber vê jî ji bo birêveberîya Barack Obama ne mumkin e ku pêşnîyarî Sûdanê bike ku di berdêla aştîyeke bi başûr re rakirina –qismî jî be– mueyîdeyên amerîkî pêşnîyaz bike; ev mueyîde ji ber desteke Sûdanê ji terorîzmê re û paşê jî ji ber zextên li Darfûrê sala 1997ê û 2006ê hatibûn qebûl kirin. Qet nebe piştî salên jêrazîbûnê, Washingtonê xwe bi tevahî dayê ku zextê li Jubayê bike, û jê hat ku bike biryara 12ê gulana 2012ê ya ku gefa mueyîdeyan li her du Sûdanan dixwe, were dayîn.

Heçî Pekîn e, tevî têkilîyên wê yên xurt ên bi her du alîyan re, bandora wê jî ne dîyar e. Çîn aktora sereke ya sektora petrolê ye, di dema şerê navxweyî de li alîyê rejîma Xartûmê ew tevlî bipêşxistina sektorê bû, ji sala 2008ê û vir ve jê hat ku xwe nêzî Jubayê jî bike. Hewldanên wê yên li berçavan ên ji bo navberkarîyê bixwe bêencam man. Li cem hempîşeyên xwe yên rojavayî dîplomatên çînî hêrsa xwe ji ber neçarîya xwe derdibirin. Têkilîyên her du Sûdanan çiqasî xirab bibin, hewldanên pratîk ên tewazûnê yên Pekînê jî ewqasî zêdetir bi tehlûke dibin.

Astengên herêmî yên li pêşîya lihevkirinekê jî gelek in. Du lihevkirinên qismî yek jê li ser întegrasyona SPLA-Nê di nav lîstika siyasî ya Sûdanê de di hezîrana 2011ê de, û ya din li ser statuya welatîyên Sûdanê û Başûrê Sûdanê ên li ser erdên her du dewletan di sibata 2012ê de têk çûn. (8) Ya pêşî ya ku milê rastê yê el-Başîr ango Nafî Elî Nafî bi Agarê ji SPLA-Nê re muzakere li ser kirin, piştî ku hat mohr kirin bi sê rojan serokdewletê Sûdanê bi xwe nerazîbûna xwe jê derbirî. Ya diduyan ji ber şerên li ser sînor berhewa bû; guman hene ku ev şer ji alîyê SPLA-N û beşek ji artêşa Başûr ve hatibine organîze kirin da ku pêşîyê li nêzîkbûneke di navbera Bakur û Başûr de bigirin.

Tu garantîya wê nîne ku lihevkirineke li ser mafên petrolê wê têra aramkirina rewşê bike. Bi îhtîmaleke mezin ew ê bi ser nekeve ku dawîyê li şideta li Kordofana Başûr û li Nîla Şîn bîne, ku sedemên wê berîya hertiştî herêmî ne. Ango îhtîmal e ku sînorê di navbera herdu Sûdanan de van salên li pêşîya me bêîstîqrar bimînin.

* Lêkolînerê bispor e li ser Sûdanan ji bo rêxistineke navneteweyî ya parastina mafên mirovan e. Li vir ew ferdî xwe îfade dike û ne li ser navê rêxistinê.

(1) «Statement by H.E. Salva Kiir Mayardit, President of the Republic of South Sudan to the National Legislature on the current oil crisis», 23 janvier 2012, www.sudantribune.com

(2) Van berhemên li jêr bixwîne: Gérard Prunier, "Le régime de Khartoum bousculé par la sécession du Sud / Bi Cudabûna Başûr re Rejîma Xartûmê Serûbinîhev bû", û Marc Lavergne, "Chronique d'une indépendance annoncée / kronolojîya serxwebûneke ragihandî", *Le Monde diplomatique,* sibata 2011ê.

(3) «Report on the human rights situation during the situation in Southern Kordofan, Sudan», United Nations Mission in the Sudan (UNMIS), rapora navxweyî, hezîrana 2011ê.

(4) "In Need of review : SPLA transformation in 2006-2010 and beyond", Small Arms Survey, Genève, çirîya paşîn 2010.

(5) "South Sudan border row 'causing shortages'", 18 mai 2011, www.bbc.co.uk

(6) "Fighting for the spoils: Armed insurgencies in Greater Upper Nile", Small Arms Survey, çirîya paşîn a 2011ê.

(7) *li ber vê berhema li jêr bigire:* "Pourquoi le Soudan du Sud est un allié stratégique d'Israël / ji bo çi Sûdana Başûr hevgireke stratejîk a Îsraîlê ye", 20ê adara 2012ê, www.slateafrique.com

(8) "Sudan says cessation of support to rebels prerequisite to peaceful relations with south", 30yê adara 2012ê, www.sudantribune.com

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Kronolojî

1ê çileya 1956ê. Welat serbixwe dibe. Li başûrê welêt tebaxa 1955ê raperînekê dest pê kir.

Çirîya Pêşîn a 1964ê. Serhildaneke gel dawî li rejîma eskerî anî ku sala 1958ê hatibû ava kirin.

25ê gulana 1969ê. Darbeya eskerî ya di bin birêveberîya Gafar El-Nemeyrî de pêk hat.

Adara 1972yê. Li Addis-Abebayê ji bo bicihanîna xweserîyekê li başûr peyman hatin mohr kirin.

1983. Rejîma El-Nemeyrî biryar da ku şerîetê pêk bîne. Li başûr destpêka serîhildaneke nû ya di bin birêveberîya John Garang û Artêşa Azadîya Gelê Sûdanê (AAGS) de.

Nîsana 1985ê. Raperîna gel û dawîya dîktatorîya eskerî.

30ê hezîrana 1989ê. Buroyên îslamîstên ku Omar el-Başîr wan bi rê ve dibe, xwe li desthilatdarîyê radikişînin. Şerê bi başûr re dijwar dibe.

9ê çileya 2005ê. Mohrkirina peymanekê bi AAGSyê re ya ku li gor wê di nav pênc salan de referandûmeke dîyarkirina çarenûsa Başûrê Sûdanê wê bihata li dar xistin.

2011. Di çile de piranîya nufûsa başûr dengê xwe ji bo serxwebûnê bi kar anî û serxwebûn jî 9ê tîrmehê hat îlan kirin.

AHMET ASLAN: **Êdî Besê**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 100 x 100 cm

www.kurdishstudies.net

22ê gulana derbasbûyî di roja sedemîn a greva xwendekarên québecî yên li dijî zêdekirina xercên qeyda li zanîngehê de bi deh hezaran kes li Montréalê xwe pêşân dan. Parastina azadîyên gelemperî êdî bi qasî têkoşîna ji bo qebûlbûnê, mirovan seferber dike, di heman demê de hukûmeta Jean Charest qanûneka ku mafê xwepêşandanê sînordar dike da qebûl kirin

Tevgereke berê nedîtî li dijî zêdekirina xercên qeyda li zanîngehan

Berxwedêrîya xwendekarên québecî

Pascale Dufour *

Kêm caran me êrişkarîyeke ev qasî eşkere û bêşerm dîtîye li dijî mafên bingehîn ên ku li Québecê ji dehsalan û vir ve bingehê kirin û çalakîya civakî û siyasî pêk tînin. (1)" Komeke girîng a dîrokzanan di vê çarçoveyê de nerazîbûna xwe ji qanûna 78ê derbirî, Meclîsa Neteweyî ya Québecê ev qanûn 18ê gulanê di encama maratoneke qanûnçêkirinê de qebûl kir. Ev qanûn koma qanûnan a herî tepeserker pêk tînin ku li wilayetê ji çirîya pêşîn a 1970yê û vir ve hatine qebûl kirin. Hingê endamên Bereya Azadîya Québecê dîplomatekî brîtanî û wezîrê kar Pierre Laporte revandibûn.

Tu kesî bîra wê nedibir. Û dîsa jî % 40ê xwendekarên Québecê hê jî di boykotê de ne, hin jê ji 13ê sibata 2012ê ve. Bûyer gihîştiye wê radeyê ku hin analîst ji bûyerên çirîya pêşî ya 1970yê û vir ve behsa krîza siyasî ya herî giran dikin. Hingê endamên Bereya Azadîya Québecê Wezîrê Kar ê wilayetê Pierre Laporte revandibûn û kuştibûn. Doza tevgerê çi ye? Mafê gihîştina xwendina bilind û zanîngehan e, û ew dixwazin biryara hikûmeta lîberal ya Jean Charest a zêdekirina xerc û lêçûnên qeydbûna li zanîngehê betal bibe.

Bi xercên salane yên 2169 dolarî (1711 euro) – ango ji nîvê navînîya neteweyî jî kêmtir e -, zanîngehên Québecê di nav zanîngehên Kanadayê de yên herî kêm bi mesref in, pir zêde li pêşîya hin wilayetên ingilîzîaxêv ên weke Ontario, yan jî Colombie-Britannique ne; li van deveran xercên xwendina bilind di dewra pêşî de bi awayê navînî ji 6500 dolaran (5130 euro) bilindtir e. Sedema vê rewşa bi îmtiyaz biryar û tercîhên siyasî yên dema Şoreşa Rehet (2) in, hingê hukûmeta wilayetê zend û bendên xwe badabûn da ku elîteke fransîaxêv pêk bîne û destûrê bide demokratîkkirina nisbî ya xwendina bilind. Wê hingê xercên qeydbûnê li asteke gelekî kêm cemidandibûn, kolejên perwerdehîya gîştî û pîşeyî (Cegep) ava kiribûn da ku perwerdehîya pîştî xwendina navîn û berîya zanîngehê misoger bike, û di asta wilayetê de tevneke sazîyên xwendina bilind (Zanîngeha Québecê ya ku şaxên xwe ji Montréal heta bi Rimouskiyê, ji Chicoutimi heta bi Abitibi-Témiscamingue berdide) pêk anî. Bi serketineke vebirî: sala 1971ê % 66ê mirovên temenê wan di navbera 15 û 24ê de diçûn dibistanê; îroj ev rêje ji % 80yê dibihure. Ya ji vê jî bêhtir balkêş ew e ku % 45ê xwendekarên québekî ew in ku ji wan re nifşê yekem tê gotin –dê û bavê yekî/ê ji wan jî neçûye zanîngehê– ev rêjeya herî bilind e li Kanadayê. Sala 2006ê qederê % 40ê wan ji maleke ku hatina wê salê kêmtirî 50 000 dolaran e û ji pênc paran pareke wan jî li gundan mezin bûye. Zêdebûna xercên dibistan û xwendinê yên ku Charest biryara wan da, dikare destketîyên bi vî rengî mehû bike: li gor Komîteya Şewirmendîyê li ser gihîştina madî ya zanîngehê (komîteyeke girêdayî wezareta perwerdeyê ye, lê belê xweser e) zêdekirina xercan a ku pêş tê dîtin, dikare çûna zanîngehê li ber heft hezar xwendekaran bigire (qederê % 2.5ê tevahîya xwendekaran pêk tînin).

Ev cara yekem nîne ku modela kêbekî ya xwendina bilind ketiye ber lêpirsînê. Bi biryara xwe ya betalkirina cemidandina xercên zanîngehê ya sala 1968ê, hukûmeta lîberal a Robert Bourassa sala 1989ê agirê vê mijarê gur û sor kiribû. Hingê xercên zanîngehê pir zêde bûbûn: Di nav çar salan de xercên ku salê 504 dolar bûn, gihiştibûn salê 1668 dolaran. Şeş salan piştre serokwezîrê serxwebûnparêz Jacques Parizeau ji vê biryarê vegerîya; lê belê ji destpêka salên 1990ê ve zanîngeh dikarin li ser xwendekaran "xercên navendî" ferz bikin –yên ku tevahîya lêçûnên birêveberîyê, yên pirtûkxaneyê, birêveberîya dosyayan, bikaranîna navendên sporê û çandê û hwd. pê tên finanse kirin– û ev xerc li xercên qeydbûnê zêde dibin. Li gor sazîyê mîqdara vê xercê diguhere, lê belê li derdora salê 650 dolaran e.

Sendîkayên xurt ên zanîngehan

Sala 2007ê, hinekî berîya kampanyaya hilbijartinê, hukûmeta Charest zêdekirineke xercan a pêşî da zanîn, di nav pênc salan de xerc wê 500 dolar bihatana zêde kirin, bi vî rengî fatûraya qeydbûna zanîngehê gihîşte asta xwe ya niha. Piştre serokwezîr biryar da xercan careke din zêde bike, rêbaz û rêveçûnên wê jî di "hevdîtineke hevkarên qada perwerdehîyê" de (3), kanûna 2010ê hatin nîqaş kirin. Navendên sendîkayan û federasyonên xwendekaran bi lez bernameya nîqaşên hukûmetê ferzkirî, eşkere kir.

Sê mehan piştre, 17ê adara 2011ê hukûmeta Québecê encama hizirînên xwe da zanîn: Zêdekirineke xercan a % 75 di nav pênc salan de. Bi vî rengî mîqdara mesrefên xwendinê ji bo salekê wê bigihêje 3793 dolaran, di vî hesabî de veguherîneke muhtemel a xercên navendî jî nîne. Armanca hatî dîyar kirin: Gihiştina asta xercên xwendinê piştî îndekskirina sala 1968ê ye. Beşek ji pereyên ku wê ji zêdekirina xercan werin bi dest xistin divê tesîrê li bernameyên dewletê yên deyn û bûrsan bike. Ji bo ji çar paran yekê xwendekarên tevahîya rojê zanîngehê dixwînin, wê deynê bi krêdîyê û bûrs vê zêdekirina xercan fînanse bikin; ji her heşt xwendekaran yek jê wê neçar bimîne bêhtir pereyan deyn bike û yên mayî jî, ango % 60 jî wê bi derfet û navgînên xwe li çareya serê xwe binêrin.

Vê biryara ku çav li rê ye îlona 2012ê bikeve meriyetê, tevgereke protestoyê da dest pê kirin, û zehmet e ku mirov bibêje ev ne tevgereke dîrokî ye. Gotegotên li ser destpêkirina boykoteke biharî ji payîza 2011ê ve bi gewde dibin. 15ê gulana 2012ê sed û pêncîûşeş hezar xwendekar (hejmara gîştî ya xwendekaran çarsedhezar e, di nava vê hejmarê de sazîyên ingilîzîaxêv ên ku wê bikevin ber heman pêkanîn û rejîma perwerdehîyê jî hene) çardemîn hefteya xwe ya boykotê dan dest pê kirin (boykota heta niha herî zêde xwendekar tevlîbûn a 22ê adarê bû, dused û bîstûpênc hezar xwendekar tevlî boykotê bûbûn). Li gor polêsê Montréalê ji destpêka alozîyê ve sedûheftê xwepêşandan li bajêr pêk hatine: Tiştekî wisa berê qet nehatiye dîtin.

Ev serketin xwe bi xwe qismî bi hêza rêxistinên xwendekarên Belle Provinceê rave dike. Ji salên 1980yê û vir ve, ew dikevin ber qanûna li ser bawerîpêdana komeleyên xwendekarên dibistanan û zanîngehan û bi vî awayî ji statuyeke pir taybet a di nav cîhana rojava de sûdê werdigirin: Ew li gor mentiqekî mîna yê sendîkayên karkeran dixebitin, di van sendîkayên karkeran de mûçegirên "yekeyeke bawerîpêdanê" mehaneyên endametîya xwe didin sendîkaya xwe bi xwe. Em bi awayekî din bibêjin, komeleyên xwendekaran dewlemend in, xwedî hêz in û pir zêde rêkxistî ne. Li gor prensîpa serê yekeyê yekdestdarî, herkes divê endamê/a yekê ji wan be: Weke mînak xwendekareka/ê beşa Zanista Siyasetê ya Zanîngeha Montréalê mecbûr e ku endamê Komeleya Xwendekarên Beşa Zanista Siyasetê û Lêkolînên Navneteweyî be. Her rêxistin bi xwe jî girêdayî federasyonekê ye. Bi vî awayî mafê xwendekaran heye di dema civînên giştî de dengê xwe bi kar bînin, ku bi xwe biryarên xwe li gor piranîyê dide.

Federasyon bi awayekî gelekî desantralbûyî dixebitin, ewqasî desantral in ku di heman fakulteyê de hin beş dikarin di boykotê de bin û yên din jî pêkhatina normal a dersan misoger bikin. Lê belê di dema alozîya xwendekaran a 2005ê de (li ser mijara deyn û bûrsan bû) parçe bûn, ji hingê ve rêxistin bi awayekî xurt piştgirîya hev dikin –bi birêvebirina krîzê ya wezîrê perwerdê yê îstîfa kirî Line Beauchamp û serokwezîrê ku hê pir dûr e ji vemirandina vî agirê gur û geş ê protestoyan û heta para wî heye di tundrewkirina helwêstan de, xwendekar bêguman xurt bûn.

Bi vî awayî, ji bo ku hukûmet qebûl bike bi rêxistinên xwendekaran re rûne û fînansekirina zanîngehan nîqaş bike, diviyabû du mehên boykotê derbas bibin, hukûmetê herweha bi girîngî îşaret pê kir ku ew ê li ser mijara xercan hevdîtinan neke. Nîqaş hê roja duyem têk çûn. Tevger xwe hişktir dike: Ji 25ê nîsanê û pê ve her êvar xwepêşandan pênc ta deh hezar xwendekaran li rê û kolanên Montréalê dicivînin. 27ê nîsanê hukûmet pêşnîyaz dike şertên standina deyn û bûrsên dewletê siviktir bike, herweha ji nû ve dabeşkirina li salan a mîqdara zêdekirî jî pêşnîyaz kir: Şûna salê 325 dolar di pênc salan, salê 254 dolar di heft salan de... ango li şûna 1625 dolarên ku pêşî dihatin pêşdîtin bi gişt wê xerc 1778 dolaran zêde bibin!

Hêrs û qehreke mezin digire boykotvanan û ew "*piçûkdîtin, quretî û bitrîtîya*" hukûmetê lê eşkere kirin. Pevçûn xwepêşandêran û hêzên nîzamê tînin hemberî hev, nexasim jî roja 4ê gulanê. Wê rojê serokwezîr biryar da ku banga hevdîtineke bi tevahîya alîyên elaqedar re bike, di nav van alîyan de wê navendên sendîkayî û rektor jî hebin. Di dawîya bîst saetên muzakereyan de lihevkirinek hat mohr kirin, ku di cewherê xwe de derfet û îhtîmala kêmkirina xercên navendî dihewîne (û ne ya xercên xwendinê). Komeleyên xwendekaran hefteya piştre ev lihevkirin bi dijwarî red kir. Weha dîyar bû ku çareya krîzê nebû, û gumanên cidî hebûn li ser îhtîmalên ducarîkirina dersên wendakirî berîya ku dersên sala din di payîzê de dest pê bikin. Xwendekarekî beşa fîlozofîyê weha analîz dike "*boykotvan niha pê dihisin ku êdî tiştekî din ku ji dest bidin nemaye. Jîyana wan bi awayekî xwezayî girêdayî encama vê tevgerê ye. Gewîtî û quretîya hukûmetê û qedera reş a ku ew ji me re vediqetîne, divê têra seferberîyê bikin.*"

Der barê maneya kirina hukûmetê de, gelek hîpotez hene ku mirov li ser dipeyivin. Ji bo hinan tercîha hişkbûnê –heta serhişkîyê– dikare weha were rave kirin: Ev alozî herî zêde ciwanan seferber dike, ango beşê nufûsê yê ku rêjeya wê ya tevlîbûna hilbijartinan herî kêm e (qederê % 30ê wan dengê xwe didin) û ne ew derdorên xwedî îmtiyaz in li cem partîya li desthilatdarîyê. Hinên din alîgirên wê fikrê ne ku ev stratejî dibe ku bike serokwezîr hilbijartinan di çarçoveyeke krîzê de bide dest pê kirin, û berîya ku payîzê pevçûnên din bi qerpika wî bigirin, nexasim jî bi Komîsyona Lêkolîna li ser Pîşesazîya Avahîsazîyê ku îhtîmal e rastî û namûsa hin wezîrên lîberal bixe ber lêpirsînê. Hinên din ku bêhtir rexnegir in, binê jênehatîbûn û bêkêrîya desthilatdarîyê di birêveberîya pevçûnên van salên dawîyê de xêz dikin, weke mînak di qada jîngehê de: desthilatdarîya ku bi seferberîyeke xurt re rûbirû bû, neçar ma li hin biryarên xwe vegere, yên weke taybetkirina parkeke neteweyî, yan jî avakirina santraleke termîk a bi gaza xwezayî dixebite. Gelo wê di hesabê kapasîteya seferberî û xwegirtina tevgera xwendekaran de şaşî nekir?

Mafê kolektîf ê zanînê

Doz û kêşeyên vê têkoşînê ji sînorên zêdekirina xercên qeyda li zanîngehê dibihurin. Tevî ku krîza aborî ya sala 2008ê derbeke di asta ya li cîranê wê yê amerîkî xistî li Québecê nexistibû jî, modela civakî ya québecî hem di axaftinan de û hem jî di kirinan de her çû bêhtir kete ber lêpirsînê. Her çû bêhtir xizmetên dewletê bûn bi pere, nexasim jî yên qada tenduristîyê; buhayên elektrîkê zêde bûn; mentiqê rikeberîyê û pêşbazîyê xistin nav birêveberîya sazî û dezgehên dewletê. Ev yek jî yekbûna aktorên din bi doza xwendekaran re rave dike: Navendên sendîkayî, lê belê herweha di serî de koalîsyonên demî yên ku ji bo vê dozê hatin damezrandin ên mîna "Dê û bav li dijî zêdekirina xercan" û "mamosteyên li dijî zêdekirina xercan" bi taybetî çalak in. Hevgirtinên yekcarî gelek caran kirin ku xwendekar dengê xwe bi yên tevgerên din re bikin yek: 22yê nîsanê ji bo Roja Dinyayê ya ku sêsed hezar mirov li parka Mont-Royalê civandin, di meşên 1ê gulanê de, û hwd.

Wê şaşîyek be heke mirov di tevgera xwendekaran de texlîdeke ya ku li Şîlî yan jî li Spanyayê qewimî bibîne. Rewşa ciwanên québecî pir kêm dişibe rewşa ciwanên spanî. Guman tê de nîne ciwan li gor beşên civakê yên mayî, di bin barê bêkarîyeke mezintir de ne (bêkarî di nav mirovên temenê wan di navbera 15 û 24ê de % 14 e, navînîya bêkarîyê ya neteweyî bixwe % 8 e), lê belê siberoj bi wan weke ku bi tevahî xitimîbe xuya nake. Ya ku ew kirine nav tevgerê bêhtir awayekî îdeala siyasî ye, ew jî têkelhevîyeke zana ya şerê li dijî bazarîkirina perwerdeyê, ji bo mafê kolektîf ê zanînan û heqîya civakî ye.

Encam çi dibe bila bibe, têkoşîna xwendekaran a bihara 2012ê wê bibûya vektoreke siyasîbûnê ji bo nifşekî sihê, lê belê herweha vektoreke qutibbûna di nav civakeke québecî ya pir parçebûyî de jî. Ji destpêka tevgerê ve, anket nîşan didin ku qederê nîvê mirovên tevlî anketa bûne destekê didin tedbîr û gavên hukûmetê û nîvê din jî wan red dikin. Di nav partîyên muxalefetê de Parti Québecoise (sosyal demokrat û serbixwebûnxwaz e) li dijî zêdekirina xercan e û soz da heke di hilbijartinên bê de bi ser keve, ew ê zêdekirina xercan betal bike; partîya çepgir Québec Solidaire [Québec a Piştgir] ji bo belaşbûna xwendinê dixebite; û Koalîsyona Paşeroja Québecê (CAQ) ku partîyeke nû ya rastgir e, destekê dide biryara hukûmetê.

Di nav xwendekaran bi xwe de jî vê alozîyê rê li ber bendên cuda vekir. Komek hat damezirandin ku dijbera boykotê û alîgira zêdekirina xercan e: Tevgera Xwendekarên di warê Civakî de Berpirsîyar. Endamên wê di qada kolektîf de kêm rêkxistî ne, wan berê xwe da dadgehan, li wir ew mafê xwe yê ferdî yê ketina dersan û mecbûrîyeta zanîngeh û Cegepan a dana van dersan, derdixin pêş. Rojnameya bi navê *La Presse* dawîya nîsanê bêhtirî bîstûpênc daxwazên fermanê yên ku ji bo destpêkirina dersan û hin caran jî ji bo qedexekirina xwepêşandanan li kampusa zanîngehê, arguman jî yan aborî ne (zirara aborî ya elaqedarî dirêjbûna trîmestrê û zirara muhtemel a karekî havînê) yan jî zanîngehî ne (payîza bê qebûlkirina nava bernameyeke ku hejmara beşdarên wê bi sînor e.) (4) Tevî ku ev daxwazên fermanê pêk dihatin, bi awayê giştî rêz ji wan re nedihat girtin, ji ber vê jî alozî zêde dibe, pêre jî zexta polês a li dijî boykotvanên li zanîngeh û dibistanan; ev jî pirsên kûr ji tevahîya civakê dike: Guhnedan û encama wê, zora huqûqî, gelo divê ew banal bibin? Gelo rewabûna kolektîf a tevgera boykotê divê xwe li ser mafên ferdî yên "berxwurên xwendinê" ferz bike?

* Profesor e li beşa zanista siyasî ya zanîngeha Montréalê (Kanada). Gotar xwe dispêre lêkolînên Louis-Philippe Savoie yê ku namzedê mastirê ye di beşa zanista siyasî ya zanîngeha Montréalê de.

(1) Di vê çavkanîya de jêhatiye girtin: Jean-François Nadeau, "Les historiens québécois dénoncent la loi / Dîrokzanên Québecî gazinan ji qanûnê dikin", 18ê gulana 2012ê, Ledevoir.com

(2) Bixwîne Benoît Bréville, "La Révolution tranquille n'a pas eu lieu / Şoreşa Rehet pêk nehat", *Le Monde diplomatique,* çirîya paşîn a 2010.

(3) Ango birêveberîyên zanîngehan, derdorên karsaz, derdorên sendîkayî, derdorên xwendekar (bi tenê Komeleya ji bo Piştgirîyeke Sendîkayî ya Xwendekaran KPSX ne tê de, lewra wan hevdîtin boykot kir), herweha du çavdêrên ji muxalefetê.

(4) "Grève étudiante: les demandes d'injonctions pleuvent / Boykota xwendekaran: Barana daxwazên fermanê", *La Presse,* Montréal, 28ê nîsana 2012ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Cuntaya burmayî li kincên sîvîl digere

Renaud Egreteau *

Di 13ê çiriya paşîna dawîn de, generalên serkar, Aung San Suu Kyi bi pey dawîbûna cezaya wê ya hefsê re azad kir û civîna wê ya giştî asteng nekir. Bi vê yekê, ew hêvî dikin ku dê bi welatên biyanî re nîqaşên li ser rahiştina ambargoya rojavayî vebin. Di warê siyaseta navxweyî de, wan jî rîskeke mezin negirt: hilbijartinên meclîsî beriya vê gavê pêk hatibûn.

Digel lidarxistina hilbijartinên meclîsî, di roja 7ê çiriya paşîna 2010ê de, cunta burmayî bê navber pêkanîna *«nexşeya rê* [ya xwe] *ber bi demokrasiyeke rêzkirî»* domand. Hefteyek bi şûn ve, wê muxalifa bi navê Aung San Suu Kyi rizgar kir ; ev jî bû sedema şadiyeke mezin, lê belê ev şadî rastiyeke girîng jî vedişêre : digel pêşketinên kûr û hûrgilî, bergeha siyasî ya welêt hê jî di bin serdestiya hêzên çekdar *(Tatmadaw)* de ye. Gellek kes weha difikirin ku ev dengdana sexte, digel tevahiya pêvajoya guherînê ya ku cuntayê di 2003ê de da destpêkirin (1), bi tenê bi kêrî piştrastkirina rola siyasî ya dîktatoriyeke leşkerî ya dijwextî tê. Ev çavdêriyeke balkêş e, lê ew guherînên kûr ên neteweyî û herêmî, ku hem di refên artêşê de û hem di muxalefetê de pêk dibin, vedişêre.

Artêş, saziya tenê ye ku rêxistinkirî û hiyerarşîzekirî dixuye ; ew di hemû beşên jiyana siyasî, aborî û heta jiyana çandî jî serdest e, û ji nîv-sedsalekê ve, li ser makîneya dewleta bîrmanî hikumdar e. Yekîtiyeke muxalîfan tuneye ku bikare li dijî serdestiya artêşê derkeve, heta seroka Lîga Neteweyî ya ji bo Demokrasiyê (LND), Aung San Suu Kyi pê naşê jî. Şerrê hindurîn ya ku bi dehan salan domand, şûn û warekî jeopolîtik a taybet, di navbera Hindistan û Çînê de, her weke irf û adetên artêşparêz ên mîrata têkoşîna dij-dagirkerî û heyraniya Japona imparatorî, ji serxwebûna 1948ê û pê ve, hemû bûn sedema kêmaniyeke saziyên dijber.

Hingê, pirsgirêka Bîrmanyayê ne ew e ka gelo ew ê çawa demokrasiyeke pêşketî zû bi zû şûna dîktatoriyeke leşkerî bigire, xelatgireke Nobelê ya bi nav û deng serkêşa vê demokrasiyê be jî. Kêşe bêhtir ew e ka bê artêş dê çawa pêş de biçe û ji pergaleke desthilatê ya «pretorî», rasterast û teva, derbasî şiklekî «pretorîtî» ya endîrekt bibe, û dê çawa redkirina tevahiya serdestiya leşkerî bipejirîne. Dibe ku, di demdirêjiyê de, ev naskirina pirralî û jiholêderketina civakeke sîvîl bi encamê demokratîkbûneke gav bi gav be. Demokratîkbûneke bi vî rengî ji xwe pêwîst e, ji bo rêlibergirtina krîmînalîzebûna zêde ya dika bîrmanî (derûdorên bazirganî yên mafyayî, baronên tiryakê yên herêmî, milîsên nijadî yên çekdar...), ku ji berê ve xwedan meylên şîddeta siyasî ye. Anuha, welat ji ber pevçûnên siyasî û aborî yên li dor vê îxtîdara leşkerî ya serdest, tê çirrandin. Îhtîmal nîne ? Belkî, lê hilbijartinên dawî tevlî vê dînamîkê dibin ; di rastiyê de jî, ew dibin qonaxa pêncemîn (ji heft qonaxan) a stratejiyeke guherîner in, ku vê stratejiyê jî di 2003ê de dest pê kir. (2) Hêjayî gotinê ye ku Aung San Suu Kyi bi xwe pêwîstiya «guherînekê» înkar nake: *«Ez daketina leşkeran naxwazim.* (...) *Ez dixwazim ku leşker, bilindahiyên bi namûs ên pîşeyîbûn û welatparêziya resen hilkişin.»* (3)

Digel îmhayên dubarekirî yên dehsala dawîn, ku hiyerarşiya leşkerî nû kir bi vederkirina hemû insûrên guherîner ên muhtemel, cunta anuha di nav meztirîn guherandina nifşa xwe de ye. Her du reîsên mayî yên darbeya 18ê îlona 1988ê, generalên Than Shwe û Maung Aye, di heftê saliya xwe de ne û derketina ji serê dîkê, digel klanên xwe yên malbatî û şebekeyên piştgirên xwe yên sîvîl û aborî jî, hazir dikin. Heta nuha, ji nav kesên nûhatî, kesayetiyeke karîzmatîk derneket - ne ewle ye ku ew ê di salên bê de derkeve jî, ji ber ku yên pêşî dixwazin leyistikên bandordariyê di «desthilateke bê rû» û taze de tune bikin.

Bi sazkirina meclîseke du odeyan, çardeh hikumet û meclîsên herêmîkirî - her sêzdeh herêmên leşkerî hê jî hene -, dê zemînê siyasî-leşkerî ya dehsala bê komplekstir bibe. Di serê birêvebirên nuha de, ev pêşketin dikare hevsengiya hêzan pêk bîne û, bi vî rengî, rê li ber reqabetên navxweyî bigre û bihêle ku ew, gav bi gav, dev ji desthilatê berdin. Di heman demê de, hikûmetê derbasî pergaleke weha bibe ku hê jî otokratîk e, lê ku desttêwerdana artêşê tê de bi dirûveke sîvîl digre. Ev yek dê bi rêya saziyeke weke Partiya destbiratî û pêşketina yekîtiyê (USPD) ya nû çêkirî, û derûdorên bazirganiyê ku dê ji bo parastina berjewendiyê desthilatê bixebitin, pêk were. Bi vî awayî, artêş jî dixwaze fersendên nû bide endamên xwe û serokên şîrketên ku heta nuha piştgirî dayê.

Ji destpêka salê ve, çend guherîn di sinifa birêvebir de pêk hatin, û ev pêvajo dê bidome jî. Wekî din, ferdîkirina şîrketên dewletê di sibata 2010ê de dîsa dest pê kir, nemaze di beşên enerjî, îdareya keştîgehên deryayî û banqeyan de. Ev diyarde, bi guherînên naxweyî ve girêdayî, lewre jî ku fersendên dewlemendbûna tazmînî pêşkêşî efserên «malnişîn» an malbatên xwe dikin. Pirr ji wan dibin xwediyên şîrketên îthalat û îhracat, komunîkasyon, beşê neftê an şebekeyên banqî, ku berê di destên artêşê de bûn, û hewl didin ku trostên nû pêk bînin - belkî ew ê werin reqebeta lîstikvanên aborî yên heyî, weke Htoo Group a şîrketçêkerê Tay Za, bikin.

Weke li Endonezya an Taylandê, alîkariya muşterîperest a ji bo endamên berê yên artêşê ku bûn bazirgan, asteke ewlehiyê li îxtîdara bicîhbûyî mîsoger dike. Armancê vê stratejiyê ev e ku rê li ber sazkirina hêzeke muxelîf a medenî, ku dê ji kevneleşkeran pêk bê, bigre : bi vî awayî, ew bêhtir bi îdareya mîrata xwe mijûl dibin, û neçar in ku digel derdora dewletê ya monopolîstîk, ku hê jî di warê aboriya resmî de serdest e û parvekirina dewlemendiyan bi rê ve dibe, têkiliyên baş biparêzin. Lê belê serkeftina vê stratejiya guherînê ewle nîne : birêvebiriya hêzên aborî

Ahmet Aslan: **Ji bo Wan (Min dît)**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 50 x 50 cm

yên di mezinbûnê de, li derdora leşkerî û li derveyî wê, dikare bibe sedema reqabetên bandordariyê û ji ber vê jî, kêşeyeke dijwar bibe.

Hin çavdêr weha texmîn dikin ku bi lidarxistina hilbijartinan, çiqas kontrolkirî bûbûn jî, ji bo ku kincên sîvîl li xwe bikin, generalan bi tenê unîformaya leşkerî bi *longyi* ya adetî ya siyasetmedarên burmayî guharrandin : bi gotineke din, ev her tiştê berê ye. Lê ev tehlîl zêde teng e. Ji nû ve sazkirina makîneya dewletê, ku dê bi pey hilbijartinan re were, tiştekî bixweber nîne ; ihtimal e ku bihorîna ji leşkerî bo medenî, û bergeha siyasî-leşkerî ku tê xuya, dê tansyonên navxweyî yên nû di nav îxtîdara bicîhbûyî de çêbikin (helbet jî, bêyî ku rûniştandina saziya pretoriyan bixin xetereyê).

Weke mînak, dabeşbûna rolan li navbera hiyerarşiya leşkerî, ku heta nuha xwedan tevahiya îxtîdarê bû, û makîneya wê ya nû, medenî û meclîsî, ku nûn êrê wê yê sereke PSUD'ê ye, dê çawa pêk were? PSUD, çend meh berê, ji Komeleya ji bo destbiratî û pêşketina yekîtiyê (USDA) saz bû, ku ji 1993ê û pê ve, serkêşê vê komeleyê jî Than Shwe bû ; komele jî di nava refên artêşê de piçûk tê xistin - tevî ku her askerek mecbûr e endamê wê bibe. PSUD ji kevneefserên cuntayê, giregirên sîvîl û bazirganan pêk tê. Surpriz çênebûn û ev partî di hilbijartina 7'ê çiriya paşînê de bi ser ket (encamên resmî hê jî nehatin îlankirin), lê divê têkiliyên wê yên digel artêşê ji bo salên bê bên diyarkirin, her weke pêwendiya wê ya digel tevgerên din ku nêzî leşkeran jî tên nasîn, mîna Partiya yekîtiya neteweyî (NUP), ku di hilbijartinên 1990î de weke « partiya artêş û desthilata berê » hatibû mehkûmkirin, lê ku dê, di meclîsên pêşerojê de, bikaribe rola hakimeke biryardêr bileyize.

Wekî din, dê pêwendî çi bibin navbera payebilindtirîn efserên *Tatmadaw*'ê - nifşa nû ya generalên Myint Aung, Ko Ko, Min Aung Hlaing û Kyaw Swe, hemî li der û dora pêncî salî - û mirovên pêşiyên wan, wekî kevnegeneralên Thein Sein, Thura Shwe Mann (Thiha Thura), Tin Maung Myint Oo û Maung Oo, ku hemû hatin teqawîdkirin (ji xwestin an jî mecburiyetê) da ku tevlî lîstika meclîsî ya nû bibin, û hemû hatin hilbijartin ? Dê reqabeta berjewendiyan navbera klanan, û nemase navbera fermandarên sêzdeh deverên leşkerî, ku hê jî ji hêla desthilata navendî ve tên wezîfedarkirin, û *Chief Ministers* (wezîrên serek) ên çardeh yekîneyên federalkirî yên welêt - sînorên yekîneyên federal ne weke yên deverên leşkerî ne -, ku dê werin hilbijartin, çawa çareser bibin ?

Hilbijartinên 2010ê li dijberiyên nava muxalefeta demokratîk jî zêde kirin; (4) ew ê nikaribe li dora karîzma Aung San Suu Kyi û partiya wê ya dîrokî, LND (ku nuha derveyî zagonê ye), xwe kom bike. Bi saya dengdana dawî, hêzên demokratîk ên din ji holê derketin: wan biryara boykotê red kir û bi talîmatên Aung San Suu Kyi'yê nekir : ew beşdarî lîstika hilbijartinî ya cunteyê bûn. Ji nav van quwetên nû, Hêza demokratîk a neteweyî (NDF), ku serokê wê yê sereke Khin Maung Swe ye, kevnegirtiyekî siyasî ya LND'ê ku 2008'ê rizgar bû, pêşeng e. Rûyê nû yê muxalefeta zagonî, ku ji dengdana pêşîn a di bîst salan de derket, pêşdîtina nakokiyên navxweyî di navbera aliyê pragmatîk (hilbijartiyên nû) û yê îdealîst (LND) dide xuyakirin. (5)

Di pêşerojê de, nîqaşên siyasî yên navxweyî dê li dora girîngî û rola parlementerên nû pêk bên. Ev yek dê di derdorên demokrat an nijadî de, ku bi pey tevlîbûna hilbijartinan re, bûn xwediyê esaseke «zagonî» a îfadeyê (ne weke LND'ê), bê nîqaşkirin jî. Tevî hindikahiya kursiyan ku di dengdana çiriya paşînê de hatin bidestxistin, hêzeke muxelîf a ji LND'ê cuda - çiqas têvel û di warê îdeolojiyê de bilêvakirî bibe jî - anuha ji hêla hikumetê ve tê naskirin. Derdorên çalakvan xwediyê zemîneke kiryarê ne ; ev zemîn teng e, lê qet nebe zagonî ye. Bes, gelo hiyerarşiya artêşê - ya nuha û ya paşê jî - dê bixwaze digel vê muxalefeta nû ya «resmî» bixebite, digel ku ew rexneyên tund li desthilatê bike jî?

Hilbijartina 7ê çiriya paşînê ji xwe rewş paş ve neavêt (lê pêş de nexist jî). Muxalefet nuha bi awayekî vekirî pirralî ye, û girêdana wê ya digel Aung San Suu Kyi'yê kêm bû. Ev yek dixwaze, weke di dema rizgarbûna wê ya 1995 û 2002ê de, li ser heyecana xelkî ya piştî rizgarbûna wê ya sêyemîn, stratejîyeke yekîtî û serkeftî saz bike ; lê îcar, ew ê zehmet bibe. Belkî ew ê bêhtir bikaribe civata navneteweyî, ku heyrana karîzma wê ye, û Bîrmanyayeke ji mêj ve tecrîdkirî, li hev bîne.

Hêdîtiya demokratîkbûna Bîrmanyayê tesaduf nîne. Ew li gorî dîroka wê ya demên dawî ye. Her ku diçe, weha xuya ye ku generalên bîrmanî tevnên stratejîk ên dunyaya îroyîn baştir fêm dikin û bi kar tînin, û di heman demê de, ew wan li gorî çanda siyasî ya civaka xwe ditewînin. Bila em ji bîr nekin ku, beriya ku leşker an sîvîl bin, ew bi qasî Aung San Suu Kyi'yê jî burmayî ne.

* Lekolînerê Zanîngeha Hongkongê, nivîskarê Histoire de la Birmanie contemporaine: le pays des prétoriens (Dîroka Bîrmanyaya hemdem: welatê pretoriyan), Fayard, Parîs, 2010.

(1) Bnr. André û Louis Boucaud, « En Birmanie, des élections au bout du fusil » (« Li Bîrmanyayê, hilbijartinên di bin siya tifingan de »), *Le Monde diplomatique*, çiriya paşîn 2009.

(2) Nexşeya rê weha diçe : (1) Civandina Konvansiyoneke Neteweyî, bi peywira nivîsandina Destûreke nû (2004-2007), (2) Avêtina gavên pêwîst ên ji bo sazkirina desthilateke demokratîk (2007), (3) Redaktekirina Destûrê (2007-2008), (4) Lidarxistina referandumeke destûrî (10'ê gulana 2008'ê), (5) Lidarxistina hilbijartinên meclîsî, li gorî rêbazên Destûra nû ya pesendkirî (7'ê çiriya paşîna 2010'ê), (6) Civandina meclîsên nû yên neteweyî û herêmî, (7) Sazkirina Neteweyeke hemdem û demokratîk, ku serokdewletek û hikumetek - ji hêla meclîsê ve hilbijartî - wê îdare dikin.

(3) Agence France Presse, 15 çiriya paşîn 2010.

(4) Gellek herêmên etnîk tev li dengdayinê jî nebûn, weke herêmên karen, kaşîn û wayê.

(5) Di hilbijartinên 27'ê gulana 1990'ê de, LND % 59'ê dengan û % 82'ê kursiyên Meclîsê bi dest xistibûn. Cuntayê tu carî ev encam nepejirandin.

Wergera ji fransî: Simko Destan

www.arsivakurdi.org

Ji nû ve hilbijartina Daniel Ortega weke serokdewletê Nîkaraguwayê di çirîya paşîn a sala 2011ê de xweş bicihbûna çepê li beşeke mezin a Amerîka Latîn piştrast kir. Beridîna desthilatdarîya hê nû ya sandînîst, nexasim jî li ser pirsa mafên jinan, di vê navberê de astengên mentiqekî rohnî dike yê ku carinan hêzên pêşverû neçar dike dev ji hin prensîpên xwe berdin da ku desthilatdarîyê ji dest bernedin.

Hem patron û hem xizan hatine razîkirin

Çepeke rengjêçûyî li Nîkaraguwayê xurt dibe

Maurice Lemoine*

Ahmet Aslan: **Hişmendîya spontane 2**, li ser tuwalê teknîka tevlihev, 100 x 100 cm

Hin kes stranan dibêjin, hin kesên din afîşan hildigirin, hinên din jî heta ji wan tê, bangî kesên li rêzên pêş dikin ji bo bimeşin. 3ê kanûna 2011ê, nêzî Desteya Bilind a Hilbijartinê (DBH), li Managuayê, xwepêşandan bê teşqele tê li dar xistin. Dema **Fabio Gadea** dest bi axaftinê dike, rewş hinekî aram û bêdeng dibe. Nûnerê Partîya Lîberal a Serbixwe (PLS), ê bi rêjeya %31ê dengan di hilbijartina serokatîyê de dibe duyem, li himberî serkeftina namzedê Enîya Sandînîst a Rizgarîya Neteweyî (FSLN) **Daniel Ortega** (62,46 %) îtîraza xwe tîne ziman û îdîa dike ku wî bi xwe ji sedî 62ê dengan wergirtiye: *«Em dixwazin ev hilbijartin weke nelê û nerewa bên îlan kirin û li ber çavên çavdêrên hemû cîhanê ji nû ve bên li dar xistin!»* Bi rastî jî ji bo hemû cîhanê –ango ji bo «civata navneteweyî» ya bi ser nakeve. Protestovanan gazî sed hezar kesan kir. Pênc hezar kes hatin, an jî bi dîtina herî xweşbîn deh hezar kes hatin.

Xwe weke «sandinîst » dide xuya kirin, lê belê dijbera desthilatê, edîtora kovara *Envío,* Xatûn **Maria López Vigil** wisa hîs dike ku rêjeya navdar a «% 62 ya Gadea» zêde mumkin xuya nake (berîya hilbijartinê, hemû lêpirsîn û anket rêjeya muhtemel a dengê wê li derdora ji sedî 30 nîşan didin). Ew dixwaze zêdetir bawerîyê bide: *«Ez bawer dikim ku yeksanîyek hebû û ez nizanin ka bi vê maça yeksan **Ortega** hinekî ket pêşîya **Gadea**, an jî Gadea hinekî ket pêşîya Ortega. Gelek rêzik hatin bin pê kirin… hin ji wan yên roja dengdanê bûn, lê belê ya herî xirab berê rû da»*. Gerînendeya Navenda Çavdêrîya Ragihandinê (Cinco), **Sofia Montenegro** eşkeretir diaxive. Ji bo wê, *«Ortega dîktatorek e»*. Ji bo pirsa *«Baş e, hûn çîyê wî rexne dikin?»* jî , ew bêyî ku serê xwe bi detayan re biêşîne, bi kurtasî dibêje: *«her tiştê wî!»*.

Spî, reş, baş, xirab…rasthatina Nîkaraguayê li kesên ku tenê destekê didin rewşên «mutleq», nayê tafsiye kirin. Li kevîgirîya rast/çep pevçûneke dirinde ya navbera birayên bûne dijminên hev zêde dibe. Û di vê pozberîyê de, ti alî nikare îdîa bike ku ew bi temamî bêguneh e.

Piştî hilweşandina dîktatorîya **Anastasio Somoza**, di sala 1979ê de, FSLN neçar ma di salên 1980ê de bikeve nav pevçûneke ku DYAyê bi navgîna dij-şoreşgeran –*contras*– li ser ferz kir. Vê pevçûnê welat kavil kir. Di dema hilbijartinên 25ê sibata sala 1990ê de, nikaraguayî dikevin nav endîşeyeke kûr: Eger ew dengên xwe ji nû ve bidin «sandinîstan», wê şer heta qiyametê dirêj bibe. Bi hilbijartina Xatûn **Violeta Chamorro**, ne ji ber pêbawerîyê, lê ji ber westîyana ji şer, ew careke din dihêlin ku rastgir vegerin ser desthilatê.

Şoka têkçûnê ji bo FSLN pir dijwar bû, ya ku ne li bendê bû desthilatê ji dest berde. Bi carekê guftugoyên dijwar ên navxweyî rû didin. Enîya ku piştî meşandina şerê gerîla û nîşandana berxwedaneke eskerî li himberî zext û êrişên amerîkî, dawîya dawî ji ber pêwistîyê bû partîyeke navendîkirî, ji jor ber bi jêr û ji rêûresmê niqaşê bêpar mayî. Di sala 1994ê de «ortodoks» bi pêşengîya **Ortega** bi ser dikevin. Gelek kadro, hunermend û ronakbîr ji partîyê vediqetin; pir kesên din jî bêyî ku rêzikên nezaketê zêde li ber çavan bên girtin, ji partîyê hatin avêtin. Bi vî awayî, di sala 1995ê de Tevgera Venûkirina Sandinîst (MRS) a ji alîyê alîkarê serokê berê **Sergio Ramírez** û *fermandara* berê **Dora María Téllez** ve hat ava kirin, derket holê. Ji wir û şûn ve, «klîka Ortega» bi «caudillisme (hêza siyasî ya xwe dispêre lîderekî eskerî)», «otorîtarîzm» û «arizîkirina FSLN»ê hat sûcbar kirin. (1)

Lê belê tarîfkirina tenê bi vî awayî –û ev versîyona herî berbelavbûyî ye–, wê were wateya dîroka bedbext a partîya ku bakurê xwe winda kir û veguherî rengê tarî… Ango ew tarîf bersivê dide tenê qismekî realîteyê.

Gava sandînîst bûn du beş û Ortega bi serê xwe ma

Germeke ku mirov bêzar dike, xwe berdide ser lokala mutewazî ya «kevne gerîlayên» sandinîst, li taxa qelebalix a *Managua, San Judasê*. Endamê gerîlatîya bajarî ya dema **Somoza**, dûre jî yê komên şokê li himberî kontrayan, **Mario José Cienfuegos**, bîranînên xwe bi van gotinan tîne ziman: *«Dotira rojê ya têkçûna di hilbijartinên sala 1990ê de, me "şervanên dîrokî ", me rabû gazî Daniel **Ortega** kir. Ew bêyî eskort, bi tena serê xwe hat. Ew êdî ne ti tişt, tenê fermandar **Daniel** bû. Piştî gufûgoyeke dûrûdirêj, ji bo jinûve bidestxistina desthilatê me biryara dewamkirina têkoşînê da».* Lê belê li ser kîjan bingehan? Şewirmendê niha yê karûbarên civakî yên şefê dewletê **Orlando Núñez** jî gotinên **Cienfuegos**ê wiha temam dike: *«Her tişt rastî pêvajoyeke hilweşîna bloka sosyalîst dihat. Gelek kes, di nav enîyê de, fikirîn ku êdî dawîya dîrokê hatiye. Bi keşifkirina demokrasîya bûrjûwa ku ti caran di serdema **Somoza** de nas nekiribûn, biryar dan ku projeya dîrokî ya FSLNê êdî derdemî bûye».* Ji ber ku sosyalîzm û antî-emperyalîzm *«êdî ti sedema hebûna wan tinebû»,* weke partîyeke «nûjen» a çepa navendî jinûve bicihkirina Enîyê dibû babeta rojevê . Eynî weke ku bavikekî/klanekê FSLN desteser kiribe, ev pozberîya îdeolojîk bû sedemê parçebûnê.

Weke ku «guherîngir» **Ramírez** jî qebûl dike, ji vir û şûn ve *«Daniel di dijberîyê de bûye belayeke ji ya xwe nayê xwarê. Gava jihevqetîn qewimî (…), ew bi tenê ma, bêpere û ji navgîna partîyê bêpar. Wî seredanên xwe yên li* barrios [taxan] *û li* pueblos [gundan] *zêde kirin û lîdertîya xwe saz kir».* (2) Ya rastî, gelê sandinîst dev ji rêveberê xwe bernedaye. Ji bo bide dû wî, carna pir bi sebr tevgerîyaye...

Di sala 1996ê de Partîya Lîberal a Destûrnameyî (PLD) û **Arnoldo Alemán** (ji sedî 51ê dengan werdigirin) derdikevin. Ji ber ku sefareta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê welêt bi siberojên tarî tehdît dike, **Ortega** ancax dikare ji sedî 37,7ê dengan bi dest bixe. Partîyên din jixwe piştî li wan tê şikandin: MRS ji sedî 1,33ê dengan distîne

FSLN dibe exsîra hevpeymana mohr kiribû

Heta vê derê FSLN a ku bi nermahî tevgerîya, hê neketibû nav hewldanên ji bo himbêzkirina dijminên xwe yên herî xedar, Dêra Katolîk û endamên berê yên baregeha *contra*, ku piranîya wan ji gundîyan pêk dihat. Ew gaveke din jî davêje dema ku li gel rasta tundrew a Partîya Lîberal a Destûrnameyî jî dikeve nav danûstandinan û digihîje lihevhatina –«hevpeymana » – ku di pratîkê de dibe zemîna hukûmeteke koalîsyonê ya ji du partîyan saz dibe. Lêkolîner **Angel Saloando** bi berterefkirina destan nîşaneke rûreşkirinê dike û fikra xwe weha rave dike: *«Di vê serpêhatîyê de, wê coş û gîyanê xwe winda kir. Gava neolîberalan giranîya xwe dan reformên bazarê, sektorên gelemperî yên dewletê ji holê rakirin, an jî qada tenduristîyê lîberalîze kirin, FSLN ku bûbû êxsîrka hevpeymana mohr kiribû, hemû rê ji wan re vekirin. Bi demê re, kesên ku di nav wê de giranîya xwe danîn, yên karsaz bûn».*

Núñez serpêhatîyeke ku di nav kampa din de rû da jî wiha rave dike: *«Li Parlemanê, li gel vê yekê jî, ji ber bandora me ya li ser girseyan, dijberên me bi awayekî eşkere dixwestin û hêza wan jî hebû ku me hilweşînin. Heke me îtîfaq nekira, me dê xwe li nav xetereyeke mezin a windabûnê bidîta. Ew rêbaz bi taybetî li xweşîya me nedihat, lê belê mesele pirsgirêka têkilîyên hêzan bû: Ji bo îqnakirina gel da ku rojek ji rojan me careke din ji hindikahîyê hilkişîne piranîyê, bi her halî, divîyabû me hebûna xwe bidomanda».*

«Hevpeyman» bi rastî wê bi kêrî mana FSLNê û –ji bo zêdetir sûdwergirtina serokê zêde bertîlxur Alemán– aramîya siyasî, Enîya ku sendîkayan kontrol dike û xwedî tesîreke mezin e li ser polîs û artêşê, bihata. Bêguman, ev «pragmatîzma » dij-xwezayî wê berdêleke wê hebûya. Núñez qebûl dike ku: *«reşkirin, şeytanîkirin û nerewakirina Enîyê ji alîyê çepa cîhanî ve pir dijwar bûn. Lê belê divîyabû ew were kirin û me ew kir»*. Li Nîkaraguayê bi xwe manevra wê pir ne bîyanî be ji têkçûna dema hilbijartina sala 2001ê re.

Piştî hukûmeta Alemán, ya alîkarê wî yê berê yê serokatîyê, mihafezekar **Enrique Bolaños**, ku di 2001ê de hat hilbijartin, wê arizîkirin, tundkirina kapîtal û rêveberîya lihevanîna sazûmanî bidome di berdêla xizankirina ji sedî 46ê welatîyan û perperîşankirina ji sedî 15ê welatîyan de. Di ser de jî, derzên zêde dijwar rastê qels dikin. **Bolaños** selefê xwe **Alemán** bi îdîaya ku bi awayekî nerewa dewlemend bûye, bi bîst salên girtîgehê dide ceza kirin. (3) Ji ber vê yekê, çawa rê dikare li pêşîya li dengên ku 2006ê ber bi FSLNê ve diherikin, were girtin?

Lîberal projeyeke pêşnîyarqanûna cezakirina jiberbirina zarokan didin meclisê, jinên ku tehlûkeya mirina wan hebe, jinên ku rastî tecawuzê hatibin jî dikevin ber hukmê vê pêşnîyazqanûnê. Hîyerarşîyên katolîk û evanjelîk rêzekampanyayekê saz dikin û zextê li namzedan dikin. Li vir dîsa, hesabê siyasî dikeve pêşîya her tiştî: Ji bo navbera xwe û Dêrê xira neke, Enî destekê dide pêşnîyarqanûnê.

Ji bilî fonksîyonên xwe yên di nava Cincoyê de, Xatûn **Montenegro** herwiha bû yek ji sazûmankara Tevgera Serbixwe ya Jinan (MAM). Hêrsa wê hê jî danakeve û wiha dibêje: *«Zarokjiberbirina bi rêya dermanî hema hema ji serxwebûnê û vir ve her hebû. Hetta, **Somoza** jî dest tê werneda! Lê belê **Ortega** ew ji holê rakir ji ber ku, jidil, an jî ji bo hesabên xwe, ew ket ser rêgeha fundementalîzma xiristîyanî. Hevsera wî* [Mme Rosario Murillo], *ya firsendbaz jî tevahîya rojê Xwedê û Meryema Bakîre ji ser zarê xwe nayne xwarê».* Ev beş canê mirov diêşîne –bi taybetî di nav sektorên pêşverû yên navneteweyî de. Doz heq e û li wir hevalbendên femînîzmê jî hene. Li Nîkaraguayê …

Pirsa zarokjiberbirinê dibe pirseke girîng

Ev sala navdar 2006, Ortega wê di tûra yekem de bi rêjeya ji sedî 37,99ê dengan were hilbijartin. (4) Bi bilindkirina slogana «Xiristîyan, sosyalîst, piştgir», di dawîya 2011ê de ew dîsa bi rêjeyeke pir bilindtir rekora xwe dişkîne,

www.kurdishmonde.org

tevî ku Xatûn **Murillo** bi coşeke mezin behsa zarokanîna berî demeke nêz ya keçeke 12 salî ya tecawuzkirî dikir û ev gotina wê li her derê hat bihîstin: *«Jidayîkbûna vê zarokê mûcîzeyek e!* (…) *Em şikir ji Xwedê re bikin ji bo ewçend ronahîyê, ji bo ewçend bawerîyê û ewçend dilovanîyê».*

Yek ji sandinîstên din ên me pê re xeber da herwiha bi van gotinan li xwe mikur tê: *«Dêreke me ya pir mihafezekar heye û ew hê jî xwedî hêzeke mezin e; ew tax bi tax digere û kar dike. Gava bi nêrîna xwe ne bi wê re be jî, gel dîsa jî rêzeke mezin nîşanî wê dide. Divê em pê re li hev bikin. Erê, em nikarin bi ber bayê hestên gel bikevin, lê belê em nikarin zêde jî xwe li raserî wî bigirin».* Ji bo kesên xwe weke pêşverû dibînin, ev daxuyanî ecêb in? Bêguman. Lê belê Xatûn **Lucy Vargas**, kadroya Enîyê li *barrio* Larreynaga ya Managua, bi hêrs wiha dewam dike: *«Li gelek welatan, zarokjiberbirin serbest e, lê belê bi tendurustîya jinan û zarokan re serê xwe naêşînin û gelek ji wan jîyana xwe ji dest didin! Li vir, tenê bi dermankirina belaş be jî, em alîkarîyê didin jinan. Ev mafek e jî».* Li navendên tenduristîyê ji bo her jineke ku bixwaze û bêpere, rêbazên pêşîgirtina li ducanîbûnê xizmet amade ne. Wekî din –û bêyî piçûkdîtina pirsgirêkê–, hukûmet bi taybetî nakeve nav lêgerîna bicihanîna qanûnê: Li nexweşxaneyan, eger jîyana jineke ducanî di xeterê de be, komîsyona bijîjkan bi giştî biryara pêwîst dide û ji bo vê biryarê pêdivî bi xwestina ti destûrê tine.

Wargeha li kevîtaxên Managuayê, **Ciudad Sandino** vê nêrînê bi yekdengîyê teyîd dike. Îca tenduristî? Helbet, êdî sûd tê wergirtin ji derman û bijîjkên kubayî «compañeroyên me yên *ALBA* [Hevgirtina Bolîvarîen ji bo Gelên Amerîkaya Me]*, ku diçin heta malan gava pêdivî bi wan hebe».* Perwerde? Ji nû ve ew jî bû belaş. *«Em êdî çerxîyekê jî ji bo dibistanê nadin; li wir xwarinekê didin zarokan û hetta çenteyekê, cotek sol û unîformayekê jî didin zarokên herî muhtac».* Henek, kenê bi deng, hev himbêzkirin, destê xwe li stûyên hev pêçan…

Li pêşîya dikaneke ku pêdivîyên bingehîn bi fiyetên ji alîyê dewletê ve destekkirî difiroşin, ji nişka ve helahela û heyteholek rû dide. *«Riz heye, fasolî heye, şekir heye, zeyt heye… ji van pêdivîyan, berê ancax me dikaribû yekê bi tenê bikirîya. Kîloya fasolîya berê bi 18 kordoba [0,75 ewro] bû, niha bi 8 kordoba ye».*

Li alîyekî rast weke rast dima û *«guherîngir»* bi gotar û nivîsarên li ser pesindana *«civaka sîvîl», «lihevhatina neteweyî», «nasnameya welatî ya demokratîk», «hevgirtinên berfireh û pirreng», «qabilîyeta desthilatê»*, û *«sazûmankarîyê»* xwe mijûl dikirin, hukûmeta **Ortega** bi qasî çil bernameyên civakî dan dest pê kirin û ew bername ji alîyê Xatûn **Murillo** ya ku weke wezîra super hatibû tayîn kirin ve hatin bi rê ve birin.

Sandînîst dîsa dikarin bawerîyê bidin xelkê

Saldomando bi dengekî bi îronîyê barkirî nerazîbûna xwe derdibire: *«Ji belavkirina tiştên biçûk li mirovan ji min re qet behs nekin. Eger em li ser van tiştan hewl bidin projeyeke siyasî saz bikin, ev bi kêrî ti tiştî nayê».* Helbet bi deh hezaran xizanên ku ji ber bager û bahozên tropîkal ji gelek deveran hatine, ne bi vî awayî difikirin; bi saya belavkirina 854 000 lewhayên çîngo, karîne ji xwe re starekê bibînin û ketine xanîyekî. Ev ne ew tişt e ku sûdwergira ji plana «birçîbûn namîne» xatûn **Rosalia Suárez** tîne ziman. Weke heştê hezar jinan, çêlekek, berazek û şeş mirîşk dane wê jî: *«Çêleke min ji niha ve du golik dane min! Ez şîrê ku me venexwar difiroşim, zarokên min hêkan dixwin… berê tiştekî me tunebû».* Ev herwiha ne ew tişt in ku ji alîyê jinên din ve tên dest nîşan kirin. Ev jinên ku gelek caran dayîkên îzolekirî ne, dibin xwedî kredîyên plana «selefxurî namîne», da ku karibin firûnek, şirketeke piçûk a firotina *nacatamales* (pasteyên gelêrî) an jî *torillas* (nanên garis), hetta, bi hevkarîya çend kesan kooperetîfan ava bikin.

Şênîyeke paytextê a ku li nîvê qelebalixa bazara Muembe em lê rast hatin, berê xwe dide esmanan û vê îtîrazê dike «*Tiştê ku hukûmetê kir tiştê herî hindik e û tenê ji bo alîgirên wê ye. Kesên pê re nehemfikir in ji her mafî bêpar in».* Sûcbarîyeke pir tê ziman a girêdayî rola Konseyên Desthilatîya Welatîyan (CPC), rêxistina sandinîst a bingehîn û pir dest wer dide li cihê cih birêvebirina bernameyan.

Gava her kesek xwedî serpêhatîyekê be, realîteyeke cihêrengtir derdikeve holê. Xatûn **Yaira Mayorga** li nav kavilên avahîyeke ji ber erdheja sala 1972ê hilweşîyayî dijîya. Weke sê sed û şêst cîranên xwe –ku ji nêzî çaryeka wan xwe weke «ne-sandinîst» dîyar dikin–, wê jî ji xwe re xanîyekî têkûz ava kiriye. Ew bi coş dibêje: *«Binêrin çi qas xweşik e mala min!»* Plana «stargeha maqûl» jî ev e.

Rosario Garcíaya ciwan dest nîşan dike ku *«Ez ne sandinîst, ne jî tiştekî din bûm. Ti tiştê siyasî bala min nedikişand. Lê belê min dît ka fermandar çi kir… »* Xweber, weke gelek kesên din, bazirganê piçûk û gundî **Walter Silva** ji bo me wiha li xwe mikur tê: *«Ez vê yekê ji we re ji dil û can dibêjim: Ez lîberal bûm; wan ti caran ti tişt neda me.* "El hombre" [zilam], *wî, pir alîkarî da me. Bi carekê, min nêrîna xwe guhert û gelek hevalên min jî dûre weke min kir».* Xwepêşandan –pir li raserî asta sextekarîyeke muhtemel– vê hilpekîna bi heybet a navbera ji sedî 38ê sala 2006ê û ji sedî 62,46ê sala 2011ê rave dikin.

Welat û rejîm neguherî ye, lê pêşekîyên dewletê hatine guhertin

Ti kes, bêguman, wê nekeve nav maceraya behskirina ji «sosyalîzmê». Sermayedarên bîyanî yên li vî welatî kar dikin û dezgehên weke Fona Diravî ya Navneteweyî (FDN) an jî Bankaya Cîhanî (BC) qet gazineke ku ji bo rêbaza birevebirinê ya van pênc salên derbasbûyî bibêjin, tuneye. Sektora arizî (prîve) – ku hin halxweşên sandinîstan jî di nav de hene. Bi wê çendeyê ku ew di wergirtina biryarên stratejîk ên desthilatê de jî Ortega xwedî giranîyekê ye: Bi pêkanîna ALBAyê û zîvirîna ber bi Amerîkaya Başûr ve, vê sektorê bazarên nû vekirin. Bi awayekî dezgehî, welat neguherîye, lê belê, û ne tiştekî ji rêzê ye, hukûmetê prîyorîteyên ango pêşekîyên dewletê guhertin. Di heman demê de, alîkarîya pir mezin a Venezuelaya **Hugo Chávez** – *«ev çepgirê xwedêgiravî, yê ortodoks, stewr û bêber, paşverû û zordar»* ku dibe sedemê zêdekirina adrenalînê li cem «nûkeran» – rê li ber berfirehkirin û serkeftina bernameyên civakî vekir.

Dilbijîyayî ji bo alîkarîya serokatîyê, **Edmundo Jarquín** û ku li bin ala Tevgera Venûkirina Sandinîst (MRS) ê di sala 2006ê de ji sedî 6,29ê dengan bi dest xistibû, vê carê bû hevalbenda namzedê PLIyê **Gadea**. Evê dawîyê yê pir kevnegir û rêveberê berê yê *contra* li Cosra Rica *«lê belê ew contrayekî "welatî" bû »,* Xatûn **López Vigil** wisa balê dikşîne ser ferqa wî ji kontrayên din bêyî ku bikene –di eslê xwe de navekî din ê bankavan û wezîrê berê yê Alemán û Bolaños, **Eduardo Montealegre** bû. Montealegreyê di 2006ê de li himberî Ortega têkçûyî (ji sedî 28,30ê dengan stand) û li nav skandaleke diravî gerîyayî, pir bi zehmetî dikaribû derkeve pêş– û jixwe pir jî dilê wî nedibijîya tiştekî wisa, ji ber ku ji demeke dirêj ve weke alîyê têkçûyî hatibû eşkere kirin. Xatûn **López Vig**il *berîya hilbijartinan qebûl dikir ku «Ev hevgirtina PLI-MRS xwe naspêre parvekirina projeyeke civakî, bernameyekê, an jî îdeolojîyekê. Armanca hevgirtinê, bi tenê pêşîlêgirtina dîktatorîya FSLN û Ortega bû».* Ev bi awayekî, cureyek «hevpeyman» bû. di şazdeh salan de ji alîyê neolîberalîzmeke bêfirên û bêamortisor ve hûrhûrbûyî (1990-2006) ku ew hêvî nakin careke din bibînin, piranîya nîkaraguayîyan tercîha xwe kiriye: *«Desteke me ji bo* "comandante" bêşert û merc e*: em dixwazin ku ew heman rêyê bidomîne».*

Xatûn Montenegroya ku gelek caran li sefareta Amerîkayê li ber çavan dikeve û parêzvana «civakeke sîvîl» a mirovan di nav meraqê de dihêle, pir bi zehmetî realîteyê dipejirîne û pir bi zimanekî mutleq diaxive: *«Bi her halî, piştî şeş mehên din, Chávez* [ku nexweşîya pençeşêrê lê peyda bûye, an jî ji zû ve lê peyda bûye] *wê mirî be; Ortega û Murillo jî, wê dawîya wan mîna ya Çawûşeskoyan be».* Gelo wê pêwîst be ku wê rojê jinên ku «hevkarî kirine» porên wan bên kur kirin? Ji şêst û du parlementerên sandinîst ên di 6ê mijdara bihurî de hatin hilbijartin, sî û çar jê jin in.

* Rojnamevan

(1) Der barê mijarê de binêrin li nivîsa, Maurice Lemoine, a bi sernavê «Nicaragua dil dibijîne vegera li demên bihurî», *Le Monde diplomatique* cotmeh 1996.

(2) *El País,* Madrid, 4 mijdar 2011.

(3) Ev ceza wê 16ê çileya 2009ê ji alîyê Dadgeha Bilind ve bihata betal kirin.

(4) Destûra bingehîn a guherandî piştî pêkhatina «hevpeymanîya» Ortega-Alemán, dihêle ku ew ji sedî 40 an jî 35ê dengan wergire, eger pêşketineke pênc pûan namzedê qezenckirî ji raqîbê wî yê herî nêz veqetîne.

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Angola bi hawara Portekîzê ve tê

AUGUSTA CONCHIGLIA *

Piştî Afrîkaya Başûr û Nîjeryayê hêza aborî ya sêyem ya Afrîkaya reş, Angola jixwe weke welatekî pêşketî derdikeve pêş. (1) Ew welatê xwedîyê rezervên girîng ên hîdrokarburan, ku raporên hêvîyê didin jî li wan zêde dibin – dirêjîya jeolojîk a kûran û tejaneyên (hawza) dewlemend ên brezîlî ku ji zû de likar in–, yek ji hilberînerên serekî yê afrîkî yê zêrê reş e: Ji 2008ê bi vir de rojê li dora 1,8 milyon varîl petrolê derdixe. Piştî bi deh salan şerê sîvîl (2), bi saya serketina lihevkirina neteweyî, aramîyeke siyasî li vî welatî dîyar dibe ku ne ji bo acizkirina muteşebisên bîyanî ye. Lê bi awayekî ku qet nedihat hêvî kirin, Angola dibîne ku dagîrkera wê ya kevin, Portekîza di bin tedbîrên teserûfê yên dijwar ên navneteweyî de, xwe pê şêrîn dike. Serokwezîrê portekîzî Pedro Passos Coelhoyê ku çirîya paşîn a bihurî bi seredanekê li Luandayê bû, wiha dibêje, *«Em sermîyanê angolayî li ser seran û çavan li cem xwe qebûl dikin!».*

Her çend heyranbûna bûrjûwazîya nû ya angolayî ji bo xeyrî menqûlên metropola kevin ji berê de efsaneyî be jî –dê bibûna sedema bilindbûna bihayên vê sektorê–, kirîna senedên hiseyan ên komên bankayî û enerjîyê yên herî girîng in yên ku sermîyanê herî mezin ber bi xwe ve kişandine: Nêzîkî 2 milyar dolaran e, ku dike ji % 4ê bihayê giştî yê borsayê. Di rastîyê de, di zik hev de hebûna bankayên her du welatan dike ku guman ji vî hisabî werin kirin. Di navenda vê tevgerê de şirketa petrolê ya angolayî ***Sonangol*** heye ku di 2010ê de, di nav hemî sektoran li ser hev de, fîrmaya duyem a mezin a afrîkayî bû.

Tevgera sermîyanî ya ber bi Lîzbonê ve, ji 2008ê bi vir de pir bûye û balê dikşîne. ***Sonangol*** ji wê demê de bûye hisedarê serekî yê bankaya taybetî ya portekîzî ya yekê, ***Millenium BCP***ê. Şirketa diravî ***Santoro***, ku di destê keça mezin a serokê angolayî, **José Eduardo dos Santos, Isabel dos Santos** de ye jî, her bi vî awayî beşdarî van karûbaran dibe. Dîsa, konsorsîyûma **Esperanza** ya ku ji Santoro û Sonangol pêk tê, xwedîya ji % 45ê koma portekîzî ***Americo Amorim Energie***yê ye, ku ew jî ji hindava xwe ve ji % 33,3ê şirketa neteweyî ya portekîzî ya petrolê, GALPê kontrol dike. Tiştekî din ê hîn jî neditî, bankên taybetî yên ***Luanda***yê, bi taybetî jî Bankaya Senaî û Bazirganîyê (BIC) û Banka Taybetî ya Atlantîkê, li Portekîzê şûbe vekirin.

Di nav çend salan de, panoramaya sektora bankê ya angolayî ji binî vê hate guhertin. Koma portekîzî ***Espirito Santo***, bi bicîhbûna xwe ya li **Lîzbonê [?]** piştî liberalbûna aborî ya di 1993ê de û girêdana têkilîyên nêzîk bi desthilatê re bi roleke pêşeng rabû. Her wiha, bi saya hevalbendîya bi telekomên portekîzî re fîrmaya telefonê ya destî ***Unitel***ê, ku piranîya wê di destê **Xanim dos Santos**ê de ye, bi beza birûskê belav bû û di 2010ê de bû xwedîya şeş milyon aboneyan.

Di adara 2009ê de, dema seredana Portekîzê ya serok **José Eduardo dos Santos**, hezar mirovên karsaz li otêla **Ritz**ê ya li Lîzbonê civiyan û riyên hîn bêtir xurtkirina têkilîyên aborî û diravî di navbera her du welatan de gotûbêj kirin. Serokê wê demê yê ***Sonangol***ê, **Manuel Domingo Vicente** yê ku weke *«yek ji karsazên herî bibandor ê parzemînê»* tê nîşan dan, piştrast dike û dibêje, *«Veberhênana me ya xwe dispêre Portekîzê rastî û mayînde ye».* (3) Van demên dawîn, ew weke kesê ku dê cîyê birêz **dos Santos** bigire tê dîtin. Di nav hengameya vê seredanê de, baskeke veberhênanê –ku navenda wê li Angolayê ye– ji alîyê rêkxistina Sendoqa Giştî ya Emanetê ya Portekîzê û Sonangolê ve hatiye ava kirin ku derfetê bide pêşxistina bingeha kar û senaîya giran.

Lê kriza diravî ya navneteweyî pê li frêna hemleyên bankên portekîzî kir û zirareke mezin him da wan, him jî da hisedarên wan ên bîyanî. Vê yekê çavê Sonangola ku alîkarîya ***Millenium BCP***ê kir ku ji nû ve sermîyanê xwe çêke, netirsand û wê jî bi xwe re bankeke ji Brezîlyayê û bankeke çînî jî kişande nav vê operasyonê. ***Millenium BCP***a ku «ji deynên yûnanî pir zirar dîbû» di îcraya xwe ya 2011ê de 786 milyon euro zirar kiriye. Lê tevî vê jî, encamên karên şûbeyên wê yên li Mozambîk û Angolayê ji % 50 hilpekîyane û zêde bûne.

Sonangola ku ji ber nezelalbûna birêveberîya xwe, her gav di bin zeptûrepta Fona Diravî ya Navneteweyî (IMF) de ye, weke dewleteke di nav dewletê de tev digere. Wê bi taybetî jî foneke serbixwe ya ku yekser ji alîyê birêvebirîya hevpar a fîrmayê ve tê bi rê ve birin, ava kiriye: Bîst û du şûbeyên ku li hemî warên aborîyê belav bûne, bi awayekî vekirî şûna desthilatê girtine. Hevalbendîya wê ya bi fîrmayeke taybetî ya çînî, ***China International Fund of Hongkong*** re, ku di 2004ê de ***China Sonangol*** jê çêbûye, bêguman cûreyên karûbarên şirketa petrolê ya afrîkî zêde dike. Bi tena serê xwe, yan jî bi hevalbenda xwe ya asyayî re, ew li gelek welatên afrîkî, li Amerîkaya Latîn (Kuba, Ekwator, Venezuela) û Rojhilatê Nêzîk (Îran, Iraq) heye.

Stratejîstên angolayî di kesayetîya Portekîzê de platformeke îdeal ya ji bo navneteweyîbûna xwe dibînin. Ew carinan xwe weke axeke fetihandî ya xwedî helwêsteke ji hisa tolhildanê neşûştî dibînin. Lê teşebuskarên portekîzî ji vê têkilîyê avantajên piralî derdixin. Tevî ku welatê wan rûbirûyî rawestaneke aborî bûye jî, beşdarbûna wan a şantîyeya ji nû ve avakirin û pêşxistinê ya bêserûber a Angolayê, bi awayekî giştî ji alîyê Luandayê ve tê fînanse kirin, ku ev jî ji bo gelekên wan weke şansekî mezin tê dîtin.

Ji pênc sed û sîh û du fîrmayên bîyanî yên li Angolayê hene –û ji % 40ê hatinîya nesafî ya hundirîn kontrol dikin–, ji % 38ê wan portekîzî (ji % 18,8ê wan jî çînî) ne. Bi ji % 13yê bêkarîya li Portekîzê, Eldoradoya îngilîzî bi deh hezaran karkeran dikişîne, ku ew gelek caran jî ne kalîfîye ne. Ev bûyer helbet Luandaya ku her dem gilîyê nebûna derfetan ji bo ciwanên netewa xwe dike jî ditirsîne. Hejmara portekîzîyên li Angolayê bicihbûyî di 2003ê de bîst û yek hezar bû, di 2011ê de ji sed hezaran derbas bû. Li gor agahdarîyên balyozên angolayî, jimara portekîzîyan a rastîn divê bigihê du qatê vê reqemê. Di heman demê de, jimara angolayîyên li Portekîzê dimînin kêmtir dibe. Hêvî ji îro pê ve li başûr e...

* Rojnamevan.

(1) «Après-guerre et or noir en Angola / *Li Angolayê Serdema Piştî Şer û Zêrê Reş*» , *Le Monde diplomatique*, gulana 2008ê.

(2) Şerê wê gavê, piştî serxwebûnê, di çirîya paşîn a 1975ê de, dest pê kir. Du tevgerên azadîxwaz ên berê, Tevgera Gelerî ya Azadîya Angolayê (MPLA) û Yekîtîya Neteweyî ya Serxwebûna Giştî ya Angolayê (Unita), li ser bingehê şerê sar, şerê hevdu kirin.

(3) *L'Expresso*, Lisbonne, adara 2009ê.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

Mîmarino, tiştekî neşkînin!

Philippe Bovet *

Gelo divê avahîyên kevin werin xira kirin ji bo ku li şûna wan avahîyên "dostjîngeh" werin lêkirin? Dema ku mirov enerjîya ku li avahîsazîyê diçe bihesibîne, kêm caran hevkêşe li hev derdikeve...

Xirakirin û ji nû ve avakirina xanîyan pir caran weke ku yekane asoya siyasetên bajarî be xuya dike. Tevî ku hilweşandina blokên apartmanan bêyî ku li tamîrkirina wan were fikirîn, rê li ber pirsgirêkên civakî û yên jîngehê vedike. Ev tercîh daneyeke sereke nabîne: Mirov afirînerîyê bixe xizmeta ya kevin di warê ekolojîk de berdar e û encamên wê jî xwe piştrast kirine.

Mirov dikare ji ber du sedeman li ber xirakirina avahîyekê rabe. Li alîyekî şênî xwe girêdayî nasnameya taxa xwe his dikin û guhertinên hêdî hêdî tercîh dikin û ne veguherînên jibinî ve. Li alîyê din hilweşandin dibe sedema jidestdana mayeyeke "enerjîya grî" ku mirov dikare li ber daneheva CO2ya dema şewata daristanekê bigire. Ev fikir koma tevahîya enerjîyên ketî navavahîyekê ji avakirina wê (derxistin û veguheztina materyalan, bicihkirina vînçekê, veguhastina karkeran) heta bi xirakirina wê (dînamîtkirin, barkişandin, veşartin yan jî ji nû ve veguherandina xurdeyan) dîyar dike.

Berevajî fikrên heyî, ji bo ji nû ve avakirina avahîyên pir ekonomîk di warê enerjîyê de xirakirina avahîyan ne destketîyeke jîngehî ye. Li gor muhendîsê enerjîyê yê fransî Olivier Sidler bi qasî bîstûpênc caran li enerjîya wê avahîyê berîya were xira kirin, salê xerc dikir, enerjî li xirakirin û ji nû ve avakirina avahîyekê diçe: "*hercara ku mumkin e hezar cara çêtir e mirov avahîyê rehabîlite bike li şuna wê xira bike. Li ser mijara gazên tesîra serayê dikin bêguman ya herî baş ew e.*" Profesorê li Dibistana Polîteknîkê ya Zurîhê Holger Wallbaum ê ku berpirsîyar e ji avahîsazîya xwegirtî weha şîreta xwe dike: "*Carinan bi tenê piştî bi tenê deh salan jî mirov avahîyekê xira dikin, û em di warê îdarî de ji bo vê tên xelat kirin bi rêya cedwelên amortîsmonê, kêmkirina ji bacê... Ango em rêkxistina tevlîhev a bicihanîna lêkirina avahîyê ji bîr dikin.*"

Erê rehabîlîtasyona avahîyên lêkirî hê nebûye adet, sedema vê jî bêguman ji ber ku mîmar ji perwerdeya xwe ve fêr dibin nirx bi ya nû bidin û nafikirin ku karibin ji bilî bi vê rêyê bi rêyeke din xwe îfade bikin. Maneya xebitîna li ser ya heyî wê bi tenê parastina berhema keseke/a din, ev jî dikare hin egoyan pir aciz bike.

Sala 2003yê Karl Viridén li gor pîvanên pasîf (1) avahîyeke Zurîhê ya sala 1984ê nû kir. Tevî dibistana Polîteknîk a bajêr wî lêkolînek li ser enerjîya grî ya vê nûkirinê pêk anî. Tevahîya materyalan bi hûrgulî hatin analîz kirin; dane li ber dest in weke kWh/m2/salê û bi hesabê tonan tên terîf kirin. Xirakirinek û piştre jinûveavakirineke li gor pîvanên pasîf wê enerjîyeke (enerjîya grî û ya xebitînê) 112 kWh/m2/salê. Xirakirinek û avakirineke konvensîyonel bi xwe wê bibe xwedî bandoreke 200/kWh/m2/salê. Heçî renovekirina li gor pîvanên pasîf e, ew bi tenê digihêje 82/kWh/m2/salê. Dema ku mirov bi tonan îfade dike ev dane hê bêhtir rohnîker in: Avahî qederê 100 tonan giran e.

Ji ber ku baş li vê renovekirinê hatibû fikirîn, pêdivî daxistibûn asta herî jêr. Tonek kelûmel li cihê cih ji nû ve hat bi kar anîn (kîremîtên ser banan, derîyên rihotî û kurtkirî ...) û bi tenê % 4ê girşê avahîyê (4 ton) hat xira kirin û tine kirin. % 10 kelûmelên nû (10 ton) li avahîyê hatin zêde kirin, nexasim ji bo îzolekirinê. Bi giştî bi tenê 14 ton malzeme hatin veguhastin. Dema em li ber hev bigirin, lêkirina avahîyeke nû wê ferz bikira ku 100 tonên avahîya heyî werin tine kirin, paşê tevahîya malzemeyên avahîyeke nû divê were kişandin ku qederê 60 tonan e –lewra kelûmelên niha para bêhtir ji yên kevin siviktir in. Bi giştî ji bo vî karî wê pêwîst bûya ku 160 ton kelûmel were veguhastin. 14 ton beramberî 160 tonan...

Di navbera renovekirin û xirakirinê de tercîh gelek caran li gor armanca avahîyê tê kirin. Di serî de karekî hesas e ku avahîyeke daîreyan tevî gelek çeper û avahîyên xwe yên hilgir were veguherandin bo avahîyeke buroyên qadên fireh. Çêtir e ku bikaranîna nû ya avahîyê li strukturên destpêkê were. Bi ser de jî dem ji renovekirineke aqilane divê. Viridén weha rave dike "*Dema ku mirov wê baş nas nake, nikare avahîyekê binirxîne. Gelek parametre dikevin nav vî hesabî.*" Mîmar ji fermandeyekî bêhtir şefê şantîyeyê ye, divê bi awayê hempîşeyî bixebite û bisporên strukturan, muhendîsên enerjîyê li dora xwe bicivîne da ku dîyar bike ka kîjan lihevkirin xwe ferz dike, gelo mumkin e avahî were bilind kirin, yan jî beşek jê were xira kirin, û hwd.

Ji çend salan û vir ve, înîsîyatîfên orîjînal li seranserê Swîsreyê derketin holê. Bi vî awayî bajarê Baar ê li kantona Zougê, ji mêj ve bajarekî aşan û sîloyan e. Strukturên wan ên bilind ên ji betonê li bajêr serwer in. Di çarçoveya ji nû ve avakirina aşvanîya Swîsreyê, aşê Obermühle sala 2001ê derîyên xwe girtin. Baş e mirov çi ji hecma êdî nayê bi kar anîn bike? Berîya hertiştî rabihurîyê bi tevahî jê nebin: Sîloyên Obermühle sala 2010ê hatin renove kirin (2), ji wan avahîyeke yanzdeh qatî ku tê de bîsthebek daîre û dehhebek jî buro hene, hat çêkirin. (3) Buhayê enerjîyê yê ku li vî karî hemûyî çûyî jî pir kêm e.

* Rojnamevan.

(1) Li Swîsreyê "pîvanên pasîf [normes passives]" ku ji wan re herweha minergie jî tê gotin, ferz dikin ku berxurîya enerjîyê herî zêde 30 kWh/m2/salê be. Ew ne weke pîvanên pasîf ên elman Passivhaus in, ew herî zêde 15 kWh/m2/salê ferz dikin.

(2) www.obermuehle-baar.ch

(3) Li gor pîvanên Minergie hatin renove kirin, ew kêmtir ji 60 kWh/m2/salê enerjîyê ji bo germkirina xênî, avagerm û elektrîkê xerc dikin. Her weha li www.minergie.ch binêre.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Ahmet Aslan: **Hişmendîya spontane 4** (detay) li ser tuwalê teknîka tevlihev, 90 x 90 cm

Gelo dema antropolojîya Claude Lévi-Strauss derbas bû?

Jean-Loup Amselle

Du pirtûkên **Claude Lévi-Strauss**, ên berî demeke nêz hatin weşandin, vîzyoneke hevgirtî a berhema wî pêşkêş dikin. Pirtûka pêşî, ji metnên fransî yên neweşandî yên sê konferansên wî pêk tên. Ew konferans li pêşberî girseyeke japonî hatine dayîn û ronîkirin, bi alîkarîyan bi gewde bûne. Tê de mijarên berfireh ên di pêvojoyeke dirêj a karîyera pirsên pir hevdem ên di encama sîda (aids), genetîka nifşan û dayîkên zarokên kesên din hilgir, hatibûn nirxandin –xizimtî, têkilîya mirov a bi xwezayê re, cihêrengîya çandî, hêmanên mîtolojîk, dijberîya navbera civakên *«sar»* (an jî *«mekanîk»*) û civakên *«germ»* (an jî *«termodînamîk»*)– ji nû ve hatine helsengandin. (1) Pirtûka duyem jî, berhevoka nivîsên virde wirde yên xwegihandina wan pir zehmet ên der barê Japonyayê de ne û ev pirtûk bi awayekî şahidîyê li heyranîya Lévi-Strauss ji bo tiştê ku ew weke çanda sîmetrîk û berevajîya çanda rojavayî dinirxîne, dike û dibe ku li himberî vê ya dawîyê çandeke alternatîf pêşkêş bike. (2) Japonyaya ku bi rabirdûya xwe ve hatiye nasandin, ji ber dûrbûna wê ya ji Rojava, weke nifteya têgihiştina dîroka me tê dîtin: *«Ji bo kesê ku, eger gotin li cih be, ne ji alîyê rûyê xuyayî yê Hîvê ve pêşwazîyê li dîrokê dike– dîroka Cîhana Kevin ji dema Misir, Yewnanistan û Romayê ve– lê belê ji alîyê rûyê veşarî yê Hîva ku ya japonolog û amerîkanîst e ve, girîngîya dîroka Japonyayê jî wê bi qasî ya cîhana antîk, û ya Ewropaya demên arkakîk, bibûya stratejîk.»* Wê hatibe qebûl kirin ku li vir paradoksa ramana ku berdewam di navbera gerdûnîparêzî û relatîvîzmê de dudil dimîne û herwiha ji ber sedema guhêrbarîya xwe, ew analîzê hêsan nake.

Claude Lévi-Strauss, bi awayekî nakok, di van her du pirtûkên xwe de dişibe nûnerê antropolojîyeke têra xwe derdemî, lê belê dîsa ji ber heman sedemê, ji bo hê jî cezbkirina gelek derdorên ramanê, amade xuya dike. Bi rastî, antropolojî hertim (û hê jî) ji bo hilberîna «kevnarîyê» ye. Li ser mijarê, **Claude Lévi-Strauss** baş dizane, wî bêdudilî portreyên wêneyî yên Nambikwaras (li Brezîlyayê) bi awayekî wisa çarçove kirin da ku hêmanên «modernîteyê» ji wan bibe, eynî weke di lêkolîna wî ya kurt ya der barê «karkerên» japonî de, ku wî tê de xebatkerê pîşesazîyê da alîyekî bi û tenê behsa zenaatkaran kir. Ji bo nivîskarê *Fitlonekên Xemgîn,* divê antropolojî berî hertiştî berê xwe bide lêkolînên civakên piçûktir, tenêmayî yên bi çandinîya kevnare, yên ku bi nêçîrê û masîgirîyê debara xwe dikin û ku civakên navbernasînê ne û ji civaka rojavayî ya ku analîza wê ji ber pirhejmara endamên wê gelek hêmanan pêwîst dike, «otantîktir» in.

Ji bo **Lévi-Strauss**, civakên kevnare yên îro, bi zanebûn, tercîh kirin ku li hevîya dîrokê bimînin da ku bikaribin ji rewşa xwe ya bihuştî berdewam kêfê bistînin. Antropolog **Levî Strauss** bi vê yekê, wan weke kesên difikirin, dihesibîne. Ev kes bi awayekî xwedî vîna azad in û wê ji astengîyên sereke yên modernîteyê nerihet bûbin û bi taybetî jî ji encamên kujer û bêyom ên ku bi xuyabûna dewletê re rû dane û derketine holê. Bi vî awayî wêdetirî raveya objektîf a civatên piçûk û egzotîk, antropolojî wê bibûya xwedîya fezîleteke normatîf, fezîleta ku modelên herî baş ên civakê nîşanî me dide.

Dîrok, li gor **Lévi-Strauss** (ê ku li dijî çîrokên dirêj ên Ronesansê ye), bi xizanbûna çandî xwe dide der. Eger, di destpêka mirovahîyê de, stokeke qediyayî ya çandên mirovî hene, ev stok bi veguherînê re her diçe kêmtir dibe, bi wê çendeyê ku êdî baştir e mirov bikeve pey rizgarkirina çandên vemayî û bi vê armancê, siyasetên ji bo misogerkirina parastina «mîrasa çandî ya nemaddî» pêk bînin.

Ev «kevnarparêzî», ya ku ji «cemidandina» çandên cîhanê pêk tê, bi girêdanên pir teng ên li gel slogana parastina bîyodîversîteyê re têkildar e. Ew bi awayekî ji awayan berê xwe ji dîrokîtîya çandên egzotîk dizivirîne û raguherînên navxweyî û derveyî yên ku ji destpêka pêkhatina xwe ve çand, bi taybetî – lê belê ne tenê– di bin tesîra kolonîzasyonê de, bi wan re rû bi rû mane. Herçendî ev paşçavkirina dîrokîtîya li gel hin tendensên nûtir yên dîsîplînê di nav nakokîyê de be jî, ew dîsa jî ji bo alîgirên Çaxê Nû yên di «ramana hov» a berbelavbûyî de pir bi cazîbe ye; li himberî Rojavayê westîyayî, an jî li himberî felsefeyeke rasyonalîst a bêhn lê çikîyayî, alternatîfekê dibînin.

(1) Claude Lévi-Strauss, *Antropolojî li himberî pirsgirêkên cîhana nûjen*, Le Seuil, Paris, 2011, 160 rûpel, 14,5 ewrû.

(2) Claude Lévi-Strauss, *Hêla din a rûyê Hîvê. Nivîsên li ser Japonyayê*, Le Seuil, Paris, 2011, 208 rûpel, 17,5 ewrû.

Wergera ji fransî: Baran Nebar

Dozdeh Çirk:
Pistepisteke bi taloke

Şengul Ogur

Nêzîkatîya Kant a li Estetîkê navika hunerê ji rasteqînîyê qut dike û wê bi tenê wekî objeyeke bi serê xwe be, li ber me datîne. Spehîtîya hunerê li gor Kant nikare were têgîn kirin, ango spehîtîya hunerê bi tenê spehîtîya di dîtbarîyê de ye. Lê li hêla din Hegel li dijî Kant derdikeve û heqîqeta hunerê bi ragihandina wê ya li ser naverokekê dihelsengîne.

Lê di dawîya dawî de Kant jî û Hegel jî îdealîst bûn û herçiqasî marxsîzmê dîyalektîka xwe ji Hegel standibe jî dîyalektîka marxîst dîyalektîkeke materyalîst e, ango ew hemû geşedana dîrokê û fenomenên kulturî li ser bingehên daringî analîz dike.

Marx-Engels di berhema ya bi navê Îdeolojîya Alman de wiha dibêjin: ‘’Hilberîna ramanê, ferasetê, hişmendîyê, berîya her tiştî rasterast girêdayî keftûlefta madî û têkilîyên madî, zimanê jîyana rasteqîn e (..), “nîgaşên derasayî (nebelbildungen) yên mêjîyê însên jî, berzkirinên bivênevê yên pêvajoya mirovan in ku ev xwe dispêrin bingehên madî.”

Di nav vê çarçoveyê de teorîya marxîst hemû fenomenên kulturî li ser bingehên sosyo-ekonomîk a civakê dadihurîne. Ji bo neteweyekê ku xwe bi rê ve dibe helbet faktora herî girîng faktora sosyo-ekonomîk e û ev di hemû fenomenên kulturî de mohra xwe dihêle. Lê ji bo neteweyên ku wekî kurdan bindest in jî faktora herî bingehîn ku di fenomenên kulturî de xwe beloq dike, ji sosyo-ekonomîyê bêhtir, sosyo-polîtîk e.

Em dikarin vê faktora sosyo-polîtîk hem di hêla naverokê de û hem jî di hêla teşeyê de, di hemû fenomenên kulturî yên kurdan de, bi awayekî pir zelal bibînin.Yek ji van berhema wêjeyî ya kurdî ku em tê de vê sosyo-polîtîkayê dibînin, berhema bi navê Dozdeh Çirk, ya Sîdar Jîr e.

Di navenda Dozdeh Çirkê de, bindestîya kurdan, bandora bindestîyê ya li ser kurdan, bi awayekî şîzofrenîk, vederbûna van bandorên neyînî yên di karektereke jin a bi navê Gulavê de ye. Sîdar Jîr, di Donzdeh Çirkê de, tenê bi destnîşankirina trajedîya kurdan a ji bindestîyê tê, nîşan nedaye, lê herwiha, li gel nîşandayina travmaya bindestîyê, karekterên xwe kirine tevgereke lêgerînî ya bi armanca dawîlênanîna rewşa bindestîyê.

Divê were gotin ku Sîdar Jîr, şkestina kurdan ya dîrokî baş dest nîşan kiriye. Dema ku karektera bi navê Gulavê berê xwe dide Stenbolê ji bo ku hezkirîyê xwe yê bi navê Mîrşa bibîne, li wir Mîrşa, gotina Yavûz Selîm a ku nifirê li kurdan dike, ji Gulavê re dibêje. Ku ev jî rasterast peymana Qesra Şêrin ango dubeşbûna Kurdistanê bi bîra mirov dixe.

Yê ku di wêjeya kurdî de yekem car ku ev şkestina dîrokî dest nîşan kiribû Ehmedê Xanî bû: Tasek ji ava zelal nadim bi hewzê kewserê. Levhatina Qesra Şêrîn jê nabînim tu meferê.

Sîdar Jîr jî bi destnîşankirina vê hevpeymanê, berê me dide dîroka dûr û dirêj û bala me dikişîne ser sedema bingehîn ya bindestîya me. Ku balkêş e karekterê bi navê Mîrşa, hezkirîyê Gulavê li Stenbolê ye û li wir derûnnasîyê dixwîne û di dawîya berhemê de Gulav û Mîrşa piştî gelek serbihurîyan digihijine hev.

Çîroka Dozdeh Çirkê bi Xewna Xezabê dest pê dike. Ev beşê pêşî, dînamîka tevahîya berhemê ye. Loma di vî beşî de Gulav, di xewnekê de, hay ji bindestî û parçebûna welatê xwe dibe:

“Bigîr biyaver!.. Eqbîdo!.. Yakala!.. bigirin!.. Bigîr biyaber Mehabad, Çarçira! Eqbîdo eleyhim we eclîbohm îla Halabja! Dîyarbakir’a Dagkapi Meydanina getirin! Bi zelalbûna dengan re qîrînî pê ket. Û navbera her du çemên ji çavên wê diherikî bûbû qada şerê çaralîyên wê.”

Piştre çîroka pistepistê. Belê, pistepistek li bajêr berbelav dibe: Keçikek, li Amedê, di tarîya şevê de, xwe bera nav kolanan dide û êrişê dibe ser mirovan. Çima gelo?

‘Serhildan’ek e ev? An ev keçik ’cinûnî’ ye? Çi bi serê vê keçikê tê? Çima di tarîya şevê de êrişî xelkê dike?

Bersivên van pirsan û gelek pirsên din, bi qasî ku bikaribin mûyê laşê mirov biçikizînin di Dozdeh Çirkê de hene. Dozdeh Çirk, çîroka jinên kurd e, ku ji sedema bindestîyê êdî ji pêsîra xwe ya çepê birîndar dibin. Guhên xwe bidin vê pistepistê: “Dibe ku pistepist be, lê belê her tişt bi pistepistê dest pê dike”.

Dozdeh Çirk, Sîdar Jîr, 2011, Weşanên Lîs,

Wezîrê Eşo behsa Mamostayê xwe Qanatê Kurdo dike

Kurdzanê mezin: Qanatê Kurdo

Salihê Kevirbirî

Qanatê Kurdo û Wezîrê Eşo

Hestekî xweş e ku şagird li ser mamostayên xwe berheman biafirînin. Çendek berê kitêbeke wiha li ber çavên min ket. Bêguman mamosta jî, şagird jî di çand, ziman, edebiyat û dîroka kurdan de ‘du çîya’ ne. Nivîskar û dîrokzan Wezîrê Eşo, di 75 salîya xwe de li ser mamosteyê xwe Qanatê Kurdo kitêbeke ‘qerase’ pêşkêşî me kir: “Kurdzanê Mezin: Qanatê Kurdo.”

Naveroka kitêbê ji du beşan pêk tê: ‘Kurdzanê Mezin Qanatê Kurdo’ û ‘Bi Munasebeta 100 Saliya Qanatê Kurdo.”

Nivîskarê kitêbê Wezîrê Eşo li ser Qanatê Kurdo û kitêba ku li ser wî amade kiriye dîyar dike ku Qanatê Kurdo bi profesorîya xwe zimanzan û lîngûistekî mezin e, bi zanebûna xwe ya ansîklopedîk kedeke mezin û hêja li tevahîya şaxên kurdzanîyê zêde kiriye û ji dîroka Kurdistanê bigire heta wêje, etnografya û zargotina kurdî mîraseke hêja ji me re hiştiye û berdewam dike: “Lewre jî bi şanazî em dikarin Qanatê Kurdo wekî ‘Kurdzanê Mezin’ binirxînin...”

Kitêba navbihurî sala 2010ê, li Brukselê ji hêla ‘Ararat News-Publishingê’ ve hatiye weşandin û belav kirin. Kitêb gelek agahdarî û hêlên balkêş li ser kurdzanê mezin Qanatê Kurdo pêşkêşî dêhn û bala me dike. Ji zarokatîya wî bigire, çetinahî û zorîyên ku dîtiye heta agahîyên şagirdî, ciwanî, dersdarî, kar û xebata kurdzanîya li Lenîngradê û roja mirina wî di kitêbê de peyda dibin. Wezîrê Eşo dîyar dike ku Qanatê Kurdo hewcedarê xebat û lêkolînên berfirehtir e. Sedema vê gotina xwe jî wiha tîne ziman: “Ez di kitêba xwe de bi kurtahî behsa tevahîya kar-bar û lêkolînên Qanatê Kurdo dikim. Ji ber ku xebat û lêkolînên wî gelek in û her yek ji wan hewcedarê xebatên cuda û kurtir in. Hêvîya min ew e ku dûhatîyên Qanatê Kurdo karê min temamtir bikin.

‘Qanatê Kurdo kurekî şîrhelal ê gelê kurd e’

Wezîrê Eşo dîyar dike ku fikra nivîsandina berhemê, piştî wefata Qanatê Kurdo derketiye holê: “Her dem li ser fikir û ramana min bû ku ez li ser mamosteyê xwe Qanat berhemek amade bikim. Lê pêkanîna vê daxwazê, 4-5 sal berîya niha kete destê min. Min bi berpirsiyarîyeke mezin xebateke wiha bir serî. Sedem jî ev e ku Qanatê Kurdo kurekî şîrhelal ê gelê kurd e.”

Wisa dîyar e şagirdîya Qanatê Kurdo kêfxweşîyeke mezin li Mam Wezîr dide peyda kirin. Dîyar dike ku ew pir kêfxweş û serbilind e ku şagirdê Qanatê Kurdo yê kurdzan û welatperper e. Ji bilî nirxandina rast a ziman, dîrok û çanda kurdî, fikir û hisa welatperwerîyê ji wî hildaye. Qanatê Kurdo li gor Wezîrê Eşo ne bi tenê welatperwerekî mezin e, herwiha ew kurdekî xas û xalis e jî: “Heta tu bibêjî bes ew ciwanmêr, comerd û nandayî bû. Gava ji ‘Enstîtuya Rojhilatzanîyê ya Akademîya Ermenistanê’ çûm ‘Beşê Kurdzanîyê ya Enstîtuya Lenîngiradê ya Rojhilatzanîyê’ min mamosta baştir nas kir. Sala 1961ê bû û Qanatê Kurdo li wir Serokê Beşê Kurdî bû.

Jê dixwazim ew behsa bîranîneke xwe û Qanatê Kurdo bike ku qet ji bîra wî naçe. Bi dilxweşî behs dike: “Ji birazîyê xwe re bibêjim, her rasthatin, girêdan û pewendîyeke ligel Qanatê Kurdo ji bo min, tevî zanînê, şabûn û serbilindî dianî. Bîranîn û rasthatinek heye ku qet ji bîra min naçe. Ez nû zewicîbûm. Jina min Gulîzera Baro û kurê min Mirazê 2 salî ji Tiblîsê hatibûn Lenîngradê ji bo dîtina min. Qanatê Kurdo li ser vê yekê em vexwendin mala xwe. Dost, heval û hogirên din jî hatibûn. Bi eşq û kêfxweşîyeke mezin, me heta derengê şevê kilamên govend û reqasê gotin. Ew şev qet ji bîra min naçe!

Sala 2009ê: 100 Salîya Jidayîkbûna Qanatê Kurdo

Sala 2009ê 100 salîya jidayîkbûna Qanatê Kurdo bû. Jixwe kitêb jî ji bo 100 salîya jidayîkbûna kurdzanê mezin hatiye amade kirin. Wezîrê Eşo nerazîbûn û xemgînîya xwe eşkere dike ku 100 salîya Mamoste Qanat bi layiqî nehatiye pîroz kirin. Ew dîyar dike ku divê 100 salîya bûyîna Qanatê Kurdo bi awayekî berfirehtir û geştir bihata pîroz kirin: “Hêvîdar im di welatekî azad de, kêmasîyên wiha ji holê bêne rakirin. Qanatê Kurdo ji bo pêşxistina çanda gelê kurd kedeke mezin daye. Lê hêvîya me ew e, ev ked tu caran vala û badilhewa naçe.”

Wezîrê Eşo dîyar dike ku vê gavê li ser Qanatê Kurdo planên wî tunene. “Lê...” dibêje û berdewam dike: “Te hew dît bi saya mijareke li ser mamoste, min dest bi gotar û lêkolînekê kir...”

Wezîrê Eşo, 1934ê li Tiblîsa paytextê Gurcistanê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya destpêkê li gundê xwe Pampê û Tiblîsê biriye serî. 1958ê Fakûlteya Dîrokê ya Zanîngeha Yerevan a Ermenistanê temam kiriye. Di navbera salên 1958-1961ê de serokatîya dibistana gundê Pampê ya Axbaranê kiriye. Di navbera salên 1961-1963yê de, li ‘Beşê Kurdzanîyê yê Enstîtuya Rojhilatzanîya Lenîngradê’ -niha St. Petersbûrg- dixwîne û dibe Bisporê Dîroka Kurdistanê. Ji sala 1964ê heta 1994ê, li Erîvana Ermenistanê di gelek kar û barên çapemenî û weşangerîya kurdî de kar kiriye. Yek ji wan xebatan jî, xebata Beşê Kurdî yê Radyoya Erîvanê ye. Wezîrê Eşo ji bo Rojnameya Riya Teze jî xizmeteke baş kiriye. Mamoste Wezîr xwedîyê 10 berhemên çapbûyî ye.

Kurdzanê Mezin Qanatê Kurdo, Wezîrê Eşo, Ararat News Publishing, Bruksel, 2010, 170 Rûpel, Kurdî

www.arsivakurd.org